arasında sufilik tasavvufu yaygındır, öncelerde Kadirilik vardı daha sonra da Nakşibendilik yayılmaya başladı. Nakşibendiliğin yayılması Nakşibendiliğin Kürtlük politikasına ağırlık vermesinden sonradır. Şeyh Sait Nakşidir, Barzaniler Nakşidir. Nakşibendiliği bile, yani tarikat olayını bile, yurtseverlik ve militan milliyetçilik noktasında yükseltirseniz başarılı olursunuz demeye getirir. Xani'nin tasavvufu medreseye çekilip inzivaya çekilme tasavvufu değildir. Bir yerde bilince ulaşmanın, "En-el Hak" demenin tasavvufudur. Ama "En-el Hak"ın içinde Kürtler de vardır, diyen bir tasavvuftur. Xani bütün bu efsaneleri, kitap da geçen diğer motifleri gayet iyi işlemiştir. Newroz gibi bir olayı sadece şenlik ve festival temelinde de ele almamıştır. Aslında newrozun nereye yarayabileceğini, neye yaraması gerektiğine vurgu yapmaya önem vermiştir. Xani, çağını aşmış bir kişiliktir, onu Shakespeare'le karşılaştırabiliriz. Mem û Zîn, "Leyla ile Mecnun" gibi değildir "Leyla ile Mecnun" basit bir aşk hikayesidir, Xani ise doğaya gerçekliğe ve toplumsal olaylara vurgu yapar. O toplumsal ruh, Xani'nin ideasıyla ve Kürtlüğü motivesiyle ortaya çıkmıştır. Yani Xani'yi düz okumak bize fazla bir şey sağlamaz.



**BERTOLT BRECHT**

### **Amadekarên Dosyayê**

Ayşan Sönmez - Teatro Boğaziçi  
Selin Aydınoglu - Teatro Boğaziçi

### **Wergera ji Ingilîzî û Tirkî**

Erfan Cantepe - BGSST Beşa Muzîkê  
Ergin Öpengin - Klûba Wêjeyê ya Zanîngeha Boğaziçi yê  
Hekîm Kılıç - Klûba Wêjeyê ya Zanîngeha Boğaziçi yê

### **Destpêk**

Dramatûrjiya civakî û metoda pêşkêşkirinê ku ji aliyê Bertolt Brecht ve hatiye pêşxistin, ne tenê di warê teatroyê de lê di hemî şaxên hunerên şanohiyê de, nemaze jî di derûdorên muhalif de pir bibandor bûye. Ev rewş hîn jî wisa ye.

Wergera Brecht ya Kurdî-Kurmancî, bi têkildarbûna welatparêzên ku di warên cihê cihê de xebatên hunerî dimeşandin ve ketê rojevê. Li gorî me, eşkere ye ku tevgera ronakbûna demokratîk, ne bi xêra dewletê/dewletbûyînê ne jî bi sazîkirina hin sazîyan ve wê pêkbê. Herwiha eşkere ye ku bendewariyeke wisa ne tişkî rênîşan e jî. Bi ya me, ronakbûneke wisa wê bi rêya warên însiyatifên alternatîf ve pêkbê. Divê xebatên parçe parçe û belawela ku li warên cihê û li ser mijarên cihê de tîrî meşandin bigihên hev û torekê hevgirtinê çêkin. Em dikarin bêjin ku dosyeya Bertolt Brecht di encama hevgirtinekê wisa de pêkhat.

Li gorî me, wergera Brecht ya Kurdî-Kurmancî, teşebusek dereng maye ye; lê dîsa jî teşebuseke pir muhîm e. Niqaşên me yên li ser nasnameya Kurdan ya di warê çandî, tesîreke zor li ser şewegirtina projeyê de kir. Niqaşên me li ser du xalên muhîm bûn: Me çiqas nasnameya welatparêziyê ku di warê siyasî de me li xwe kiribû, dixist nav xebatên xwe yên çandî û hunerî; û herwiha, me çiqas zanistên xwe yên di wan waran de dikir parçeyekê tevgera ronakbûna demokratîk. Di derdorekî teng de meşandina têkoşîna nasnameyê, tenê di warê siyasî de hepskirin, di warê çandî de dibû sedemê asimilasyona nasnameya Kurdan û em dixistine nav dafa "bin-çanditiyê".

Dosyeya Brecht, bersiveke di warê teatroyê de ku li ser wan niqaşan hatiye pêkanîn. Ne tesadufî bû ku me mijara projeyeke wek Bertolt Brecht danî. Dema ev xebat hat rojevê, em jî li ser dramaturjî, background(bingeh) û pêşkêşkirina listikên Brecht de dixebitîn. Ji bilî vê, di nav me de hevalên ku

li ser edebiyat û folklorê Kurdan dixebitîn û hin tekstên di vî warî de wergera Kurdî- Kurmancî çêdikirin hebûn.

Herçiqas proje di zivistanê de ketibe rojevê jî, me di meha Reşemê de dest bi xebatên aktîf kir. Di zivistanê de naveroka dosyeyê zelal bû. Pêşî, me fikra amadekirina ferhengek têgihên Brecht yên bingehîn dikir. Dema me dît ku derfetên me hene, me makaleyeka Brecht ya bingehîn, ji bilî vê jî kronolojî û listeya berhemên wî xistine naveroka dosyeyê. Çaxê ku xebata ferhengê berdewam dikir, hevalên wergêr dest bi wergera kronolojî û makaleya "Teatroya Ceribanî" kirin. Ferheng, wek berhevokekê ye ku ji çavkaniyên cihê cihê hatibe bijartin û di meh û nîvekê de hate wergerandin.

Em bi rehetî dikarin bêjin ku xebata herî girîng û dirêj a wê dosyeyê, beşa wergêrê bû. Ev xebat ji bo me wek pêvajoyeke perwerdehiyê ye jî. Ji bo termînolojîyê, me lêgerînên berfireh darxistin. Birastî di Kurdî de, qet nebe di nav sînorên Turkiyê de, em li rastî literatureke Brecht nehatin. Wergerandina Brecht li hêlekê jî, teşebbusa tîjekirina valahiyeka lîteratura Teatroya Kurdî bû. Bêguman, terîmên teatroyê yên ku zêde dihatin bikaranîn hebûn, lê dema ji bo terîmên Brecht mijar dibû zêde jî tişt bi dest nediket. Di vê derê, me hin pêşniyarên ku diman ser terîmên bingehîn pêkanîn. Ev pêşniyarane dibe ku bîna guherandin û pêşvebirin jî. Hevalên wergêr forma dawî ya xebatê danê, lê ji bo ku zelaliya wê bête testkirin Weşanxaneyê Aramê di forma dawî ya makaleya "Teatroya Ceribanî" de alîkariya me kir.

Dosyeya Bertolt Brecht ku bi qasî sê mehan de hat amadekirin, li gorî me, xebateke model e. Ev him ji bo me, him jî ji bo welatparêzên ku dixwazin xebatên bi vî rengî çêkin avantajeke mezin e ku ev xebat ê bi rêya Vesta yê bigihêje girseyekê xwendevanan. Em wisa difikirin ku tevgera ronakbûna demokratîk dê bi rêya însiyatifên bi vî rengî geştir û hevîbar bibe.

## Kronolojîya Bertolt Brecht

- 1898:** 10 ê Rêşemê, wek kurê pişesazekî febrîqa kaxezê li Augsburgê hat dinê.
- 1904-1908:** Dibistan (Volksschule)
- 1908-1917:** Dibistana navînî û lise (Königlich-Bayerisches Realgymnasium)
- 1913:** Tekstên pêşîn dinivîse (bîrname, kovara dibistanê); Hevaltî bi Paula Banholzer re.
- 1917:** Li Munihê, li Zanîngeha Ludwig-Maximilianê, dest bi perwerdehiya tendirûstiyê dike; beşdarê sêminarên Arthur Kutcher yên li ser teatroyê dibe.
- 1918:** Li Augsburgê leşkerî, wek berpirsyarê tendirûstiyê; di Şoreşa Sermawêz de, di konseyeke leşkeran (Soldatenrat) de aktîf e.
- 1919:** Rexneyên li ser dramayê; Baal, tevli kabareya politikî ya Karl Valentin dibe; zarokê wî, yê ewil Frank, li Pala Banholzerê ji dayik dibe.
- 1920:** Cara yekem gera kurt li Berlînê; dayika Brecht dimire.
- 1921:** Gera duyem li Berlînê, beşdarî provayên Max Reinhardt û hin derhênerên din ên navdar, dibe.
- 1922:** Trommeln in der Nacht (Daholên bi Şevê) li Munihê di Kemmerspielê û paşê jî li Berlînê, li Teatroya Deutches pêşkêş dibe; Brecht xelata rûmetdar a Kleist ya şanonivîsarên ciwan distîne; hevaltî bi Arnold Bronnen re; bi Marianna Zoff re zewac.
- 1923:** Im Dickicht der Städte (Li Cingala Bajaran) li Munihê di Residenztheater tê pêşkêşkirin; Baal, li Leipzigê dest pê dike; hevkarî bi Lion Feuchtwanger re li Munihê; keça wî Hanne, ji Marianna Zoffê dayik dibe.
- 1924:** Brecht koçî Berlînê dike; Leben Eduards des Zwieten von England (Lêanîna Edwardê Duyem

- ya Christopher Marlow, ligel Lion Feuchtwanger) di bin derhêneriya Brecht, li Munih di Kammerspielê pêşkêş dibe; bi Helene Weigela re dinase, ku kurê wî Stefan tine dinê; bi Elisabeth Hauptmann re dest bi xebatê dike.
- 1925:** Hevaltî bi kulmbazê girankêş Paul Samson-Körner, wênevan George Grosz, û romannivîs Alfred Döblin; ji bo rojname û kovaran, nivîsên girîng (kurteçirok, ceribandin)
- 1926:** Mann ist Mann (Mirov Mirov e) li Darmstadtê dest pê dike.
- 1927:** Hauspostille (Sofi Manûel) derdikeve; bernameya Mirov Mirov e li ser radyoyê û lêanîna wî ya Macbeth; yekem hevkarîya bi Kurt Weill re li ser rêze stranên Mahagonny (Lotte Lenya tê de dilize); bi Erwin Piscator re li ser sehneyên wî ên ceribandî dixebite; ji Marianne Zoffê vediqete.
- 1928:** Die Dreigroschenoper (Operaya Sêqurişa) li Berlînê, li Theatre am Schiffbauerdammê dest pê dike, dibe lîstika herî serkeftî ya Weimar Republic (Komara Weimer)
- 1929:** Das Badener Lehrstück vom Einverständnis (Li ser Hevhatina Lîstikên Hinker yê Baden) û Lindbergflug (paşê wek Ozeanflug tê binavkirin, Firîna ji ser Okyanûsê) bi muzîka Paul Hindemith û Kurt Weill ve du "lîstikên hinker"(Lehrstücke) yên pêşîn derdikevin; bi Walter Benjamin dinase; bi Helene Weigel re dizewice; Die heilige Johanna der Schlachthöfe (Saint John yê Stockyardê, di sala 1932 an li ser radyoyê tê weşan); Berliner Requiem bi muzîka Kurt Weill re tê weşan.
- 1930:** Aufstieg und Fall der Stadt Mahagonny (Avabûn û Xerabûna Bajarê Mahagonny) li operaya Leipzigê tê pêşkêşkirin (di bin çavdêriya Naziyan); Der Jasager und der Neinsager (Yê Ku Got Erê, Yê Ku Got Na) li Berlînê ji aliyê Brecht ve hat derhinandin; Keça wî Barbara ji Helene Weigelê çêdibe; Die Maßnahme (Tedbîr) li Berlînê pêşkêş dibe; "Geschichten vom Herrn Keuner" (Çîrokên

- Keuner); "Die Beule" (Kurmî), senaryoya ji bo Filimê Operaya Sêqurişa (ne hat karanîn).
- 1931:** Mann ist Mann (bi lîstina Peter Lorre) bi derhêneriya Brecht hat çêkirin; Brecht û Weill ji ber ihlala peymana produksiyona Filimê Operaya Sêqurişa ya G.W.Pabst, dawa li Nero Filimê dikin. (Brecht winda dike, ji mehkemê vedikêşe û Weill serdikeve.)
- 1932:** Die Mutter [Dayîk (ji romana Maksim Gorki hatiye girtin)] ku bi derhêneriya Brecht û Emil Burri ve hatibû çêkirin, li Berlînê dest pê dike; filimê Kuhle Wampe (bi beşdariya Slatan Dudow, Ernst Ottwalt, Hanns Eisler) piştî skandaleke sansurê di meha Gulanê de pêşkêş dibe; Die Rundköpfe und die Spitzköpfe (Serên Girover û Serên Tûj); hevaltî bi Margarete Steffin re.
- 1933:** Piştî şewata Reichstagê (27 ê Reşemê) bi malbata xwe re direve Zurîhê û paşê bi Weigelê û du zarokên xwe Stefan û Barbara re li Danîmarkayê (Svendborg) bicih dibe; Sieben Todsünden (Heft Gûnehên Tengasiya Mezin) bi muzîka Weill re li Parîsê dest pê dike û derbasî Londonê dibe; xebatên li ser antolojiya helbesta "Svendborger Gedichte" (cara yekem li Kopenhagenê di 1939 a de hat çapkirin); hevaltî bi Ruth Berlau re.
- 1934:** Brecht û Hanns Eisler li Londonê; xebat li ser Der Dreigroschenroman (Romana Sêqurişan).
- 1935:** Diçe Moskovayê ku li wir Sergei Tretiakov, Sergei Eisentin û lîstikvanê Çînî Mei Lan-Fan dinase; ji bo prodiksiyona Dayîk diçe New Yorkê; Furcht und Elend des Dritten Reiches (Tirs û Şerpezeyiya Reichê Sêyem).
- 1936:** Gereki kurt li New York û Londonê.
- 1937:** Ger li Parîsê; Die Gewehre der Frau Carrar (Tifingên Seqora Carrar) bi derhêneriya Slatan Dudow û stêriya Helene Weigel ve, li Londonê pêşkeş dibe.

- 1938:** Li Parîsê heşt sehneyên Furcht und Elendê di bin derhêneriya Slatan Dudow û stêriya Helene Weigel, li Elmanyayê pêşkêş dibe; yekem versiyona Leben des Galilei (Jiyana Galîleo) temam dibe.
- 1939:** Ji ber bandora Naziyan a li ser Danîmarkayê, zorî li Brecht û malbata wî tê kirin ku koçî Stokholmê (Swêd) bikin; Bavê Brecht dimire; Was kostet das Eisen? (Hesin bi Çi Qasî ye?) ji aliyê Brecht û Ruth Berlau ve li Stokholmê tê pêşkêşkirin; Mutter Courage und ihre Kinder (Dayika Bêtirs û Zarokên Wê) bi listikvaniya Therese Giehse li 1941 an, Zurîhê dest pê dibe.
- 1940:** Bi pêşketina Naziyan, zorî li Brecht tê kirin ku koçî Fîlandiya bike. Berî diçe Helsînkîyê, piştî di nav milkê nivîskar Hella Wuolijoki bicih dibe; Der gute Mensch von Sezuan (Mirovê Baş yê Sezuanê) temam dibe; Guhartoka yekem a Das Verhör des Lukullus (Mehkemeya Lucullus) tê temam kirin; bi Wuolijoki re, Herr Puntila und sein Knecht Matti (Puntîla Beg û Xulamê Wî Mattî) yê dinivîse; Flüchtlingsgespräche (Axaftinên li nav Mişextiyên).
- 1941:** Brecht û malbata xwe, bi rêya Moskova û Vladivostokê derbasî San Pedroyê (Bajarê limanê yê Los Angelisê) dibin; Margarete Steffin ji ber êşa zirav li Moskovayê dimire; Brecht bi Charlie Chaplin, Fritz Lang û hostayên din ên Hollywoodê dinase; Li ser Der aufhaltsame Aufstieg des Arturo Ui (Bilindbûna Bergirbar ya Arturo Ui) dixebite ku cara pêşîn di sala 1958 an li Stuttgratê tê pêşkêş kirin.
- 1942:** Brecht bi mişextiyên din ên Elmanên li Los Angelisê dinase (Arnold Schonberg, Theodor Adorno, Max Horheimer, Thomas Mann, hwd); xebat li ser seneriyoya filîman (berhema Fitz Lang, "Hangmen ji Dimire" ji tê de).
- 1943:** Gereke kurt li New Yorkê, ku li wir bi Erwin Piscator, Wieland Herzfeld, Ernst Bloch, George

- Grosz, W. H. Auden, hwd dinase; Bi Lion Feuchtwanger re li ser Die Gesichte der Simone Machard (Xeyalên Simone Machard) dixebite ku mafên filîm ji MGM (qet ji ne hat çêkirin) re hatibûn firotin, cara yekem sala 1957 an li Frankfurt am Main pêşkêş dibe; Schweik im Zweiten Weltkrieg (Schweyk di Şerê Duyemîn ê Cihanê de) temam dibe, cara yekem sala 1958 an li Elmanyayê li Erfurtê tê pêşkêşkirin.
- 1944:** Der Kaukasische Kreidkres (Çixêza Tebeşîrê ya Qefqasa) temam dibe, cara yekem li Îngilîzî (bi wergera Eric Bentley) di 1948 an, di Carleton Collage li Minnesotayê û li Elmanyayê ji aliyê Brecht li Berliner Ensembleyê (Koma Berliner) di 1954an de tê pêşkêşkirin; Brecht û Auden li ser lêanîna The Duchess of Malfi ya John Webster dixebitin, ku di 1946 an de li Teatroya Barrymore ya New Yorkê pêşkêş dibe.
- 1947:** Despêkirina Life of Galileo (Jiyana Galîleo) bi Charles Laughton li Los Angelisê (werger ji aliyê Brecht û Laughton), cara pêşîn li Elmanyayê li Kammerspiele, Cologneyê, di 1955 an de hat pêşkêşkirin; li Waşington D.C.yê, ji aliyê House Unamerican Activities Committee (HUAC) ve tê pirsîyarî kirin; Roja paştî ji EY (USA) yê derdikeve, diçe Swêseyê.
- 1948:** Brecht Antigoneya Sophocles (bi wergera Hölderlin) lêanîn dibe û berêweberiya bi Caspar Neher re li Teatroya Chur çêdikin, ku Helene Weigel ji di listikê de cih digire; Brecht li Zurîh Schauspielhausê, di produksiyona Puntîlayê de ji cih digire; Brecht koçî Berlîna Rojhilat dibe; Kalendergeschichten (Çîrokên ji Salnameyê), weşana Brecht ya yekem piştî şer li Elmanyayê derdikeve holê.
- 1949:** Brecht, Berliner Ensembleyê dadimezrîne (li Teatroya Deutches bicih dibin) û Mutter Courage derdixe ku Helene Weigel ji tê de dilîze; Tage Der Commune (Rojên Komun) ji bo produksiyonek li



Zurîhê hate tamam kirin (lê li wir nehat listin), cara pêşin di 1957an de li Karl-Marx-Stadtê (Elmanyaya Rojhilat) tê pêşkêşkirin.

- 1950:** Brecht dibe hemwelatîyê Avusturyayê; derhêneriya lêanîna Der Hofmeister (Fêrmendê Seraya) ya J.M.R. Lenz dike ku bi Ruth Barleu, Caspar Neher, Egon Monk û Benno Beson re amadekiribû.
- 1953:** Brecht ji bo Serokatiya Navenda PENa Elmanyayê tê hilbijartin; Turandot oder der Kongreß der Weißwäscher (Turandot); Rêzê helbestên Buckower Elegien (Lawijên Buckow) diqedîne.
- 1954:** Berliner Ensemble derbasî Theatre am Schiffbauerdamm dibe; yekem gera navnetewî li Parîsê ku li wir produksiyona Berliner Ensembleyê Mutter Courage bû sedemê hestyariyê û Brecht rakire payeyê derhênerê herî girîng ê Ewropayê; Shurkamp Verlag, li Frankurt am Mainê (Elmanyaya Rojava), û Aufbau Verlag (Berlîna Rojhilat) dest bi çapkirina berhemên Brecht ên kevn dikin.
- 1955:** Brecht li Moskovayê xelata Stalîn distîne (dixwaze ku Boris Pasternak axaftina wî ya li ser stendina xelatê wergere); Berliner Ensembleyê cara duyem, bi Der kaukasische Kreidekreis ve, derdikeve gera Parîsê; Brecht nexweş dikeve.
- 1956:** Bi rêberiya Brecht provayê Leben des Galilei (Jiyana Galileo) û amadekariya Berliner Ensembleyê ji bo gera Londonê ku wê ew listik pêşkêş bikirana; 14 ê Tebaxê Brecht, ji ber dilrawestane dimire; 17 ê Tebaxê, li Dorotheenfriedhofê, li Berlînê tê defin kirin.

## Teatroya Ceribanî 1

**Bertolt Brecht**

Bi kêmanî ji du nifşa vir de ye, teatroya Ewropa ji pêvajoyeke ceribanî derbas dibe. Lê ceribînên curbecur, encamên berbiçav dernexistine holê; mirov nikare bêje ku pêvajoya Ceribanî bidawî bûye. Li gorî min, ceribîn bi du aliyên berdeham dikin. Her çiqas carinan digihêjin hevûdin jî, ev alî bi tevahî dikarin bi serê xwe bîn şop kirin. Û ya ku aliyên diyar dike, ev herdu fonksiyonên teatroyê ne: qerfîkirin û hînkîkirin... Yanê teatroyê, dest bi ceribînên ku wê ji alîkî ve qerfê, ji aliyê din ve jî hînkîkirinê xurt bike kiriye.

Li dinyaya me ya zindî ku ew qas bi lez dijî, hêmanên qerfokî yên teatroyê, bi tempoyeke "bêserî kevn dibin". Teatro, divê li hember "keriya hissî" ya temaşavanan ya ku her dem zêde dibe efektên nû biafirîne. Ji bo mijûlkirina temaşevanên xwe yê daman ku eqlê wan li cihekî din e, divê ewil hişê wan bîne cih. Pêşin lazim e temaşevanên xwe ji nav cihê qal û qirê bikşîne, ku paşê wan di bin bandora xwe ya efsûnî de bihêle. Li hemberî teatroyê, temaşevanê ku di nav xebatên rojane yên ku karakterê rasyonelîzê di nava xwe de dihewînin bêhal ketine û di cîre cîrên civakî yê curbecur de ji rihê xwe vekîşî û westiyayî ketî hene. Niha vî/vê temaşevanî/ê, rêyek dîtîye û xwe ji dinya xwe ya biçûk avêtîye derve, bi hatina teatroyê li palkursiyekî salonê wek qaçaxekê/î rûniştîye. Qaçaxek e, lê herwiha muşteriyek e jî. Çawa reviya ye û xwe avêtîye teatroyê, dikare ku cihekî din jî ji xwe re hilbijêre. Li aliyê din reqabeta teatroyê ya bi teatroyê re û ya teatroya nû bi sinemayê re, pêngavên nû ê bînavberî û hemû hewlên nûbûnê pêwîst dike.

Cerbanîyên Antoine, Brahm, Stanislavski, Gordon, Craig, Reinhardt, Jessner, Meyerhold û Piscator, îmkanên vegotinê yên teatroyê zêdetir dewlemend kirin. Hêza qerfokî ya teatroyê bêserûbin zêde bû. Wek mînak listika ansamble2, avabûna sehneyek bêhempa bihistokî û vejîni bi dest xist. Êdî li sehnê, derdora civakî heta kitekitên biçûktir jî dikaribûn bihatana pêşkêş kirin. Vaçtangov û Meyerhold, ji teatroya Asya hin formên dansê sitandin û bi serê xwe kareografîyek afirandin. Meyerhold, konstruktîvîzmek bîngêhîn xist nav teatroyê.

Reinhardt, wek sehnê(dik), sehneyên rastîn bikar anî: Jedermann û Faust, li cihên ku her kes jê derbas dibe listin. Teatroyên dik vekirî, Xewna Şeva Havînekê ya Shakespeare li nav daristanê pêşkêş kir. Li Sowyeta Rûsyayê, êrişa ser Qesra Zivistanî ya çaran (qralên kevn yê Rûsyayê) û dest xistina qesrê, bi karanîna gemiya şer Aurora ji nû de hate pêşkêş kirin. Diwarê ku sehnê û temaşevanan ji hev vediqetand ji holê rabû. Reinhardt, dema li Teatroya Mezin, Danton pêşkêş kir, listikvan li salona temaşevanan bi cih kir. Li aliyê din Ochlopkow li Moskowê, temaşevan derxistine sehnê û ew dane rûniştin. Reinhardt, ji teatroya Çînê "rêya bi çiçek"3 sitand û bikar anî; ji bo ku di nav temaşevanan de bilîzin, ji arenayên sîrkan sûd wergirt. Stanislavski, Reinhardt û Jessner direktoriya listikên girse4 bipêş xistin û bêqusûr kirin. Jessnerê ku cara ewil di listikê de derence bikaranî, ji sehnê re dîmeneke sêyem da qezenc kirin. Sehna zîvirok5 û perda ezman6 hat dîtin û ronahî hat kifş kirin. Bi xêra projektoran, sehne heta tu bêjî xweş hat ronî kirin. Bikaranîna derfetên dewlemend ên ronîkirinê, mînak "Atmosferên Rembrandwarî" hokus pokus li sehnê hate asta afirandinê. Çawa ku di tipê de cureyek emeliyata dil wek metoda Trendelenburg tê biranîn, di diroka teatroyê de, bi rehetî, biwêja Efektên Ronahiyê yên Reinhardt dikaribû bihata bikaranîn. Her wiha, teatro teknîkek nû ya projeksiyonê bi dest xistibû ku bingeha xwe ji metoda Schufftan distand. Û efektên deng, bi awayekî gelekî cûda dihat birêvebirin. Ji hêla listika hunerê ve, diwarê di navbera kabare û teatro û yê revu7 û teatroyê xira bibû. Maske û solên binî bilind (kothurn) hatine bi karanîn. Bi karanîna pantomîman dest bi lêkolînên nû hate kirin. Repertûara klasîk ya kevn, dibû mijara tecrûbeyên berfireh. Pir caran, Shakespeare, dixistine form û bin cilekî nû û wisa derdixistin ser dikê. Ewqas nêrînên curbecur li ser nivîskarên listikên klasîk hatibûn kirin ku, te digot qey êdî tu nêrînên nû nema bûn. Hamlet bi simokîn, Sesar bi unîformeyan derxistibûn ser dikê. Ev jî tenê bikêrî smokîn û unîformayan hatibû, "ku qedrê van cilan zêde bibû". Hûn dibînin ku qîmetê van ceribîna qet ne wek hevdûne, herwiha yên balkêştir, ne yên hêjatir jî bûn. Li aliyê din, yê bêqîmet jî bi temamî ne yê bêqîmetir bûn. Wek mînak, simokîn li Hamlet kirin û li gorî kevneşopiyê ew bi gorên hevrişim derxistine pêş temaşevanan

heger ku bê muqayesekirin, sūcekî jê mezintir ku li hemberî pîroziya Shakespeare hatiye kirin tune bû. Ji ber ku karê hatiye kirin, ji çarçoveya guhertina bedlekî dervediket.

Mirov dikare bi dilrihetî bêje ku, di zêdebûna hêza qerfokî ya teatroyê de, ceribîn pir bi tesîr bûne. Bi taybetî ji van ceribînan pêşvebirina neqşîna teknîkî ya teatroyê pêkanî. Li aliyê din, xebatên li ser ceribîne, wek berê hatibû diyar kirin, hîn nehatine qedandin. Heta encamên hatin destxistin, wek daneyên ceribî yên dezgehên din, hêj neketine pratîkê û ji aliyê her kesî ve nayên bikaranîn. Mînak, metodeke emeliyatê ya ku li New Yorkê nû tê tetbîqkirin, di demeke kurt de li Tokyoyê jî tê bikaranîn. Lê di teknîka sehne ya nûjen de rewşek wiha nayê dîtin. Tirsonekiyek berbiçav, nahêle ku hunermend encamên hunermendên din yên ku bi rêya ceribandina bi destxistine bipejirîne û wan bi pêşbixe. Di hunerê de li teqlîdkirinê bi çavekî pis tê nêrîn. Ev jî, sedemek ji wan e ku nahêle pêşveçûnên teknîkî bipêş bikevin. Bi giştî teatro ji aliyê bikaranîna teknîkên modern ve hîn di asteke paşverû de ye. Hê jî (rp.72) mikrofonek û çend farên ereba li sehneyê ji aliyê teknîkî ve bes tê dîtin. Di hêla istifadekirina tecrûbeyên listikvanîyê de jî xwe pir nadin ber. Lê belê, di demên dawî de li New Yorkê, em dibînin ku "hin listikvan" bi metodên listikê yên ekola Stanislavski re eleqedar dibin. Baş e, ji aliyê hînkariyê ya ku estetîkê wek fonksiyona duyemîn dixê stûyê teatroyê rewş çawa ye? Li vir jî em dîsa rastî tecrûbeyan û encamên wan tên. Listikên Ibsen, Tolstoy, Strindberg, Gorki, Çehov, Hauptmann, Shaw, Kaiser û O'Neil wesfê ceribî di hewînin. Hemû jî ji bo nişandana pirsgrêkên demê ceribînen berfireh in.8

Ji alîkî ve em listikên milyo9 yên ku li ser rexneya civakî ne dibînin, nivîskarên wan ji Ibsen heta Nordahl Grieg dūdirêj dibin; li aliyê din em listikên sembolîk dibînin, ji Strindberg heta Par Lagerkvist komek nivîskaran di nav xwe de di hewîne. Ji alîkî ve em rastî listikên di forma parabel de yên ku wek Operaya Sê Qurişa bi armanca xerakirina saziyek îdeolojîk pêkhatibû, tên. Li aliyê din, heger tenê ji aliyê teknîkî ve lê bê nêrîn, berhemên taybet ên dramatik ku cih didin seretayên revu yên ku ji aliyê Auden û Kjeld Abell ve hatine pêş xistin, derdikevine hemberî me û hwd. Ev jî ji bo avahiya sehnê bû

sedema guhertineke berfireh. Ji bo pêşkêş kirina temayên mezin û nûjen, teknikên ku Piscator bi karanîna îcadên ku kirine em nikarin li vir yek bi yek bijimêrin. Lê ez dibêjim em dikarin çendan ji wan, mesela di teatroyê de ji filim sûd wergirtin ku di koroya teatroya kevn a Yewnanî de tê biranîn û ji bo sehna sabit nêrînek nû aniye, bikin. Û herwiha bi sehna zîvirok, wek meşa di Leşkerê Şêr Şvayk, bi hereket kirina sehnê derfeta pêkanîna bûyerên epîk çêbû. Lê belê, ev îcadên ku hatine kirin ji aliyê teatroyên netewî yên curbecur ve heta niha jî nehatine ecibandin. Îro elektrifikasyona sehnê hema bêje hatiye ji bir kirin. Sehna zîvirok ku gerek îcadeke zêde dahiyane bê ditin zingar girtiye û riziya ye û li ser xişta giya şîn bûye.

Gelo ji ber çi wiha bibû?

Mirov dikare bêje ku sedema dawîbûna teatroyeke nemaze ya politik a Piscator dîsa bixwe politik e. Xurtbûna wesfên teatroyê yên politik û hînger, her çû li hemberî politikayê Ji alîkî ve jî em dibînin ku teatro di pêş xistina pêvajoyên civakî de wek azadiya jina, bi cîh anîna mekanîzma edaletê, tendurîstiya parêzgerê gel, hetta di azadiya çînî ya karkeran de serfiraz bûye. Lê belê, divê mirov qebûl bike ku dengvedana tiştên teatroyê yên li ser jiyana civakî, ji kûrahiyê dûr bûn. Bi rastî jî, wek min berê jî bala we kişand, ya ku teatro dike ji pêşkêşkirina çavdêriyên li ser kesên elît wê de naçe. Hîn qanûnên civakê yên resen derneketine ber çavan. Herwiha ceribînen di beşa nivîskariya lîstîkê de, bi wendabûna çîrok(fabl) û kesên lîstîkê dawî dibû. Teatroyê xwe bixistina bin emrê hewldanên reformên sosyal, wê gelek çalakiyên hunerî wenda bikirana. Ji bo tespît kirina wê, heger emareyên di dest de, bişik jî be, dejenerebûna zewqa hunerî, korbûna şeweya ferazetê jî rewşeke xemgîn e. Bi rastî jî, li dikên me aloziyek şewazê hikum dike. Ev jî encama birek tecrûbeyan e. Li ser heman sehnê, di heman lîstîkê de, lîstîkvan bi teknikên bi temamî ji hev cuda dilîzin. Ji serî heta binî, di hundirê dekorek fantastîk de lîstîkek rasteqîne tê listin. Heke diksiyon bê gotin, di rewşek pir reben de ye: axaftinên normal yên rojane wek helbestan tînan gotin, argoya pêşangehê tu dibe qey tê helbest kirin hwd... Lîstîkvanên nûjen di babeta jesta de di hundirê aloziyê de mezin de ne. A rastî, jest divê şexsî be, lê keyfî ye,

dema divê xwezayî be, wesfek tesadufî dihewîne. Heman lîstîkvan mimîkên wisa dike ku hema bêje ew mimîk li sîrkan tînan. Ji aliyên din mimîkê ku dike ji aliyê temaşevanên ku li pêş dirûnin ve jî encex bi durbîna operayê tê ditin. A rast tê wateya ku her şewaz, di her demê de bi erzanî li piyasê tê avêtin. Qabil û ne qabil li nav hemû bandoran tevgerê li hev nehatiye. Serfirazî tê qezenc kirin? Lê, serfiraziyek bi erzanî...

Niha jî teatroya ceribîni, wek ku li jor min qala hewlên wê kir, îro gihiştîye babeta xwe a bilintirîn, herwiha gihiştîye asteke ku krîza derxe û ez dixwazim qala vê bikim. Di vê astê de hemû diyarkerên pêvajoya ceribînen erênî yan jî neyînî, hêza qerfokî ya teatroyê, bi pêş ketina teknîka îlluzyonê di hêza kêf kirinê de zêde bûnê, ji aliyê din ve zêdebûna di hêjahiya hînkariyê de û di paşketina zewqa xwe ya hunerî de gihiştîbû asta bilindtir.

Di rêya qezenckirina wesfê hînkariyê de, di teatroyê de ceribînen mayîn ji aliyê Piscator ve hatine pêkanîn. Wek mirovekî ku beşdarî hemû hewldanên ku di wî warî de hatine kirin bû me, ez dikarim bêjim ku, Piscator dest neavêtîye tu ceribînen ku armanca wan ne pêşxistina hêjahiya hînkariyê be. Ew ceribînen ku em qala wan dikin raste rast, pîrsgirêkên temaya modern û mezin di sehnê de pêşkêş dikirin: Şerên petrolê, şoreş, pîrsgirêka maf û hukûkê, doza nijadê reaksiyonek derxist holê. Lê, îro di axaftina xwe de, em ê li ser buhrana teatroyê, pêşketina buhrana di warê estetîkê de bisekinin. ceribînen Piscator, ewil di teatroyê de bû sedema tevliheviyekê. Van ceribînan, dik xiste dewsa febrîqeyeke tije makinên curbecur, salona temaşevanan jî, cîhê civînê. Ji bo Piscator teatro parlamentoyek e, temaşevan jî mebûsên ku qanûnan çêdikin in. Pîrsgirêkên gel ên mezintir ku wê çareser bikin li sehnê derdixistin hemberî vê parlamentoyê. Em bêjin ji dewsa ku mebûsek axaftinekê di derheqê hin bê rêkûpêkiyên civakî de bike, wan xirabiyan li sehnê bi qopyek artistîk cîh digirt. Sehne ji bûyer û kesên ku pêşkêş dike û ji karanîna daneyên îstatîstîkî û paroleyan bi riya sûdwegirtinê, parlamentoya xwe, yanê temaşevanên xwe, anîna taxa sitandina qerarên siyasî ji xwe re kiribû prensîbek heyatî. Birastî teatroya Piscator, çepik ji temaşevanan red nedikir, lê ji çepikan zêdetir şewr dixwest. Ne tenê dixwest bûyereke li

sehnê pêşkeşî gel û temaşevanên xwe bike, herwiha dixwest temaşevan jî rasterast mudexileyî wê jiyane bibin. Rêbazê sehnê, bi awayekî ecêb tevlihev bibû. Di destê derhênerê teknik yê sehna Piscator de pirtûkek wiha hebû ku, çiqas tiştek bişibe notayên di destê kesê ku li lavta dixwe yê "partitur"ê operaya Strawinski, pirtûka di destê derhênerê dika Reinhardt jî ewqas dişibiya wê. Amûretên teknîkî yên li ser sehnê ewqas giran bûn ku, sehna teatroya Nollendorf ji binîve bi sitûnên çimento hate destek kirin. Carekê, esraqê barê ewqas amûretên teknîkî yên daliqandî nekişand û ji nişka ve hilweşiya. Nêrinên estetîkê, bi temami ketibûn bin emrê nêrinên politik. Piştî ku filimên belgewartî yên ku li cihê bûyerê hatine kişandin û rastiya wan nayê gengeşîkirin li sehnê hatin nişandan, dekorasyonên biwêne rabûn refa. Eger hunermend, mesela George Grosz ji parlamentoya ku ji temaşevanan pêk tê re tiştekî bêje, ji tabelayên bi wêne çetir tiştek heyel! Hetta Piscator dixwest vî karî bê listikvan bimeşîne. Çaxê Împaratorê Elman li sehnê bi listikvanekî hate sêwirand, împarator bi pênc parêzgera protestoya xwe jê re şand. Piscator jî li hemberî vê got gelo împarator bi xwe nayê dernakeve sehnê. Bi wî awayî dixwest ku împarator jî ji bo teatroya xwe angaje bike. Bi kurtî, doz ewqas mezin û girîng bû ku, ji bo bidestxistina wê, tu asteng ne dihat dîtin. Li aliyê din, afirandina listikan jî li rêbaza şanokirinê dihat. Li ser heman listikê, heyeteke qelebalix ku ji nivîskaran pêk dihat dixebitîn. Herwiha heyetek din jî ku ji pisporan, dirokzanan, aborînasan û îstatîstîkvanan pêk dihat, di xebata listikê de alikariya wî dikirin û karên ku dihatin kontrol dikirin.

Ceribînen Piscator, hema bêjê hemû kevneşopî xira kiribûn. Van Ceribînan, bi riya mudaxeleiyî li ser metoda afirandina nivîskaran, xebata dekoratoran û leyîstina listikan bandoreke mezin kirin. Herwiha, armanca van ceribînan, ji bo teatroyê qezenckirina fonksiyoneke nû bû.

Estetîka burjuva ya şoreşger a Diderot û Lessing, yên ku ji bo dema Ronîbûnê girîng in, teatroyê wek cihê dilxweşkirin û hînkirinê şîrove dikin. Dema Ronîbûnê ya ku di teatroya Ewropa de raperînek xurt da destpêkirin, di navbera kêf kirinê û hînkariyê de dijberiyek nas ne dikir. Diderot û Lessing di trajediyan de jî şahîkirin tiştekî vala û bêqiymet diditîn. Li

aliyê din, li seretayên hînkêr yên ku di nav teşeyêke artistîk de ne bi çavekî ku wê rêya şahîkirinê bigirin ne dihat nêrin. Her du ramangêran jî, bawer dikirin ku seretayên hînkêr wê di listikê de ciyawaziya qerfokî xurtir bike.

Dema em li teatroya rojane dinêrin, em dibînin ku berhema sehnê û herdu serateyên esas yên di teatroyê de, yanê şahîkirin û hînkirin çiqas pêde diçe dikevîne nav nakokiyeke xurt de. Îro di navbera van seretayan de dijberiyek heye.

Eger naturalîzm, bi xêra "entelektuelîzasyona hunerê", têsîrek civakî pêkanî be, ev bê şik ji ber felckirina hêzên gelemperî yê hunerî, bi taybetî fantezî, hestê estetîk û hêla wê ya helbestî ye. Em dikarin bi rehetî bibêjin ku seretayên hînkêr zerarê dide seretayên artistîk.

Derbirîneriya li dû şer, dinyê wek daxwaz (hemd) û pêşniyarî dabû pêşkêşkirin û bibû sedema avabûna ezperestiyek (solipsîzm) taybet. Bersiva teatroyê ji buhrana civakî ya mezin ya wê dewrê re, ev bû; bersiva feylesofî jî ji bo heman buhranê mahîzm bû. Derbirîneriya dû şer, bû serhildana hunerê ya li hemberî jiyane. Di vê derbirîneriyê de, dinya tenê wek vîzyonekê hebû û ketibû halekî gelekî xirab. Ucubeyekî ku ji aliyê rihên di nav tirsê de dinalin ve hatibû afirandin. Expresyonîzma ku derfetên derbirîneriya teatroyê gelekî dewlemend kiriye û hêzên dewlemend ku heta wê demê kesekî dest nedayê ji xwe re kiriye mal, tu carî hêza ku dinya wek tiştekî çalakiya pratîk a mirov e dernexistiye holê û ev jî bûye sedema kêmbûna hêza hînkêr a teatroyê.

Di listikeke Piscator an jî Operaya Sê Qurişa de jî regezên hînkêr, tê bê jî qey bi listikê ve hati bû monte kirin. Seretayên eleqedar ji giştê bi organîkî dernediketin holê. Lê bi giştê re di rewşeke dijberî de bûn. Herikandina listikê û bûyeran qut dikir. Wekhevîbûn bê îmkân dikir û ji bo temaşevanên ku li paş wekhevîbûnê dibezin re jî wek aveke sar ku di ser wan de birije bandor dikir. Bawer im ku, beşên wek wazên ehlaqî û stranên hînkêr (song) yên Operaya Sê Qurişa hinekî babetê qerfokî dihewîne. Lê bêguman ev tişt temaşevanan li gorî listikên li ser sehnê bi awayekî din dil xweş dîke. Di karektera listikê de dubendiyek veşartîye, hînkirin û qerfîkirin şer li hevdû vekirine. Herwiha di Piscator de, listikvan û amrazên teknîkî bi hev re ketine nav şer.

Ez li vir qala rastiya ku ji ber listikên tèn ser sehnê, temaşevan bûne du komên civakî yên dijminên hev nakim. Herwiha ji ber vê jiyaneke hunerî ya hevpar pêk nayê. Ev bûyereke politik e. Kêfa ku ji hinkirinê tê sitandin bi rewşa temaşavanan ya çîni girêdayî ye. Kêfa ku ji hunerê tê jî, karê tevgerike politik e. Û di temaşevana de pejirandina rewşeke wiha bi rêya provokasyonê dikare bê kirin. Lê, heger em guhê xwe bidin temaşevanên ku ji aliyê politik ve wek me difikirin, nakokiya navbera hêza qerfokî û hêza hinkerê de, bê çiqas sor bûye em dikarin bibînin. Di ceribînên merhaleyê pêştir de hatiye dîtin ku, xurtbûnên di hêza hinkerê de, li ser xurtbûna hêza qerfokê bandoreke neyînî dîke ("Êdî ev ne teatro ye, ev dibistana gel e."). Bervajiya vê jî, bandora listika hisî, tim hêza hinker a listika ku tê pêşkêşkirin kêm kiriye (Ji bo seretayê hinker, gelek cara listikvanên xirab ji listikvanên baş pirtir biqîmet bûn). Bi gotineke din, temaşevan çiqas ji hêla hisî tesîr dibûn, berjewendiya hinker kêm dibû. Ango çiqas xwe bi listika ku li hemberî wan dihat pêşkêşkirin ve girê didan, jiyandî ku dihatin pêşkêşkirin jî wê wan bijiya, wan hesta wê jî ew his bikin, lê têkiliyên di navbera bûyeran de jî wê ewqas kêm fêm bikin, ewqas hindik tişt hîn bibin. Li aliyê din, bi qasî piraniya tiştên wê bîn hinkirin, di kêfa hunerî ya ji listikê tê sitandin jî ewqas kêm bûn dihat dîtin.

Teatroyê buhraneke viha dijiya: Hema hema li hemû welatên medenî teşebûsên ceribînên nû ji pêncî salan vir de ye ku ji teatroyê re deriyên mijar û pirsgerkên nû vekiriye. Van teşebusan ew kiriye sazandeyê gelekî girîng. Lê dişa heman cerbanîyan teatro xistiye rewşeke wiha; li ser jiyana civakî (politik), ya ku têkildarê hînbûn û zanîne ye, bêtir sekinandin ji aliyê hunerî ve tunebûnek derxistiye holê. Li aliyê din, warê jiyane yê ku têkildarê hînbûn û zanîne ye her ku diçû teng dibû. Nexşandîneke teknîkî û şewazeke listikkirinê wisa pêşve çû ku, ji hînbûnê pirtir îluzyon, ji şiyarbûnê pirtir sermestî derdiket holê. Herwiha, ji cihê ku temaşevanan ronî bike, dixapand.

Piştî ku di sehneyê avaker (konstruktivist) de avekeriyê civakî tunebe wê bi kêrî çi bê ew sehne? Piştî ku dimenên cihanê yên kelkote û zaroyî ronî bike, sazûmanek ronahiyeke herî balkêş bi kêrî çi dihat? Ev hunera listikê ya telqînî ya ku

armanca wê X ê weke U yê nîşanî me bide wê ji bo me bi kêrî çi bê? Em dikarin çi hêviyan ji teatroya ku ji cihê rastiye ve tiştên çêkirî nîşanî me bide bikin? Piştî ku bêçareser bimîne çi xêr ji ronîdana ser pirsgerkan derdikeve? Ne tenê ber bi hesta ve çûyîn ber bi eqil ve çûyîn jî ji ber çibû? Rawestina di vê xalê de û pêş de neçûn ne tiştêkî biaqil e.

Rêya pêşketina teatroyê ya ku niha hatiye ketiyê, pevzeliqandina herdu hêzên teatroyê yanê ya hinkirin û kêfîkirinê pêwîst dîke.

Heger bê xwestin ku hewlên tèn kirin wateyê civakî di nav xwe de bihewînin divê ev hewl teatroyê bi amûrên hunerî bê techizat kirin. Û bikaribe tabloya cihana rastî pêşkêş bike û mînakên ku mirovên digel hev dijîn bide. Ev mînak, wê rê bide ku temaşevan derdora xweyî civakî binase û li ser wê him bi awayekî rasyonel û him jî hissî serdestiyêkê pêk bîne.

Mirovên dema me, li ser qanûnên serdestî ji jiyana xwe tiştêkî nizane. Weke mexluqekî civakî reaksiyonên wan gelek caran hissî ne, lê ev reaksiyonên hissî yên lihevketî û nexuyayî bê bandor in. Çemên zelal ên hest û azweriyên wî/ê zivirîn yên avên heram. Mirovên dema me yên ku di cihaneke dinamik de dijîn û ku ew bi xwe jî bi awayekî dinamik diguherin, ji nêrînek ku wê tevgerên wî di cihana ku tê de dijî bi serfirazî rekûpêk bike bêpar e. Ramana wan a li ser jiyana civakî a hebûna mirovahiyê kelkote, kêm û nakok e. Di piratikê de gotina ku bi kêrî tiştêkî nayê weke ku raste, ji ber vê yekê, heta ku di hişê wî/ê de li ser cihana rastî ramanên kelkote hebin ew nikare li ser wê serdestiya xwe pêk bîne. Haya mirovên dema me ji hêzên ku bi wî/ê ve girêdayine tune ye; ji mudaxleyên pêwîst yên li ser çerxa civakî û ji manipûlasyonên ku wê encamên tèn xwestin derxe holê bêxeber in. Çiqasî ku mirov li ser xwezaya objeyan tiştan bizanibin jî û ku li ser xwezaya mirovan têgihiştîneke berfireh bi dest nexistibin jî serdestiyêke ku li ser cihanê pêk were wê ji bo mirovan ji cihê dilşadiyê ve nedilşadiyê derxe holê. Ji ber vê yekê, keşf û îcadên girîng ji bo mirovan her ku diçe dibe tehdîteke mezintir. Û dişa ji ber heman sedemê, îro hema piştî her îcadê ew qirînen serkeftinê pir derbasnabe ku dizivirin qirîne tirsê.

Berî şer, min carekê radyo guhdar dîke. Bi rastî jî min bûyereke dîrokî jiya. Bi fizîkzanên ku di enstîtuya Niels Bohr

de dixebitîn, li Kopenhagê hevpeyvînek li ser îcada parçekirina atomê dihat kirin. Zanyaran, bi perçebûna atomê ve kifşkirina enerjîyeke nû û tirshêz dianîn zimên. Yê hevpeyvîn çêdikir pîrskir "Hun dikarin niha wî di pratîkê de tetbîq bikin an na". Ev bersiv hat dan: "Na, hîn mirovatî negihaştiye vê astê". Li ser vê, yê hevpeyvînê çêdike çawa ku ji ser dilê wî kevirekî mezin rabe bi rehetî got: "Yarebî şukur ji bo wê!". Paşê berdewam kir: "ku hûn ji min bipirsîn, mirovatî hê negihîştiye berpîrsariya ku çavkaniya enerjîyê wisa xurt bi kar bîne." Xuyabû ku hişê pêşkêşker di cî de çûbû ser pişesaziya şer. Fizîkzan Einstein ku li New Yorkê di demeke pêşdetir de, di fuareke mezin de du rêzik wek daxuyanekê ji bo nîfşên pêşerojê nivîsibûn, ne biqasî yê ku hevpeyvîn bi wî re çêkirî pêşde çûbû. Lê em dişa dikarin bibêjin ku wî jî gotinên jixwebawer û mezin gotibûn. Wiha dibêje Einstein: "Dema me, ji aliyê kesên zana ku bi keşfên xwe ve jiyana me bi hûr û kûr bikare hêsan bike ve dewlemend e. Îro piştî hêza makînan di nava deryayan ve derbas dibin, dişa piştî hêza makînan, masûlkên me ji zîyeta wan xebatên dijwar xelas bûne. Em hînî firîne bûn û em dikarin nûçe û peyaman bi rêya tîlên ceyranê bigihînin her aliyên cîhanê. De îcar em werin, di aliyê hilberin û belavkirina malan de organizasyoneke bi rêk û pêk tune ye; di dilê herkesî de, bivê nevê, tîrsa ku ji derveyî gerane aborî bimîne heye. Qey ev ne bes e, mirovên welatên curbecur, kengî tê hişê wan radibin bi hev re şer dikin, ji ber vê yekê, kesên ku bi paşerojê ve mijûl dibin dikevin nav tîrsê û vedicîniqîn. Sedema van tiştan jî, kêmbûna asta zên û kesayetiya girseyan e, ku qîmetê hemûyan ne bi qasî hindik kesên ku ji bo civakê tiştên girîng diafirînin e. 10

Em dibînin ku Einstein wisa difikire: her çiqas me xweza xistîbe bin bandora xwe jî, ji bo jiyaneke bextewar bandoreke erênî li ser jiyana me nake û li gor Einstein sedema vê yekê nezanîna mirovan e ku keşf û dahênan bi awayekî kêrhatî bi kar nayînin. Di derheqê derûniya xwe de mirov pîr hindik tiştan dizanin; ev jî encama ji tiştên ku mirov li ser cîhanê dizanin sûd wernegirin derdixe holê. Bi rastî jî, di her çar aliyê cîhanê de dagîrkirina mirovan dişa ji destê mirovan e, ew xeniqandina ku jê re dibêjin şer, ew hereketên her cureyî ve heysiyet kestandî, hema bêje bûye tiştêkî xwezayî. Lê mixabin

hemberî van bûyerên xwezayî, mirov li hemberî bûyerên din yê xwezayî hostatiya xwe nîşan nade. Minak, gelek mirov li şerên mezin weke bûyerên erdhejan yê ku xwezayî ne dinêrin; lê, ew mirovên ku dikarin pîrsgirêka erdhejan çareser bikin nikarin pîrsgirêkên di navbera xwe de çareser bikin. Em bibêjin teatro, tabloyeke cîhana hunerê ya bi kêrî tiştêkî tê derxe holê wê mirovatî çî ji vê kar bike! Hunera ku vê pêk bîne, ji bo ku civak bi pêş bikeve wê bi awayekî berfireh bigihîje hêza mudexleyê, wê ji ragihandina sixûrên nediyar derkeve, kesên ku difikirin û hisdikin wê weke jiyana xwe ya rojane ji cîhanê sûd wergerin.

Encax pîrsgirêk qet ne wisa hêsan e. Li ser vê yekê lêkolînên pêşîn didine xuyakirin ku pêk anîna peywira hunerê, yanê di dilê kesên ku eleqeya wan li ser heye de keleşanek pêkanîn, ji bo ku jiyana nû pêşkêş bikin cîhanê ji derveyî eslê wê nîşandayîn, bûyerên ku di navbera mirovan de derbas dibin bi awayekî ne rast nîşandan, ne pêwîst e. Huner dikare ku cîhanê hilhilî, vir û virçî yan jî weke tiştêkî ku çaxê wê çûyî jî bide xuyakirin û bi vî awayî bigihîje armanca xwe. Bi awayekî serilêdana wê telqîna artistîk, ya ku ji derheqê wê derketiye, dikare derheqê tîkiliyên di navbera mirovan de ramanên sereke yê beredayî weke ku yê rast in nîşan bide jî. Di hêza dijwarbûyîna xwe de tiştên ku tînin gotin dikare ji ber kontrolê birevîne. Di cîhê mantiqê de coşiyê, di cîhê delîlan de xeberdanên balkêş tîne. Bi rastî zanyariya estetîkê di hemû bûyeran de li ihtîmalekê digere, nexwe bi berhema hunerî bandora ku tê xwestin çê nabe. Li gorî nêrîna wê heger ku ew bandor bê bi dest xistin jî hêzdarîyê nahewîne. Lê ev tenê bûyîneke estetîkî ye, mantiqêke artistîk e. Tê qebûl kirin ku cîhaneke hunermed ya xweser heye û qanûnên vê yê xweser hene. Di berhema xwe de gelo filan an jî bêvan sereta hunermend bikaranî, hemû seretayên din jî divê derxe holê û di vî karî de hêmana ku hatiye pejirandin divê hevgerî be. Bi vî awayî dikarin ji bo hesabê hemû berhemê qala serkeftinekê bikin.

Hunermend, di berhema xwe de îmtîyaza afirandina cîhaneke xweser ya ji cîhana rastî cîhê bi xêra rewşeke ecêb bi dest dixê. Ew jî, bi tîkildariya hêmana telqînê di navbera temaşevan û hunermend, pişt re di navbera temaşevan û kesê ku li sehnê tê

pêşkêşkirin û bûyeran de wekhevîbûnek derdikeve holê. Em ê niha vê regeza wekhevîbûnê binirxînin.

Wekhevîbûn di roja me de himê estetîka serdest e. Aristoteles, di Poetîka xwe ya mezintirîn (muazzam) de dibêje ku katharsîs, yanî paqijbûna rûhî ya temaşevanan wê bi rêya mîmesîsê lî çê bibe. Lîstîkvan, bi qehreman, Odîpus an jî Prometheus, xwezî pê tîne û vê xwezî pênîne bi telqîneke wisa û bi hêzeke wekhevîbûnê pêk tîne ku temaşevan jî xweziyê bi wî tîne û bi vî awayî xwedî li jiyana qehremanan derdikevin. Ez weke ku dizanim, Hegel dema ku pirtûka estetîkê ya mezin ya herî dawî hildide pênûsê, balê dikşîne ku hestên li hemberî rastiye mirov his dike dikare li hemberî rastiya li hev anîne jî bijî. Ezê niha ji we re qala hinek ceribînen yên ku bi rêya derfetên teatroyê, xwestine ku tabloyeke cihanê ya di pratîkê de bi kêrhatî biafirînin, bikim. Û herwiha ji behsa, me li hemberî pirsgirêka ku divê ji dev wekhevîbûnê berdin yan na, bikim.

Eger helwesta ev ji çend sedsala virde ye bi serfiraziyeke mezin li hemberî xwezayê tê girtin, li hemberî mirov jî bê girtin, hew serî li wekhevîbûnê nayê xistin. Ev helwesta ku guherînen di xwezayê de çêdibe ferqdike, bi armanca destxistina serdestiya xwezayê de ye, li mirov bi hemû tîkîlî, tevger û sazîyên xwe ve wek tiştêkî statîk û neguherbar nabîne. Bi mirovên ku tînen guherandin, bûyerên ku dikari bê sekinandin û êşên bêkêr ve hwd. wekhevîbûn nayê çêkirin. Kengî me bawerkir ku stêrk û burcên qedera Qral Lear diyar dikin di hundirê sînga wî de ne, kengî me Qral Lear wek neguherbar, herektên wî xwezayî û naye astengkirin dît, wê çaxê em dikarin bi wî re wekhev bibin. Çawa mirovekî ku sedsala dehemîn, nikare li ser perçebûna atomê xeber bide, hereketên Qral Lear jî dema ku ji vî alî de bê nerîn, nabe mijareke gengeşiyê.

Heke tîkîliya navbera temaşevan û sehnê li ser bîngeha wekhevîbûnê bê danîn, tiştên ku dê temaşevan bibîne tenê biqasî tiştên ku dê qehreman bibîne ne. Li aliyê din, li hemberî bûyerên ku li ser sehnê tînen pêşkêşkirin, temaşevan tenê dikare li gorî hewayaya sehnê reaksiyonan nişan bide. Feraset, his û zanistiyên temaşevan bi yên lîstîkvanan ve tînen girêdan. Sehne, his û heycanên ku bi rêya telkîne nayê pêşkêşkirin, dernaxîne. Feraset û zanistan ranagihîne. Hêrsa Qral Lear a ji bo keça xwe, derbasî temaşevanan dibe. Dema temaşevan

temaşê dike, wekî Qral Lear hêrs dibe, hisên mîna matmayîn, fikarî nabihîse. Bi kurtî, hêrsa Qral Lear li aliyê heqbûnê de nayê ceribandin, bîner ji encamên muhtemel re nayê agahdarkirin. Li wir mabest ne niqaşkirin e, lê belê parkirin e. Fenomenên civakî wek tiştên ji mêj ve û bêdawî, xwezayî, nayê guhertin û ji durî nirxekî dirokî tînen pêşandan û nabin mijarên niqaşan. Her çiqas ez li vir peyva "niqaş"ê bikarbinim jî, mebesta min ne hêrsandina temayekî bi hişkî ye. Ango ne tenê prosesa entellektuel dibêjim. Bi min, li vir, ya girîng ne tenê ew e ku temaşevan hemberî hêrsa Qral bêhis bibe. Herwiha, divê rêya wê hêrsê, rasterast li ser aliyê rihê temaşevan ve neçe-(Lê, divê tovên hêrsê li ser rihê temaşevan ve neyên reşandin). Mînakek: Kent, xulamê Qral yê dilsoz, hêrsa Qral Lear par dike. Kent, li wî xulamî dixê ku fermana keçên nankor bicihtîne, û dijî daxwaza Qral hereket dike. Niha, temaşevanê dema me, dê lêdanxwarina xulamê ku li gorî fermanê hereket kirî tesvîb bike? Pirs ew e: Beşa wê sehnê dê çawa bê lîstin ku, temaşevan hêrsa Qral li (bi)xwe his neke, herwiha ji ber hêrsa Qral jê re (ji qral re) bixeyide? Tenê, dema temaşevan ji wekhevîbûne tê dîrxistin û bandora telqîne kêr dibe, ew hêrsa hanê (hêrsa dijî hêrsbûna Qral), dê wek hêrseke mafdar bê te dîtin. Tolstoy, nexasim li ser wê meselê gotînen girîng gotiye.

Wekhevîbûn, alavekî girîng a artistîk a serdemekê ye. Serdemek, ku insan wek tiştêkî guherbar, û hawirdor jî wek tiştêkî sekinî dihat nirxandin. Kes encax, bi şexsê/a ku naşibe me, ev stêrkên ku di sînga xwe de dihevine û li ser qedera wî/ê hukum dike, wekhevîbûnê dikare çêke.

Dev ji wekhevîbûnê berdan, bêguman, ji bo teatroyê dê biryarekî pir girîng be. Herwiha belkî bibe tecrûbeyên herî mezin ku mirov dikare bifikire.

Mirov bo çi diçin teatroyê?

Ji bo ku bicoşin, hestiyar bibin, rehetî û aramiyê destbixin, ji bo ku ji cihana rastîn dûrbikevin, ji bo ku bikevin bin bandora dîmenên xeyalî. Ewan hemû, tiştên ewqas xwezayî ne ku mirov dikare bibêje huner; azadkirina temaşevan, bi beroşîkirina wî, bi aliyê hizirî ve berzkirina wî ye. Hunera ku nikare van pêkbîne, wek hunerê nayê hesêbiandin.

Îcar pirs ev bû: Gelo bêyî wekhevîbunê jî tam û çêjeke hunerî pêkan e? An jî, mirov dikare tam û çêja hunerî li ser bingehêkî din destbixe?

Çi dikare li dewsa wê pêwendîya klasîk, ku bi tirs û berketinê pêk dihat, cih bigire? Ew pêwendîya ku Aristoteles li Katharsisê 12 xwe de kar anî bû. Hema bêje dev ji îpnozê hat berdan, bangên li ser sehnê tene kirin wê rêberî ku derêbin? Em ê wê li teatroyên nû li dewsa ew helwesta pasîf a temaşevanan ku bi qedere razî û tiji xiyal e, çi bicihbikin?

Dive êdî, ew ji cihana xwe ya rastîn bi destê zorê neyê dîrxistin, û li cihana hunerê de xwe winda neke. Berevajî, divê bi awayekî hişyar, çavzîq, berbi hundirê cihana xwe ya rastî ve wê bimeşe. Gelo ne pêkan e ku dewsa tîrsa ji qedere, hezkirina zanîstê; û dewsa berketinê jî xêrxwazî cihbigire? Bi xêra wê rêyê pêwendiyekî nû li navbera temaşevan û sehnê nayê danîn? Gelo ma ji bo tama hunerî, ew nedibû bingeha nû?

Ez vira nikarim li ser teknolojiya nû ya listiknivîsinê, danîna sehnê û rêbazên teknîkê ku me tecrûbeyên xwe bi wan pêkanî bisekinim. Lê, rêgeza ku me dixwest di cerbanîyên xwe de pêkbînin, cihê wekhevîbunê, bicihkirina biyanîkirinê bû.

Biyankirin çî ye?

Biyankirina bûyerekê an jî karakterekê, bi jê dîrxistina wî ya ji halê siruştî, terza ku tê zanîn û nasîn, nêzîkahiya wî ya bi rêya baqîlane re û li ser wan jî şewekirinekî ku meraq û heyîrîne li bîneran bide hîskirin çêdibe. Li vir em di sa vegeerî ser hêrsa Qral Lear, ku ji ber nankoriya keçên wî lê peyda bibû. Şanovanê ku teknîka wekhevîbunê bi kartîne, dikare wê hêrsê wisa pêşkêş bike ku, temaşevan wek tiştêkî herî siruştî lê binêre. Wisa ku hêrsa Qral Lear wek tiştêkî "jênager" binirxîne. Bi wî awayî, ew bi xwe jî hîsên Qral Lear dijîn û dibin qurbanekî wê hêrsê. Berevajî, bi karanîna rêbaza biyanîkirinê, listikvan wê hêrsê wisa pêşkêş dike ku temaşevan matmayî bibe, û bifikire ku Qral dibe ku bi awayekî din hereket bike, hêrs nebe. Helwesta Qral Lear, bi wî awayî, wek biyanîbûyî ango taybet, sosret, balkêş, bûyerekî civakî ku ne siruştî be, tê nîşandan. Ew hêrsa beşerî ye, lê bi awayekî global ne derbasdar e. Mirov dê hebin ku ew hêrsa hanê wisa hîsnekin. Li bûyerên mina hêrsa Qral Lear de, ne hewce ye ku herkes, her caran, heman hêrsê hîsbikin. Bêguman hêrsbûn

tevgerek miroviye ku, hindî dinya heye wê hebe. Lê ew hêrsa hanê ku li Qral peyda dibe û li ber sedemeke wî awayî pêk tê, bi zeman ve girêdaye. Îcar, biyanîkirin di heman demê de dibe "dîrok kirin" jî. Ango pêşkêşkirina bûyer û kesan wek dîrokî, bi gotineke din, tiştên "guherbar". Bêguman em dikarin wê li ser kesên îroyîn jî bibêjin; em dikarin hemdemiyên xwe jî, hereketên wan jî li gorî serdemekê, ango dîrokî, ango guherbar nîşanbidin.

Bi wiha ve em dê çî bidestbixin? Êdî bîner mirovên li ser sehnê, wek mirovên ku tu caran nayên guherîn, dîrî tesîra derveyîn, bêçare û di bextê çarenûsa xwe de nabîne. Heynê ew pêk tê, temaşevan dê bikaribe bêje "mîrovek wisa ye an wisa ye, şert û merc wisa ne, lewre ew e bi wî awayî ye." Ne tenê wek ku mirov li ser sehnê tê nîşandan, lê belê dê bikare bi awayên din jî wî mirovi bisêwirîne. Herwiha wê ew pêkan bike ku bîner şert û mercan jî, ji yê li ser sehnê cudatir bifikire. Wek mîrovekî hemdem, temaşevan wê bikare helwesta xwe ya li hemberî siruştê, li hember dîmenên ser sehnê ku cihana mirov pêşkêş dikin jî bigire. Di warê teatroyê de jî, wek yekî ku li hemberî bûyerên civakî û xwezayî dikare bertekan nîşan bide dê bê dîtîn. Aliyê din jî, wek reformîstekî ku dixwazê bandore li dinê bike. Êdî teatro wî naxewîne, natevizîne, bi dîmenên vala re dorpêç nake û bi qedere re lihev nayîne. Dê cîhaneke ku mirov bi xwe birêvedibe û tê de serbîlînde pêşkêş bike.

Rêbaza biyanîkirinê, piştî birek ceribîna li Elmanyayê, pêkhat. Li Teatroya Schiffbauerdamm a li Berlînê ji bo destxistina şeweyeke leyistîne ya nû, me hinek xebat darxistin. Li nav nîfşa listikvanên ciwan yê herî perwer; wek Wiegel, Peter Lorre, Oskar Homolka, Neher, û Busch tevî van xebatan bûn. Ew tecrûbên ku ji yê gruba Stanislavski, Meyerhold û Vaçtangov cuda bûn (wek mînak piştgiriya dewletê tune bû) bi qasî yê wan sistematîk nedimeşîn. Lê li aliyê din, ne tenê li teatroyên profesyonel, lê di warekî berfirehtir de pêkdihatîn. Hunermendan li tecrûbeyên dibistanan, koroyên keddaran, komeleyên amator hwd. cih digirtin. Perwerdekirina amatoran hêj ji serî de, girîng bû. Li dawiyê ew ceribîna di alava teatroyê, şeweya leyistîne û bijartina babetan de sadetî û zelaliyek pêkanî.

Yên me, piranî, wek berdewama ceribînen teatroya Piscator bûn. Berî wê demê, bi pêşveçûna teknîkê ve, Piscator şeweyeke



hêsan dabû teatroyê. Listika epîk ku me li Teatroya Schiffbauerdammê pêkanî, di demeke kurt de aliyê xwe yê hunerî da qebûl kirin. Di wê navberê de, şeweya listinê ya "ne Aristotelesî- dijî Aristoteles" jî, bi mijarên civakî yên sereke ve mijul dibûn. Bikaranîna hemû îmkanan, hêmanên dans û tasnîfkirinê yên ekola Meyerhold û hêmanên naturalîst yên Stanislavski gihiştine warê hunerî. Têkiliya navbera diksiyon û jestan xurttir bû; zimanê rojane û xwendina ristên helbesta, li gorî prensîbên gestus hatin çêkirin. Li danîna sehnê de şoreşekî yekser pêkhatibû. Bi xêra nêzîktêdayîneke azad, rêgezên Piscator danîna sehneyekî hem didaktîk (hînger), hem jî qerfî pêkan kir. Her wekî sembolîzmê, iluzyonîzmê jî li refên bitoz de cihê xwe girt. Rêgeza Neher, di provayan de li gorî pêdiviyên dekorkirina sehnê, derfet da derhênerê teknîkê ku jî listikê sudê wergire û tesîrê li listikê bike. Nivîskar jî, di pêvajoya xebata hevpar a bi listikvan û dekorator re de, hem bandor li ser wan kir û hem jî listikên xwe di bin bandora wan de nivîsîn. Li aliyê din wênesaz û muzîkvanan serxwebûna xwe bidestxist û bi wî awayî dîtin û fikrên xwe yên li ser babetê (tema), bi saya alavên hunera xwe binî ziman. Bi wî awayî berhema hunerê bi hêmanên ji yek cuda ve dihat pêşkêşkirin.

Repertuara klasîk, hêj serî de ji bo gelek ceribîna bibû bingeh. Rêbazên biyanîkirinê, nîrxên zindî yên listikên kevn gihandine temaşevanên îroyîn. Biyanîkirin, bêtî ku xwe bide aliyê nûjenkirinekî tehrîbkar û teknîkên muzeyê, derfet da ku listikên kevn ên girîng bi awayekî qerfî û hînger bêne pêşkêşkirin.

Azadbûna ji mecburiya karanîna îpnozê, nexasim li ser komên amator ên nujen ku bi kedkar, xwendekar û listikvanên zarok pêk hatî, bandorekê erênî kir. Bêtî ku karîgeriyên teatroyê yên bingehîn bêne paşvedan, ji hev cudaxistina listikên şanovanên amator û yên hosta wek tişteki normal hat hesibandin.

Li ser wê bingeha nû, gelek cure rêbazên listinê gihiştin hev. Wek mînak, rêbazên komên Vaçtangov û Okhlapkhov li ser vê bingeha nû, bi rêbazên komên karkeran digihiştin hev. ceribînen ku li pêncî sala belav bibûn, ji xwe re bingehêk peyda kirin da ku bêne tetbîqkirin. Bi wî awayî, ji wan sude wergirtin ji pêkan bû.

Lê, vegotin û qalkirina wan ceribînen hanê ne ewqas karekî hêsan e. Li vir ez dikarim bêjim ku bi rêya biyanîkirinê, me tam û cêjeke hunerî pêkanî. Ev jî ne tişteki ecêb e; ji ber ku, heke em tenê li ser rêbazê bifikirin, teatroyên demên kevn jî bikaranîna efektên biyanîkirinê ve tam û cêjeke hunerî bidestxistine. Em dikarin teatroya Çînê, teatroya klasîk a Spanya yê, teatroya populer ya dema Breughel û herwiha teatroya Elisabethê wek mînak nîşan bidin.

Gelo ew şewaza nû ya listikîkirinê, şeweyekî "nû" ye? Şewazeke ku tû kêmasî lê ne, rêbazekî yekser û rêk û pêk, berhema hema ceribane? Bersiva van pirsan: "na" ye. Rêbaza listika epîk tenê rêyeke; rêyek e ku em dişopînin. Divê ceribîn hêj berde wambin. Pirsîgîrêk jî bo hemû şaxên hunerê derbasdare û di radeyeke qerase de ye. Çareserîya me peyda kir, tenê yek ji çareserîyan e û em dikarin pirsîgîrêkê wiha binî ziman: Em çawa dikarin hem formeke hînger û hem jî qerfî bidine teatroyê? Em çawa dikarin wê, ji bazîrganiya madeyên tevzker durbixin? Em çawa dikarin dewsa dimenên vî i vala, ciyekî ku tê de ceribîn tene kirin bicîhbikin. Em çawa dê bikaribin mirovê serdema me ku ne azad e, nezan e, lê hewcetî bi zanîne heye, mirovê ku di bin îşkenceyê de ye, qehreman e, mirovê ku tê xapandin, mirovê ku xwedîye mejiyekî kifşker e, mirovê ku diguhere û tê guhertin bikin xwedîye teatroyekê ku di têkoşîna xwe ya pêşvebirina xwe û cîhanê de piştîgiriya wî bike.

### Têbînî

1 Brecht ev axaftin di 4 ê Gulana 1939 a li pêşiya koma Teatroya Xwendevanê Stockholmê kiriye, paşê di Îlona 1940 î ji nuh de li wê axaftinê dinere û bi hin guhertina li pêşiya koma Teatroya Xwendevanê Helsinki dubare kiriye. Tekstê axaftinê cara ewil wek îlaweyê kovara "Theater der Zeit"ê, di 1954 a de tê çap kirin. (Nota, yê wergerandi ye Turkî.)

2 Listika ansamble: Listika taqimê. Listika ji pêvajoyek kolektîf derketiye. (n.w.)

3 Rêya bi çiçek: (flower way) Rêya teng ku ji salona temaşevan derbas dibe û ji bo ku listikvan çûn û hatina ser sehneyê bike. (n.w.)

4 Lîstika girse: Lîstika ku li hemberî temaşevan, lîstikvana ne tenê tenê lê girseyan, qehremana ne tenê tenê lê koma derdixe pêş. (n.w.)

5 Sehna zîvirok: Avahiya li ser sehneyê ku ji perçên zîvirok pêkhatiye û hereketê dide sehneyê. (n.w.)

6 Perda ezman: (Cyclorama dome; sky dome) Perda sipî ku li paşya sehneyê û carna li tewda bilindahiya sehneyê tê kişan. (n.w.)

7 Revu: Formek pêşande ya bi terza komediya muzîkal ku sehneyên ji hev dû bê eleqe, stran û dansên li dû hev dû tê pêşkêş kirin. (n.w.)

8 Bi rastî jî teatroyên mezin li ser tecrûbên di vê îstiqametê arîkariyên fewqalade kiribûn. Çehov, wek Stanislavski, Ibsen jî wek Brahm direktorek ditiye hwd. Lê belê, inîsiyatifa li ser zêdekirina qedrê hînkêr ê teatroyê, bi rastî ewil jî ber hunerê lîskê derketiye.

9 Lîstika mîlyo: Lîstika dikevi hundirê teatroya natûralîst ku fikra, qedera kesekî ji terefî derdora di hundirê wê de dijê tê nîşan kirin, diparêze. (n.w.)

10 Nerîna teknokrat ya vî zanayê mezin em li vê derê bi hûr û kûr lê nagerin. Bê şik, ji bo civakê çî kêr tê heye ji aliyê girseyan ve tê hilberandin. Dijî gera mala ekonomîk de kesên zanaye ku jimara wana ne zêde destê wana de qet tiştek nayê. Ji ber vê yekê an jî rasterast, ev gotinên Einstein ku tespîtîkirina pîrsgîrekên civakiyê ye nayê zanîn jî besî me ye.

10 Mîmesîs: Hunerê teqlîdê. Gelek manê wê hene; ji qopyakirina rastiyê yekcarî eynê hetta zalvekirinek dahênerî, manê wê dûdirêj dibin. (n.w.)

12 Katharsîs: Feraseta Arîstoteles di berhema xwe ya bi navê Poetîka de bikar tîne. Ji peyva "paqîj bûn"ê ya bi Yewnani tê. Li gorî Arîstoteles armanca listikekê, bi xêra şiyarkirina hêstên tirs û berketinê di temaşevan de paqîjbûnê bikar tîne. (n.w.)

## Ferhenga Brecht

**Berliner Ensemble:** Koma teatroyê ya ku ji aliyê Bertolt Brecht û Helene Weigel ve di 1949 an de li Berlîna Rojhilat hatiye sazîkirin. Berliner Ensemble, di Çileyê 1949an de ku derhênertiya lîstika xwe Mutter Courage und ihre Kinder (Dayika Bêtirs û Zarokên Wê) kiriye, wek mileki Deutsches Theaterê derketiye holê. Di komê de, Helene Weigelê lîstîkvanî kiriye û bi Brecht re derhênertiya wê dike. Kom bi taybetî ji endamên Deutsches Theaterê yên ciwan pêk tê. Birastî pêşîn, kom wek kumpanyayek tûrnê hati bû fikirandin. Komê, sala 1949an de, bi Herr Puntilla und Sein Knecht Matti (Mîrza Puntilla û Xulamê wî Matti) ve lîstîkên ku Brechtî nivîsî an jî lêanî ji xwe re wek rêgez dani. Di sala 1954an de, Berliner Ensemble derbasî Theater am Schiffbauerdammê bû ku wek teatroyeka serbixwe ya dewletê di bin banê ADC yê (Kluba Derhênerên Hunerê) de hatibû sazîkirin. Berliner Ensemble, di 1954 an de bi Dayika Bêtirs û Zarokên Wê, û 1955an de jî bi Der Kaukasische Kreidekreis (Çixêza Tebeşîra Qefqasa) ve hin turne li Ewropa yê çêkirin. Û bi xêra wan turneya, Berliner Ensemble navdar bû û ji aliyê rexnegiran ve hat ecibandin. Piştî mirina Brecht, 1956an, Helene Weigel derhênertiya komê hilda ser xwe, û heta mirina xwe ya 1971an, bi hinên din re derhênerî rêvebir. Di salên 70 yî de, her çî qas hin nakokî bi metodên dijî-teatroya Brechten ve çêbibin jî, Kumpanya li ser rêya xwe çû. Dû mirina Weigela Ruth a 1971an, Berghaus bû derhêner. Kevneşopên komeleyê metodên wî yên tecrûbî rexnekirin, û 1977an Manfred Wekwertî cihê Berghaus girt. Bi yêkbûna Almaniyayê ya sala 1990an ve, komele bû saziyekê dewletê. Heta 1992an, dewletê alîkariya wan kir, û ji aliyê komekê derhêneran ve hate rêvebirin. Di nav koma derhêneran de Heiner Muler jî hebû, ku 1992an de rêveberî û derhêneriya hunerî ya komeleyê hildabû ser xwe, û heta mirina xwe ya 1995an meşandibû. Her çiqas şexs li komele xwedî derdiketin jî, komele ji dewletê arîkarî distand. Ew rewşê çar salên din, heta ku 1999an komele belavbû, domkir. Berliner Ensemble di sala 2000an de dîsa avabû, û kete rêya teatroya politîk.

**Brechtien:** (Fr. Brechtien, Elm. Brechtisch, İng. Brechtian) Ev rengdêre, navê xwe ji navê Bertolt Brecht distîne û ji bo teatroya ku bi navên curbecur wek epîk, rexneyî, diyalektik an sosyalist hatiye bikaranîn. Û her wiha ji bo stîlek listinê ku alikariya beşdariya temaşevan dike, bi taybetî jî çaxa listina pêşandana siruştî.

Ev terîm gelek cara ji bo şayesandina stîlek şanokirinê dihat bi kar anîn ku ev jî baldikişîne ser rewşa dirokî ya rastiya tê rêdan (dirok kirin). Ji xeynî vê, temaşevan bizav dike ji bo di dîrariyekê de bimîne û nekeve hundirê wê, ku bi xwe trajîk, dramatik, an bi hêsanî siruştiya iluzyonîst e.

**Dirok Kirin:** (Elm. Historisierung, Fr. Historicisation, İng. Historicization) Ev terîm ji aliyê Brecht ve hatiye çêkirin. Dirokirin tê wateya, rê dana bûyerekê an karakterekê di bin şewqa sosyal û dirokî ku îzafî û guhêrbar e. Ev "rêdana bûyeran û mirovan, di rewşa wan a demdorî û dirokî" ye. Her wiha ev jî rêberiya temaşevana dike ku bifikirin, rastiya wan bi xwe dirokî ye û ji ber vê jî dikare bê rexne kirin û guhertin.

Di dramaturjiya Brechtien de, weke di pêşkêşkirinek ku ji realizma Brechtien a rexneyî îlham girtiye, dirok kirin red kirina rêdana hebûna mirov di takekes de ye. Şewqa anektodîk jî, ji bo rêdana bingeha enfastrûktûra sosyo-dirokî di nakokiyên takekes e. Bi vê maneyê, dramaya takekes a leheng, ji nû ve kontekst kirina civakî û politikî ye. Û tu teatro ne dirokî û ne jî politik e. Dirokirin, hebûna birastî ya ku di dirokê de ye derdixê holê: listikê di hundirê konteksta xwe de, û temaşevanan jî di rewşên wî yên xweş de: "Dirokirin, fikra sistemek sosyal a hatiye dan, ji hêlek sistema sosyal ya din de teşvîk dike. Peresana civakê hêlên nerînê destdixê". Amrazê fûndamental ê dirokirinê, efekta biyanîkirinê ye, ku temaşevan çiqas bi performansa teatroyê heman jî bi rastiya xwe biyanî dibe. (Bnr. Teatroya Epîk)

**Dramaturjî:** (Fr. Dramaturgie, Elm. Dramaturgie, İng. Dramaturgy) Dramaturjî, huner an teknîka kompozisyona dramatik an jî pêşandana teatrîkal e. Bi vê maneyê, him dramaturjiya Îngilîz û him jî dramaturjiya Fransî bêdestûr jî Dramaturgie ya Elmanî sitendin. Ev peyva hanê ji aliyê dramatisst û rexnegirê Elman Gotthold Lessing, di rêzên

maqaleyên bideng ku bi navê Hamburgische Dramaturgie de (Dramaturjiya Hamburg), ji 1767 heta 1769 hatiye çap kirin. Ev peyv ji peyva Yûnan dramaturgia, "kompozisyona dramatik" an "çalakiya listikekê" ye.

Ji cergî Brecht û teorîzekirina wî li ser teatroya dramatik û epîkê, hat dîtin ku nosyona dramaturjiyê di van nîkneyên jêr de fireh bû:

1. Di heman demê de, îdeolojî û struktura şeweyî ya listikê.
2. Pêwendiya taybet a di navbera şewe û naverokê.
3. Karên hemû-dorpêç ku teksta sehnê avadikin û tînen birêvebirin ji bo ku tesîrek taybet li ser temaşevan bikin. Ji ber vî hawî, Brecht difikire ku "dramaturjiya epîk" bibe formek teatroyê ku ev karanîna amrazê daxuyanîyê û efektên-biyanîkirinê baştir rastiya sosyal terîf bike û tevkarîya wê biguherin.

**Dramaya Burjûva:** (Elm. Bürgerliches Drama, Fr. Drame Bourgeois, İng. Bourgeois Drama) Di sedsala 18an de, ji bo demeke kin, li Fransyê cureya listikê ya herî populer bû. Ew listikene ji bo çîna navîn tînen nivîsîn û herwiha mijarên wan jî dîsa çîna navînê. Li ser fikrên rewşenbîrê Frensî, Denis Diderot (1713-84) hatiye avakirin. Listikên burjûva yê, di cihekî di navbera trajedî û komedî yê de ne, û armanca wan ew e ku pîrsgirêkên çîna navîn û xerabiyên civakî pêşkeşbikin. Lê, gelek caran ew listikene bi kêfxweşî bidawî dibin. Teatroya Brechtien û teatroya burjûva ne li ser heman ferasetê de ne. (Bnr. Teatroya Îluzyonîst û Teatroya Aristotelyen)

**Efekta Biyanîkirinê:** (Elm. Verfremdungseffekt, Fr. Distanciation, İng. Alienation effect) Yek ji wan rêgezên teatroya epîk ku ya herî girîng ev e. Pêkanîna efekta biyanîxistinê, çiqas ji bo pêşî girtina ku temaşevan bi awakî siruştî li bûyerên li ser sehneyê binêre û bi wan re wekhevîbûnê ya jî, li aliyekî din jî, ji bo gihîştina armancên gelemperî yên teatroya epîkê ye jî. Bi vî awayî, tersa teatroya dramatikê, ji bo temaşevan şertên hawe amade dike ku mirovên tê berceste kirin ji dîrahiyek belû temaşe bike û rexne bike. Temaşevan bi xêra efekta biyanîkirinê, dê bikare pîrsa bipirse, wê bikare tevgerên rexneyî yê zanyariyên xweza û civakê bipejirîne û dê bigihêje biryarekê. Xweşiya ku wê di dawîya vê debistîne, wê xweşiyek ku mirov bi fikrê bigihêje be.

Ji bo Brecht efekta biyanîkirinê her çiqas enstrumanekî politik be jî, ew qas jî tevgerek estetîk e. Armanca "biyanîbûnê" ne ferasetek nû an jî efektek komîk e, lê belê prosesek îdeolojiya "ne-biyanîkirinê" ye. Efekta biyanîkirinê di xebata hunerê de derbasîyek ji amrazê estetîk berbi berpirsariyek îdeolojîk ve çêkir.

Efekta biyanîkirinê, di heman katî de, kete dewsa ahengên di sewiyên curbicur de:

1. Çîrok, du heb çîrokan dibêje: yek jê berceste ye û ya din kurteyek û meteloka wê ya metaforîk e.
2. Dekor, objeyê ku lazim e bê naskirin û rexneya bê kirin nîşan dide.
3. Bi xêra jestan, em derheqê takekes û statuya wî a sosyal û tîkilyên wî yên bi cihana ku pêre dixebite dest dixin, ev jî gestûsa wî/ê ye.
4. Diksiyon, bi bêqîmetkirina tekstê naxê rewşek "psîkolojîze", lê ritîm û qîlafetê sûnî ji nû ve çêdike.
5. Bi riya lîstîkvaniya wî, aktor ji girgînkirinê zêdetir karakterê lîstîka ku dilîze rêdide.
6. Dengdana temaşevan, stran û guhêrinên xuya yên sehneyê jî amrazên ku îluzionê dişikîne ne.

**Efekta-B:** (Elm. V-Effekt, İng. A-Effekt) (Bnr: Efekta Biyanîkirinê.)

**Epîsod (Bûyer):** Episod, parçeyên lîstîkê ne. Rêzêbûyerên di episodekê de dibe ku bi awayekî binavber an jî bêrêzik bin.

**Gestûs:** (Elm. Gestus, Fr. Gestus, İng. Gestus) Jesta civakî. Brecht terîma gestûsê di nivîsên xwe de wiha tarîf dike: "Tiştê ku bi gestûsê tê gotin ev e ku; tevda jest, mîmîk û peyvên ku mirovek an jî zêdetir, ji xwe re mirovek an jî zêdetir kesan armanc dike, ye. (Bnr. Teatroya Epîk)

**Katarsîs:** (Ji Katharsis a Yewnaniyan, bi paqîjkirinî) Di Poetîka ya xwe de Aristotle behsa ji holê rakirina hestan dike. Dibêje ku dema temaşevan bi lehengê trajîk re wekhev dibe, hîsên wî (nexasim tîrs û dilpêsootin) zêf dibin. Katarsîs, dema di şanoyê de musîk tê karanîn ji pêktê.

Katarsîs hem armanc, hem jî encameka trajediyê bû, ku "azirandina (provoke kirina) tîrs û dilpêsootinê dibe sedemê ji holê rakirina wan hestan" (Poetîka). Ew a termeka girîng e ku

wekhevîbûnê tîne rêza barkirin û xalîkirina hîsan. Dawiyê, encam, bi dîsa jixwe tîgihîştinê ve dibe safîkirin û "paqîjkirin".

Comeille, Rousseau, Diderot, Lessing, Schiller, Goethe û Nietzsche li ser fonksiyona katartîk ku hinekî aloz e (nediyar nesafîye) şîroveyên cûda cûda kirine. Niqaşa dawî ya li ser katarsîs ji aliyê Brecht ve tê kirin. Brecht wê, (bi heyecanekî ku li ji Şanoyê re rêbazekî Bicuk a xwe û pêvekên wê de daye xuyakirin) tîxe nav biyanîbuna îdeolojîk a temaşevên, û dibêje ku textek (deqek) girîngiyê tenê dide ser nîrxên ne-dîrokî yên lehêng. (Bnr. Teatroya Aristotelyen)

**Lehrstrucke:** (Bnr. Lîstîka Hînger û Teatroya Didaktîk)

**Lîstîka Hînger:** (Elm. Lehrstück; Fr. Piece Didactique; İng. Didactic Play) Di hewla xwe ya hînkirina temaşevên de lîstîka hînger, ji bo tezekî filozofîk an jî politik dixebite. Li bendê ne ku temaşevên jê re feyde yê(sud) wergire, û di jiyana xwe ya takekesî û civakî de bikarbîne. Carna rol tîne guhertin û lîstîkên hînger ne ji bo temaşevanan lê ji bo aktorên tîne çêkirin.

**Lîstîkvaniya Epîk:** (Di hundirê Teatroya Epîk û Lîstîkvanê Vebêj bnr.)

**Projeksiyon:** Rêbazêke ku berî Erwin Piscator û piştê jî Brecht bikaraniye. Di vê rêbazê de, bûyerên ku dê bêne pêşkêşkirin li ser afîşên mezin tîne nivîsandin da ku bîner bibîne. (Bnr. Teatroya Epîk, Efekta Biyanîkirinê)

**Sehneya Kolanê:** (Elm. Die Strassenszene, İng. Street Scene) Makaleya ku Brecht di sala 1940 a de di derheqê teatroya epîk de nivîsi ye. Brecht di vê makalê de teatroya serê goşeyê wek modelek biçûk a teatroya epîk distîne û dest bi pêkanîna rêgezên teatroya epîk dike. Brecht di teatroya serê goşeyê de, pîrsgirêkên civakî (mînak qezayek trafikê) ku mirov di jiyana rojane de lê rast tê, distîne û analîza vê pîrsgirêkê ku lazim e çawa bê çîrok kirin dike.

Rêgezên teatroya serê goşeyê, di heman katî de rêgezên teatroya epîk in jî. Ev pênc rêgezên sereke ku Brecht nîşan kiriye "ji bo teatroya epîkê ne kêm û ne jî pir e":

1. Divê ji hêla civakî gerek xwediyê nîrxekî pratîk be.

2. Divê, wê çi teqlid bike û di vebêjeya xwe de wê çiqas serî li teqlidê bidê, li gorî cihên dixwaze ku di bûyera behs dike balbikişînê, diyar dike.

3. Vebêj karaktera kesê/a ku berceste dike ji tevgerên wî/ê derdixe.

4. Vebêj, bi du hêla lazim e tevgerên sirûştî pêşkêş bike: Tim gerek di eqlê wî/ê de be ku ew vebêjek e, kesê/a ku teqlid dike gerek ji bilî xwe wek mirovek berbiçav pêşkêş bike. Vebêj, gerek di navbera xwe û kesa/ê ku behsa wê/î dike cudatîyekê bêxe, qet bitemamî gerek neşibe kesa/ê ku berceste dike.

5. Vebêj di vebêjeya xwe de ji teknîka biyanîkirinê îstifade dike. (Bnr. Teatroya Politik, Lîstîkvanê Vebêj)

**Teatroya Ajît-Prop:** (Elm. Agit-Prop; Fr. Theatre d'agit-prop; Îng. Agit-prop Theatre) Teatroya agit-prop, (ji agitatsiya-propaganda ya Russî, dimîne ser propaganda û agitasyon ê (harkirin)) formeka animasyona teatroyê ye. Ji bo ku hişmendiya guhdêr ya li ser rewşa politik an jî civakî kûrtir bike hatiye çêkirin. Ew forme piştî şovreşa Rusya yê, 1917 a, derket holê, û nexasim li Yekîtiya Sovyetan û Elmanya yê di navbera salên 1919 û 1932-33 pêşket.

Form û istikrazên (peyvên ku ji zimanekî din hatine girtin) şanoya agit-prop, wek naveroka wê zû zû digihure. Li gor kevneşopiya çandî, ji yek welatî hetanî welatekî din cudatî hene. Gelek caran "agitator-propagandist" (harker-propagandaker), her çi qas bi awayekî rexneyî be jî, xebatên xwe li ser bingehên wek komediya dell"art, sirk an jî melodrama lidardixin. Ji ber ku populer in, û ji bo naverokên nû şeweyekê amade dikin, şeweyên duhem yên wekî sirk an pantomîm pir biquwet û bandor in. Dema listik yekî zor aloz û bi lehengan ve tijikirî be jî, ew ji xwe re pîlanekî hêsan dibijêre ku digihe encamê. The Lehrstück (listikekî hinker ku formeka agit-prop ê ya "sofistike" ye, berhemên Brecht mînakên wê yên herî baş in) jî bi heman prensîpên hêsan ve rû bi rû dimîne. "Rojnameya zindî" nuçeyan bi awayekî rexnegirî pêşkeşdike, û kirde yê hereketê derdixe ser sehnê. "Revûyekî" politik, ku bi kêm hejmarên dramatîzekirî û "flaşên nû" pêkhatî, gelek caran dibe xet a listika agit-prop. Komeke çirokbêj an jî stranbêjan tîn cem hev, û slogan û dersên politik telkîn dikin. Dema agit-prop tê sirûşkirin an jî hereketên avant-garde (Futurîzm,

konstruktîvîzm) sirûş dike huner jî dikeve nav listikê. Herwiha demên ku agit-prop artistên mîna Mayakovsky, Meyerhold, Wolf, Brecht, Piscator mobilîze dike jî huner dikeve nav listikê. (Bnr. Teatroya Dîdaktîk, Listîka Hinker, Teatroya Politik)

**Teatroya Aristotelyen:** (Elm. Aristotelisches Theater; Fr. Theatre Aristotelicien; Îng. Aristotelian Theatre) Brecht, wê terîma xwe ji bo teatroyên ji aliyê Schiller (1759-1805) û Goethe (1749-1832) hatî nivîsîn bikaranîye. Piştî salixdana teatroya dramatik a Poetika yên Aristoteles ew terîm çêkir. Brecht ew terîm emelkir, û rexnegiran jî lê devamkirin ku dramaturjiyekî nêzikî Aristotê pêkbinin, dramaturjiyekî ku li ser îluzyon û naskirinê hatî avakirin. Hema bêje bi şanoya dramatik, teatroya îluzyonîst an jî teatroya wekhevîbûnê ve bûye hemwate.

Brecht teatroya xwe ya epîk wek "ne-Aristotelyen" binavkir. Bêguman Aristotê ne dramatisstek bû û hinekî jî pişt serdema zêrîn a teatroya klasik nivîsibû. Divê ew biwêjane qet tu zehmetî û astengîyan nederxînin. Rast an xelet, Brecht teatroya îluzyonê kir teatroya Aristotê, filozofê Yewnanî ku "Poetics" a wî rexneya ya drama yê ya herî serkeftî ye. Bi wî awayî, ji wê tearoyê re "Aristotelyen", û ji ya xwe re jî teatroya "ne-Aristotelyen" dibêje. (Bnr. Teatroya Burjûva, Teatroya Îluzyonîst)

**Teatroya Avant-Garde:** (Elm. Avatgardisticshes Theater, Fr. Théâtre d'avant-garde, Îng. Avant-garde Theater) Biwêja Avant-gardê, di termînolojîya leşkeriyê de wek «tofa pêşiyê» tê bikaranîn, ku ew tofe dûrî sinoran cihên nû kişfdike. Di termînolojîya teatro ye de, ji bo tevgerên teatroyê yên ku dixwazin metodên vegotinê yên kevin yekcarî ji holê rakin, ji bo tevgerên nûjen û ceribanî tê bikaranîn. Tiyatroya avant-garde, wek eksê buhrana manevî ya dû şerê yekem ê cihanê, û herwiha wek tevgerê dijî teatroya burjuva yê destpêkir. Dadaîzm, teatroya surreal, teatroya ekspressionîst, teatroya absurd, teatroya ceribanî û hwd. Ji nav terîma teatroya avant-garde yê de ne. (Bnr. Teatroya Ceribanî)

**Teatroya Ceribanî:** (Elm. Experimentelles Theater, Fr. Theatre Experimental; Îng. Experimental Theatre) Terîma teatroya ceribanî, her wekî termên teatroya avant-garde, laboratory,

hunerên performansê û teatroya nûjen, dijî teatroyên kevneşop, ticarî û sermayedaran e. Ew teatroyên ku armanca wan a sereke qezenc e, û formulên wan jî formulên artistîk ên demê ne. Herwiha dijî teatroya repertuarî jî bû, kû tenê klasik û nivîskarên navdar tê de dilistin. Ji şeweyekê an jî hereketekê dirokî zêdetir, teatroya ceribanî, helwesta artist ya li hemberî kevneşopê, enstituyan û saziyên ticarî bû. (Bnr. Teatroya Avant-garde)

**Teatroya Diyalektîk:** (Elm. Dialektik Theater, Fr. Théâtre d'Dialectique, İng. Dialectic Theater) Brecht, di rizenivîsên bi navê Die Dialektik auf dem Theater (1951-56; di teatroyê de dialektîk) ku di salên xwe yên dawî de nivîsibû, jî bo navê forma teatroya xwe, dewsa teatroya epîk teatroya dialektîk bikaranîbû. Brecht digo ku biwêja teatroya epîk tenê yekî şeweyî bû. Û şeweya teatroya epîk, nedikarî tiştên ku wî dixwest nişan bide, angû "qudret û guherbariya civakê" pêşkeş bike. Her çî qas "teatroya epîk tu caran bê teatroya dialektîk nîne; bêyî hemanên epîk jî, teatroya dialektîk pêknayê" gotibe jî, jî bo bingeha teatroya xwe behsa veguhertinên mezin kiriye. Di şeweya wî ya nû de, hemanên diyalektîk ên teatroya epîk bi hişyarî dê bêne pêşkeşkirin, û bi wî awayî guherbariya dinyayê bi terzeke qerfî bêne nişandan. Dê bibe çavkaniyeka hînbûna diyalektîkê û kêfxweşiyê. Brecht, di Nachtrage zum Kleinen Organon (Pêvekên jî bo Organonê bicuk) ê de behsa wê mijarê dike. (Bnr. Teatroya Epîk)

**Teatroya Didaktîk:** (Elm. Lehrtheater, Fr. Theatre Didactique İng. Didactic Theatre) Armanca teatroya didaktîk hînkirina temaşevan e. Bi wî awayî dixwaze ku temaşevan li ser problemekî bifikire, rewşê baş fam bike an jî helwestekî politîk û sincî bigire.

Ji ber ku teatro tiştên bêwate û bêsebeb pêşkeş nake, em dikarin bêjin ku di hemû teatroyan de aliyekî didaktîk heye. Lê tiştê ku ferqê têxe navbera wan safîti û qeweta peyamê yê. Herwiha teatroya didaktîk dixwaze ku temaşevên biguherîne, û dixwaze ku hunerê li dû sazimana etik û îdeolojîk bicîhbike. Em dikarin bêjin ku teatroya didaktîk etik e (listkên sinc ê yên dawiyên serdemên navînî), politîk e (agît-prop û Lehrstücke ya Brecht), an jî pedagojîk e (thesis drama, parables,

philosophical fables). (Bnr. Teatroya Ajît-prop, Lîstika Hînkir, Teatroya Politîk)

**Teatroya Dokumentar:** (Elm. Dokumentarisches Theater, Dokumentartheater; Fr. Théâtre Dokumantaire, İng. Documentary Theater) Di vê teatroyê de, serboriyeke rast bi xêra belgeyan dibe listik. Mijarên listikên dokumanter, gelek caran li ser buyerên girîng ên siyasî an jî dirokî ne. Armanca wê ew e ku rastiyên veşartî derxe holê, rexnebike, şirovebike, vîzyoneke siyasî bidetê, û forumekê jî bo vîcdan û edaleta raya giştî pêkbîne. Di listikên dokumanter de, dokumanter dibe ku li ser rewş û deqan bête danîn, herwiha dibe ku li ser diyalog û kirinan (eylem) jî bête danîn. Mirov dikare belgewartiya listikên dokumanteran, bi rêya navgînên teatroya ceribanî wek roportaj, film, slayt, wêne, bant û hwd. jî pêkbîne. Listikên dokumanter, yekem car bi teatroyên şoreşker ve ketin nav teatroya politîk (mînak, 1920an li Rusya yê Yevremov; li Almanya yê, dawîya salên 1920an Piscator li Almanya yê). Dema ku Brecht bi Piscator re dixebitî, metodên listikên dokumanter pir bikardani. Nemaze jî di sirgunê de, di listikên jî bo rexnekirina rejîma Hitler de, sudeke zor jî wan rêbazên listikên dokumanter standibû. (Bnr. Teatroya Politîk)

**Teatroya Dramatîk:** (Di hundirê Teatroya Epîk de bnr.)

**Teatroya Epîk:** (Elm. Episches Theater, Fr. Théâtre Épique, İng. Epic Theatre) Teatroya Epîk ya Bertolt Brecht, form û ferasetê teatroyê ku li dijî teatroya dramatîk derxistiye ye. Di dema navbera Şerê Cihanê yê yekem û duyem de pêşve çûye. Ji ber ku li dijî hewlê Aristotelyen, ku heta teatroya dramatîk ya wê demê serdest e, derketiye, wek "forma listika ne-Aristotelyen" hatiye binavkirin. Têkelek ku jî teatroya Çînê, jî formê teatroya şoreşger ya sedsala 19 de ku bi pêşengiya George Büchner hatiye kirin, jî ekspresyonîzma Wedekind û Teatroya Politîk ya Piscator pêk hatiye.

Brecht çir hewcêyî pêşvebûna qaydê vê teatroyê dike di berhema xwe ya sazî Kleines Organon Für Das Theater (1949, Ji Bo Teatroyê Organonê Biçûk) de daxuyani kiriye. Li gorî wî armanca teatroyê ya yekem kêfkirina mirov e. Teatro vê ya her demê, li gorî qaydê jiyana civakiya wê demê kiriye. "Îro êdî em di dewreke wiha ne ku hertişt li aliyê zanyariyê ve tê nişandan;

wek mirovên vê dewra zanyariyê, helwesta me ya ku gerek li hemberî xwezayê û civakê, ji bo kêfkirin û hilberiyê çi be" gotiye Brecht. Ji bo vê helwestê jî bersiv wî ev e ku divê celebeke rexneyî bêkirin.

Helwestekî wiha, çawa li hemberî xwezayê herikandina çemeki ji bo têxe duzenekê, werê jî li hemberî civakê jî, ji bo guhertina wê civakê jî wê bê kirin. Ji bo teşebusek wiha feraseta teatroya dramatik lêk nayê. Çimkî feraseta ji Aristoteles vir de ye berdewam dike û iluzyona avabûna rastiye ku li ser sehnê pêk tê (teatroya iluzyonîzî), ji bo temaşevan bûyeran di listikê jêkrakin û xwe di bi kesên di listikê re wekhev bibe dixebite. Tê armanckirin ku temaşevan, hêsta tirs û janê ku di bûyeran tê ziman, di hundirê xwe bihewîne û ji wan xwe paqij (katharsîs) bike. Li gori Brecht teatroya wiha, struktura civakê (yê li sehnê de tê ditin), nişan dide ku diya ji aliyê civakê ve (temaşevanên salonê bi xwe) kare bê bandorkirin, derdixe holê. Dewsa qaydê teatroya dramatikê ku bingeha xwe ji nerîna cihana qederparêz distîne, dixwaze forma nû, teatroya epîk têxe. Teatroya epîk, teatroyek hînkê e ku fikrek rexneyî avakirî ye û wê di guherandina tîkiliyan di navbera mirovan de jî rol bilîze. Brecht vê armançê di nivîsa xwe ya bi navê Anmerkungen zur Oper Aufstieg und Fall der Stadt Mahagony (1931; Notên li ser Operaya Avabûn û Xerabûna Bajarê Mahagonnyê) de, ferqên di navbera "formê dramatik" û "formê epîk" de rêz dike. Di formê epîk de bûyer, ji dewsa "bê bercestekirin", ji temaşevan re tê "behs kirin". Armanç, ji dewsa xîtabî hestên temaşevan bike û wî/ê têxe bin tesîra herka bûyeran, ji bo temaşevan, mirovên li ser sehnê bi çavê "çavên" binêre û li hemberî tiştê tê pêşkêş kirin bigihêje qeneatekê, ye. Ev jî, tê maneya temaşevanê ji terefi formê dramatik hatiye "tebat" kirin têxe rewşeke "aktîf". Di teatroya dramatik de mirov wek heyînekî ku ji her alî ve berê tê zanîn û guhîrandina wê jî bê îmkân e, tê pêşkêşkirin. Lê teatroya epîk mirov dike wek mijara lêkolînê û mirov di hundirê guherîna wî/ê de dinirxîne. Bi vî hawî jî mirov fehm dike ku dinya kare bê guhertin. Ev jî dibe sebaba guhertina encama pevbestîna listika teatroya epîk. Wek di teatroya epîk de, bûyerên ku li ser sehnê tê berceste kirin ji hev dû nayê afirandin, li pêwendîya her sehneyê ya bi sehneya berî wê û piştî wê tê nayê nerîn û temaşevan di

meraqa encama listikê de nahêle. Herwiha dev ji herka ku bûyer di rêzek bi rêk û pêk de here tê berdan. Bi xêra sehneyên (epîsodan) tek û tek, lê di hundirê xwe giştîyekê di hundirînin, eleqa temaşevan ku bê ser herka bûyeran tê dest xistin. Hêmanên herî girîng ên forma teatroya epîk ku fonksiyona teatroyê ji kokê ve guherandi ye, "efekta biyanîkirinê", "dîrok kirin" û "gestûs" in. Brecht ji bo forma teatroyê ku di dema xwe ya dawî de pêş xistiye, ji dewsa terîma teatroya epîk "teatroya diyalektîk" bi kar aniye. (Bnr. Teatroya Diyalektîk, Efekta Biyanîkirinê, Dîrok Kirin, Gestûs, Wekhevîbûn)

**Teatroya Îluzyonê:** (Elm. Illusionismus, İng. Theatre of Illusion) Teatroya Îluzyonê ku terîmek cara pêşîn Brecht derxistiye holê, bi Teatroya Aristotelyan re jî bi eynê wateyê tê bikaranîn. Di Teatroya Îluzyonê de armanç ew e ku, temaşevan ji ev bûyerên li ser sehneyê ku wek iluzyona di wê demê dijê ne, şiyarbike. Teatroya Îluzyonê, li ser sehneyê, bi bawerîya afirandina iluzyoneke rastiye ava ye. Feraseta Teatroya Îluzyonê ku taybetmendiya bingehîn a teatroya burjûva ya ku di navbera 1750-1910 de ye, weke amrazekî vegotinê yê rêgeza pêşketinê ya burjûvaziyê hate bikaranîn. Li hemberî Teatroya Îluzyonê rêgeza teatroya ne-iluzyon derdikeve; armanca vê rêgezê, bi rîya listikvaniya stîlîze, efektên biyanîkirinê, stran, jest û mîmîkên fişalkirî hwd. li sehneyê iluzyonê rake. Bi vê maneyê, teatroya epîk ya Brechtîyan, bi temamî li hemberî Teatroya Îluzyanê ye û bi hilweşandina "iluzyona" cihana burjûvayê jî, ji bo temaşevan rastiya civakî bibîne dixebite. (Bnr. Teatroya Burjûva, Teatroya Aristotelyan)

**Teatroya Pêşeng:** (Bnr. Teatroya Avant-garde)

**Teatroya Politik:** (Elm. Politisches Theater, Fr. Theatre Politique, İng. Political Theatre) Bi aliyê etimolojî yê ve, her çi teatroya ku lehengan li gorî civata wan dinirxîne teatroyeka politik e. Biwêja teatroya politik, nexasim bi teatroya ajit-prop, teatroya populer, teatroya epîk a Brechtîyan û pişt-Brechtîyan, teatroya dokumanter, teatroya girseyî, û teatroya terapî ya politik a Boal ve tîkildar e.

Ew hemî jî xwedî teoriyekê, xwedî dîtineka felsefî, an jî bawerîyeka civakî ne. Teatroya politik ku dixwaze li gorî

bîrdozekê hişmendiya politik bide(pêşkeşbike), wek terimekê, car a yekem di pirtûka Piscator de (Das politiches Theatre, Teatroya Politik) derbas dibe. (Bnr. Teatroya Ajit-prop, Lîstika Hinker, Teatroya Dîdaktîk)

**Teknika Montajê:** (Elm. Montage, Fr. Montage, İng. Montage) Ev terim di filim (Eisenstein) de pêk tê, lê ji sihan (Piscator, Brecht) de ye ji bo şayesandina formek dramaturjikal tê bi kar anîn. Ev jî tekstê an rêkûpêkên sehneyê di rêzek momentên (wextên) otonom de, da ser hev dū. Di Brecht de, dewsa pêşana tevgerê yekbûyî û sabit, "karekî siruştî û organîk wek bedenekî pêşveçûyî ava dibe", çiroka ku di hundirê yekeyên otonom xera bû ye. Bi têborîna tansiyona dramatik û entegrasyona tevda tevgera ku di hundirê projeyek gelemperî ye, nivîskarê listikê nikare avantajê ewletiya her sehneyekê, ji bo "pengizandina" mijara romanê bistîne û xiyalê wateya tevayî dide. Şêwe û dijayetî dibe prensîbên binyadî yên bingeşîn. (Bnr. Teatroya Politik, Teatroya Epîk)

**Vegotina Epîsodîk:** Di vê terza vegotinê de rêzekê bûyer tîn vegotin. Gelek caran ne tîkildarê yek û du ne. Bûyerên kû di deverên cihê cihê de û di demên muhîm de qewimîne tîn vegotin. Ne pêwîste ku bûyerên di çiroka epîsodîk de bi aliyê sedeman ve girêdayî yek û du bibin. Lîstikên epîk, listikên Shakespeare yên dîrokî, û xebatên Brecht bi aliyê struktur ve epîsodîk in. (Bnr. Teatroya Epîk)

**Wekhevîbûn:** (Elm. Einfühlung, Identification; Fr. Identification; İng. Identification) Bi xêra prosesê iluzyonê temaşevan xwe li cihê lehêng xeyaldike, û bi wî awayî listikvan rasterast dikeve nav hişên temaşevên. Rexneya Brecht ya li ser teatroya wekhevîbûnê zêde zêde radikaltir e: bi lehengekî re wekhevîbûn nîşaneyê kêmasiya rihê rexnegiriyê tê dîtin. Herwiha teatroya wekhevîbûnê, siruştî mirov wek konseptekî bêdawî, li ser rastiyên çînî û dîrokî dibîne. (Bnr. Katarsîs, Teatroya Aristotelyen, Teatroya Epîk)

## Berhemên Bertolt Brecht

### I. Berhemên Ciwantiya Wî:

- Baal - 1918 (Lîstika yekem)
- Gazinên Leşkerê Mirî - 1918
- Daholên bi Şevê - Trommeln In Der Nacht - 1919. (Xelata Kleist - 1922)
- Li Cingala Bajaran - Im Dickicht der Städte - (1921-1924)
- Edwardê Duyem - Leben Edouards Des Zweiten Von England - 1924 (ligel Lion Feuchtwanger)
- Mirov Mirov e - Mann Ist Mann - 1926

### II. Berhemên Opera, Operaya Qerfok, Muzîqî û Dîdaktîk:

- Mahagonny - Paşê navê Mahagonnya Piçûk lêkiriye - 1927
- Operaya Sêqurîşa - Die Dreigroschenoper - 1928
- Avabûn û Xerabûna Bajarê Mahagonny - Aufstieg und Fall der Stadt Mahagonny - (1927- 1929)
- Lîstikên wî yên Dîdaktîk yên Piçûk
- Firîna Lindberghê - Lindbergh Flug - 1929. (Paşê navê Firîna ji ser Okyanûsê lêkiriye)
- Girîngiya Peymanê - Die Vom Einverständnis - 1929
- Yê Ku Got Erê, Yê Ku Got Na - Der Jasager und der Neinsager - (1929-1930)
- Lîstika Didaktîk ya Baden Baden - Das Badener Lehrstücke - 1929
- Tedbîr - Die Maßnahme - 1930
- Qeyde û Ji Qeydê Der - Die Ausnahme und die Regel - 1940
- Serên Girover û Serên Tûj - Die Rundköpfe und die Spitzköpfe - 1932
- Berhemên bi Taybetî ji bo Karkera
- Keça Mezbeheyên Pîroz Jeanne - Die Heilige Johanna Der Schlachthöfe - (1929-1931)
- Dayê - Die Mutter - (1929-1931)
- Heft Gunehên Sereke yên Burjûvayêpiçûk - Die Sieben Todsunden Der Kleinbürger - 1933
- Horasyanan û Kurasyanan - Die Horatier und Kuriatier - 1934



**III. Berhemên li ser Şer:**

- Tifingên Seqora Carrar - Die Gewehre der Frau Carrar - 1937
- Tirs û Şerpezehiya Reichê Sêyem - Furch und Elend des Dritten Reichs - (1935-1938)
- Mehkemeya Lucullus - Die Verurteilung des Lukullus - (1938-1939). (Piyesa Radyofonik)
- Dayika Bêtirs û Zarokên Wê - Mutter Courage und Ihre Kinder - 1938. [Ji romanên Grimmshausen Simplicius Simplicissimus (1668) û La Vagabonde Courage (1670) peyxam girtiye û nivîsiye.]
- Bilindbûna Bergirbar ya Arturo Ui - Der Aufhaltsame Aufstieg des Arturo Ui - 1941. (Lîstik di dilsaxiya Brecht de, ne hatiye weşandin ne ji hatiye lîstin.)
- Schweyk di Şerê Duyemîn ê Cihanê de - Schweyk im Zweiten Weltkrieg - (1941-1944) (Ji romana Jaroslav Hasek peyxam girtiye û nivîsiye. Eynî romanê bi Max Brod re ji bo Teatroya Piscator şîrove kiribû.)
- Xiyalên Simone Machard - Die Gesichte der Simone Machard - (1935 - 1945). (Bi Feuchtwanger re dinivîsîne.)
- Rojên Komun - Die Tage Der Commune - (1958 Berlîn, 1959 Zurîh)

**IV. Yên ku di Berliner Ensembleyê de Tetbîq Kiriye:**

- Jiyana Galileo - Das Leben des Galilei - (1937 - 1939). [Ve berhemê, dema kû 1947 a de li Emerîkayê tê lîstin, diguhêre û ji nû ve dinivîse. Paşê, berî mirina xwe di provayên Berliner Ensembleyê de dîsa tişkî hindik diguherîne. (1955-56)]
- Puntilla Beg û Xulamê Wî Matti - Herr Puntilla und sein Knecht Matti - 1940. (Ji çîrokên Hella Wualijoki yê Fîni peyxam girtiye û nivîsiye)
- Mirovê Baş ê Sezuanê - Der gute Mensch von Sezuan - (1938-42)
- Çixêza Tebeşîrê ya Qefqasa - Der Kaukasische Kreidkreis - (1943-45). (Ji berhemên Li Hsing Tao ku lêanîna Elmanî hatiye kirin, peyxam girtiye û nivîsiye.)
- Axafînên Surgunê - Dialogues d'Exilê

**V. Lîstikên Kû Wî Adapte Kirine:**

- Fêrmendê Seraya - Der Hofmeister - Ji berhema Lenz, Précepteur - 1944

- Antigone - Die Antigone des Sophokles - 1947. ( Ji wergera Hölderlin)
- Coriolanus - (Shakespeare - Brecht)
- Don Juan - (Molière - Brecht)
- Li Rouenê Doza Jeanne D'Arc - Der Process Der Jeanne D'Arc Der Rouen - (A. Seghers - Brecht)
- Leşkerê Ecemî - The Recruiting Officier - (Farguhar - Brecht)

**VI. Pexşanên Wî:**

- Pênc Zehmetiyên Nivîsandina Rastiyê
- Nivîsên Teatroyê - Schriften Zum Theater
- Çîrokên Salnamê
- Ji Bo Teatroyê Organonê Piçûk

**VII. Roman:**

- Romana Sêquruşa - 1934
- Karên Mîrza Julius Caesar - Die Gaschaefte Des Herrn Julius Caesar

**VIII. Helbest:**

- Duayên Bêrikê - Taschenpostille - 1926
- Duayên Malê - Hauspostille - 1927
- Stranên Operaya Sêquruşa - 1932
- Stran, Helbest, Koro - 1934
- Helbestên Svendborg - 1939
- Sed Helbest - 1950. (Helbestên di navbera 1918-1950 de nivîsiye.)
- Helbest û Stran - 1956

**Çavkanî:**

*Ansiklopediya Britanika*. Britannica Inc.

Brecht, Bertolt. Di hundirê *Hunerê Lîstikê û Dekor* de 'Derheqê Gestûsê'. Turkiya wê: Kamuran Şipal. Weşana Cem. 1994. Stenbol.

Brecht, Bertolt. *Teatroya Ceribanî*. Di hundirê, *Du Lîstik: Gîrîngiya Peymanê / Daweta Burjûwayabiçûk* de 'Teatroya Ceribanî' û 'Berhemên Brecht'. Berhevkar û yê wergerandi ye Turkî: Kaya Oztaş. Weşana Dost Kitabevi. Çapa Duyem. Kewçer 1981. Stenbol.

Brecht, Bertolt. Di hundirê *Teatroya Epîk* de 'Teatroya Ceribanî'. Turkiya wê: Kamuran Şipal. Weşana Cem. 1997. Stenbol.

Brecht, Bertolt. *On the Experimental Theatre*. The Tulane Drama Review, Hejmar. 6, No. 1, Îlon 1961.

Çalışlar, Aziz. *Ansiklopediya Teatroyê. Wezaretê Çandê ya Komara Turkî, Rêza Huner/Teatro. Çapxaneyê Saziya Dîroka Turk*. 1995. Enqere.

*Encyclopedia Britannica*. www.britannica.com

*International Brecht Society*. German.Iss.wisc.edu/brecht (Ji bo Kronolojiya Brecht)

Pavis, Patrice. *Dictionary of Theater, Terms, Concepts and Analysis*. University of Toronto Press. 1998. Keneda.

**ŞEREF-NAME:**

**DEWLET-AVAKIRIN, DERELEGÎTÎ Û  
DESTHELATÎ<sup>1</sup>**

**Amir Hassanpour**

**Profesor, Beşa Medeniyetên Rojhilata Navîn & Nêzîk,  
Zanîngeha Toronto**

Werger ji Îngilîzi: Ergin Öpengin

Civaka kurd bi gelemperî, wek komeke eşîrkî, koçer û nebajarî hatiye pêşkêşkirin. Têgîha "eşîr"(hoz), di bikaranînên xwe yên gelemperî û heta yên taybetî de jî (antropolojîk), nişana seretayîbûnê (primitîvîzmê) ye, bi taybetî jî di pêşketinên politik û civakî yên serdema berî-dewletê ya hişmendîya veguherînê (evolutionary sense) de. Vê dîtinê (ferzkirin), li gel hin nişaneyên negatîf ên dîtir<sup>2</sup>, xizmeta pişêvkeran(assimilasyonist) û, politikayên qirkirinê yên dewletên ku li ser kurdan hukimdar in, kiriye. Mesela, dema Mandatiya Îngilistanê ya li ser Iraqê (1920-32), Îngilistanê daxwazên kurdan ên serxwebûnê bi hinceta ku kurd pêkhatineke eşîrkî ne nepejirandibû. Lewre, nûnerê hikûmeta Îngilistanê ku piştgiriya tevlêkirina kurdan a nav

<sup>1</sup> Tirmeh 2001'ê hatiye nivîsîn

<sup>2</sup> Ji bo nîrxandîneka li ser konseptê "eşîr", bnr. Southall (1996). Di xebateke pêşdetir de Southall (1968) li ser 'civaka bê dewlet' xebitî.

Iraqê dikir, ji Komîsyona Mandayên Timî ya Cemiyeta Neteweyan (Civata Neteweyan) re wiha gotibû:

Her çend aşkera be jî ku wan gelek taybetiyên pir girîng hene, kurdên Iraqê taybetiya hevgirtina politik nîn e ku ew, ji bo serkeftina hikûmeta serbixwe jênager e. Organizasyon û xuyangên (outlook) wan serdanpê eşîrkî ne. Ew ji kevneşopiyên xweserî û saziyên rêveberiya xweser bêpar in. Awayê jiyana wan prîmitîf e û pîrraniya wan nexwendî û ne rewşenbîr in, ji desthelatiyê xeyidî, ji hişmendiya disîplîn û berpirsyariyê bêpar in... (Cemiyeta Neteweyan 1930: 186)

Mandelkirina (redkirina) şiyana kurdan a dewlet avakirinê ji demên berî-moderniyê ve dest pê dike. Bo nimûne, di nivê sedsala şanzdehan de, rayedarekî (official) Osmaniyan ji sultanê xwe re diyar kiribû ku di kurdan de şarezatiya rêveberiyê nîn e:

Bi rastî, kurdeke bed (xerab) ku, em ferz bikin, bi mîrxasiya xwe ya wek-Tahamtan navdar e û, stûnê qesra cesaretê ye, tu caran lê nayê ku li ser berika (kîlima) hukimdariyê birûne û, dema du partiyên dijî-hev hatin cem wî, binase ka rastî çî ye xelet çî. Heke ew, bikarin desteke cilên leşkeriyê, sîleh û hespekê bi dest bixin, ev baştirîn şans e... (Mustafa Alî 1979: 63).

Bi rastî, mandelkirina Mustafa ya şiyana kurdan a hikûmkirinê, heta radeyekê ji rastiya dewletbûna (statehood) kurdan tê. Pêşdetir, di daxuyaniya ku ji *Şiretên ji bo Sultan* a wî hatiye wergirtin de (li 1581'ê de hatiye nivîsîn), wî gazinde dikirin ku kurd bi qasî Hukimdarên Haşimî yên Erebiştanê bi hêz bûne.

Wî digot:

Karakterê kurdan, ji rik û serhişkiyê wêdetir ne tu tişt e... Ji ber vê hindê ye ku sultanên berê, tu caran payeya *beglerbegiyê* ne dida kurdan ne jî tirkan (Turkmen), û tu kes ji wan layiqî payeya *begitiyê* jî nedihat dîtin. Wan begîti dida kurê *begekê* ku bav û bapîrên wî çend nifşan ew paye wergirtibû. Lê di dema me de, ferqên çînî yên wîsa, bi tevahî hatine hêlan. tirk û kurd, heke xwedanê

sikkeyên ziv û zêr bin, ji qehremanên Haşimîyan jî bi qîmettir in (*Ibid.*).

Ji wan gotinan aşkera ye ku dewleta Osmaniyan, di rewşeke wisa de nebû ku rasterast desthilatiya xwe li ser Kurdistanê ferz bike. Û mecbûr bû ku hebûna hürde-dewletên kurdan ên otonom yan niv-serbixwe qebûl bike. Bi heman rengî, Dewleta Safewî jî nekaribû desthilatiya xwe rasterast li ser Kurdistanê pêk bîne.

### Pergala Mîrîtiyan

Xurtbûna hêza kurdan a politik a di sedsala panzdeh û şanzdehan de, di Şerefnameyê de gelek bi hûrbîni hatiye belgekirin. Nivîskar, Şeref Xan, mîrê mîrnişîniya xurt a Bedlîsê bû. Wî bi rewşa politikî ya li Rojavayê Asyayê dizanî; wê devera ku dewletên Osmanî û Safewî her gav ji bo bidestxistina kontrola deverên Kafkasya, Azerbeycan, Kurdistan û Tengava Îranê li serê pevçûn dikirin û wêrankarî pêk dianîn. Bavê wî piştî Safewîyan girtibû, lê belê paşê wî rex guhart û vegeerî ku mîrîtiya xwe ya Bedlîsê bi rê ve bibe, ku li wê derê yekem berhema dîroka kurdan nivîsand. Wextê ku li dîwana Safewîyan bû, Şeref Xanî, der heqê strûktura îdarî (administrative structure) ya dewleta Îranê de, tecrûbeyên ji serçaviyê bi dest xistibûn.

Nivîskar, armancên xwe yên di nivîsîna Şerefnameyê diyar dike. Ji ber ku dîroknasan "di tu wext û serdeman de rewşa hukimdarên (volat)<sup>3</sup> Kurdistanê û mercên wan venegotibûn..." wî biryar da ku "kitabekê der heqê teswîra mercên wan û berhevokeka der heqê helwestên wan de binivîse...bi wî awayî çiroka malbatên gewre yên Kurdistanê dê di bin xêliya raz û

<sup>3</sup> Divêt em li ser lêkolînên *Şerefname*, *Mem û Zîn* û çavkaniyên din ên ku berî sedsala bîstan hatine nivîsîn, gelek hişyar bin; da ku wateyên nû li tégihên wan zêde nekin, wateyên ku di navbera dawîya sedsala nozdehan û serê sedsala bîstan de, bi temasa li gel tégihên modern ên Rojava, hatine bi dest xistin. Mînak, Şeref Xan, ji bo vegotina (niqaşkirina) pêvajoya hikûmkirina li mîrîtiyan û dewletên Osmanî û Safewîyan, repertûvareka berfireh a tégihan bi kar tîne (mînak: saltanat, hikûmet, amirat, farmanfarm, dowlat, welayet, hwd.). Ji ber kêmasiya çavkaniyên rêk û pêk, min nekarî xwe ji xeletiyên ku di encama modernîzekirina wateyên termînolojîyên kurd û farisan ên sedsala şanzdeh û hevdehan, xelas bikim. Ji bo xwendineke kurt li ser wateyên hin ji wan terman ku vediguherin, li Lewînsteyn (1995) binêre.

redê de nemaya..." (Şeref Xan 1964: 9). Her çend wî du sê rûpel ji bo helwest û rewîştên (karakter) kurdan tarxan kiribin jî, pirtûk li ser dîroka malbat û mîritiyên kurdan, û têkiliyên wan ên bi dewletên Îran û Osmanîyan re hûr dibe. Şeref Xanî, hewl da ku îsbat bike ku kurd milletekî xwedanê kevneşopiya hikûmkirinê ye. Wî, xebata xwe wek "**Çîroka Hikûmdarên (hokkam) Kurdistanê**" bi nav kir.

Di tevahiya kitabê de, nivîskarî hewl daye ku behsa formasyon (pêkhatina) û dîroka mîritiyên kurdan bike. Tiştê herî balkêş rêza beşan e (chapter), ku ne li gorî cihê mîritiyên, lê belê, li gorî asta desthilatiya wan hatine rêz kirin. Lewre, çar beşên (sahife) ewil ên pirtûkê li ser wan mîritiyên e ku "alên sultaniyê (şahîti) bilind kirine û dîroknasan ew wek sultan dîtine" (rp. 36). Beşa duyem der heqê "hikûmdarên mezin ên Kurdistanê de ye ku her çend rasterast dewaya sultaniyê û serketinê (ascension) nekiribin jî, dîsa, carinan li ser navê xwe dirav lê dane û xutbe dane xwendin" (rp. 117). Beşa sêyem der heqê "mîr û hikûmdarên (omar, hokkam) din ên Kurdistanê" de ye (rp.213), û beşa dawî (dûmahikê) jî der heqê hikûmdarên Bedlîsê ye (rp. 439).

Nivîskar, têgiha "hukmê serbixwe", gelek caran bi kar tîne (*hokumat be esteqlal* yan jî guhartoyên wê, mn., rp. 118, 119, 121, 169, 193, 558), nexasim jî di teswîra cureyê duyem ê hikûmdarên paşmakdar (hereditary) de bi berfirehî bi kar tîne. Krîtera serxwebûnê, dirav lê dan, xwendina xutbeyê li ser navê hukimdarî, mn. Roja îni merasima dînî (mn., rp. 495), û "bi ya tu sultanekî nekirin (guh nedana tu sultanekê)" (rp. 486) bûn. Wî, bi pesndanî der barê serkeftinên mîritiyên ên di rêveberiyê (*hokumat*) de nivîsî. Mesela, wî "nûjeniyên di rêveberiyê de" yê hikûmdarekî mîritiya Baban pîroz kir; her wiha, meyila wî ya serweriyê (hukimdarîyê) û firehkirina erdê mîritiyê (*orûc va xorûc*) jî, wek merhaleyeka berzîtir a di warê hikûmkirinê de nîrxand (rp.363).

Şerefname di dawîya sedsala şanzdehan hate nivîsîn, wextê ku pergala mîritiyên şax vedida (geş dibû). Wê demê, bi qasî çil mîritiyên biçûk û mezin li seranserê Kurdistanê hukim dikir. Pergala îdarî ya hûrde-dewletan, mîna pergala dewletên mezintir ên deverê bûn, nexasim jî împaratoriya Osmanîyan (Bruinessen 1992: 161-75).

### Nîqaşa li ser Sentralîzasyona (Navendîkirin) Hêza Dewletî ya Kurdan

Di lêkolîna li ser "meseleya peydabûna (derketina) dewleta Osmanîyan" de, dîroknasê Tirk, Halîl İnalçık, dibêje (1980: 71): "Çawa mîritiyêke biçûk a tixûbî li ser sînore Selçûk-Bizansê bi pêş ket, û bû yek ji xurtirîn împaratoriyan serdema modern, hê jî dîroknasan şaş dibe." Pirseke bi qasî wê şaşker (ecêb) jî: Çima, tu ji ew çend mîritiyên kurdan -ku hinek ji wan bi hêz bûn- nebûne dewleteke navendî an jî bihêz?

Şeref Xan, hemdemiyên wî û yek sedsal paşî, şairê kurd Ehmedê Xanî, meseleya sentralîzasyona hêza kurdan a dewletbûyîne nîqaş kiribû. Şeref Xanî, bal kêşa ser erdê kurdan ê berfireh ku "ji dûryanên bilind ên rojhilat dirêj dibe bo dawîya deverên rojava" (rp. 25), lê gazinde kirin ku ew "bi ya êk û du nakin, nadin dû hev û pêk nayên (hev û du nagirin)" (rp. 31). Di sedema dûberî û dubendiya di nav kurdan de, wî jî çirokeke dîroknasê hemdemê xwe bawer dikir, Mewlana Saad al-Ddîn, nivîskarê Tajal Tawarûxê dîroknas digot ku Muhammed Pêxember nîfir li kurdan kirine da ku tu caran hev negirin. "Ji wê rojê ve, wî qewmî (*tayefeh*) dewleteke mezin û saltanateke gewre ava nekiriye," jî bilî çend mîritiyên ku dewaya saltanatiyê kirî û di *Şerefnameyê* de behs li wan hatiye kirin (rp.33). Her wiha Şeref Xanî nişe da (got) ku "hikûmdarî (*farmanfara.*), di nav kurdan de ne bi tesîr e." (rp. 32).

Xanî, ku di 1695'an nivîsî, sedsalek piştî *Şerefnameyê*, bi peymanê 1639'an a tixûbê Osmanî- Safewîyan, parçekirina Kurdistanê tecrûbe kiribû; her wiha li dû wê jî, tepeserkirinên Osmanîyan ên li ser mîritiyên kurdan ên li bakûrê Kurdistanê jî dîtibûn.<sup>4</sup> Wî rasterast behsa meseleya yekitiya kurdan, bi rengê dewleteke merkezi dikir. Her çend sentralîzasyon ji bo gelek armanc û berjewendîyan baş be jî, bi ya Xanî, yekane rêk bû ji bo ku kurd ji bin destên dewletên Osmanî û Îranî azad bibin.

<sup>4</sup> Peymana tixûb a 1639'an, derfet da Osmanîyan ku cihê xwe li Rojavayê Kurdistanê qayim bikin. Li gorî Minorsky (1927: 1146), "Piştî ku êdî tu sebeb nemabûn ku ji farisan bitirsîn, tirka bi awayekî sistematîk dest bi sentralîzasyonê kir". Ji 1650'î heta 1730'î gelek ji mîritiyên otonom ên li herêma Amed-Wanê hatibûn tepeserkirin (Jwaideh 1960: 39), û ev pêvajoyê di nîveka sedsala nozdehan temam bû.

Xanî, li ser malwêraniya kurdan a ji ber şerên Osmanî-Safeviyan, mehkûmî û mehrûmî (rp. 217),<sup>5</sup> şikestin (mexlûbî) û paşkoyîtiya (subordination-mûtî) kurdan a ji destê wan du hêzan nivîsî (cc.216-217). Wî, desthilatiya Osmanî û Îraniyan biçûk dît û Kurdistana di bin baladestiya Osamaniyan şiband "kavilên di destê baz de" (c. 206);<sup>6</sup> li gorî wî tebîiyeta bo Osmanî û Farisan (*Tirk û Tacik*) "şerm" bû ("ar, cc. 207, 209); ew her du hêz "rezil" bûn (le..îm, c. 205).

Di sedsala hevdehan de li Asyaya Rojava, desthilatî ne li gorî heqiyê, lê belê li gorî hêzê dihat dabeşkirin. Çarenûsa hin gel an kesan baladestî (hukimkirin), û çarenûsa yên di jî bindestî bû. Ev hiyerarşî, di şirêta Mustafa Alî ya bo Sultanen de gelekî bi aşkerayî hatiye ravekirin, ku ev şîret li jor derbas dibe. Li dijî wê angaştê, Xanî li ser wê angaştê sekinî a ku dibêje kurd ji gelên baladest (ereb, faris û tirk) nizimtir in; angaştê ku dibêje kurd "ne-medenî, bê esl û bê bingeh in" (c. 240); û wan "hezkerin nekiriye armanca xwe ya sereke" (c. 242); û dibêje ku ew "ne xwazgîn in (talib) ne jî xwestî (metlûb)...ne hezker in ne jî hezkirî" (cc.240- 244). Wî, li dijî wiya got ku kurd "ne bêkermal in", lê belê, "êtîm û bedbext in" (c. 245); ew ne "tev nezana û nexwendî ne, lê belê xemgîn û bêxwedan in" (c. 246). Zimanê kurdî hêj sewa bû, her wiha zimanekî ku dikemilî (mezin dibû), û dê biba hevsengê zimanê popûler ên mîna farisiyê. (cc. 338, 342, 343).

Xanî, pesnê mirên kurdan da, ji bo comerdiya wan ew şibandin Hatem (*bezlê Hatem*), bo şerkeriyê ew şibandin Rostem (*Rezmê Rostem*), ciwamêrî, jîrîtî (*hîmnet*), camêritî (sexawet), mîrinî, û celadeta wan...(cc. 219, 225). Her wiha mirên kurdan, bê ittifaq û duberî bûn, û guh nedidan hev û du (bê temerrûd û şîraq)...(c.230). Sebebê duberiyên navbeyna wan, xîret, zêde jîrîtî û wêrekiya wan bû ku nedihêla ew "mînneta tu kesî bikêşin" (cc.228-229).

Lewre, li gorî Xanî, mirovên asayî, wek şair û feqîr ne, lê belê hakim û mirên kurdan bûn mesûlên wê paşkoyîtiya (bindestî)

<sup>5</sup> Tîpên c û cc ji bo kurteya "couplet-rêz" û "couplets-rêz (pirjimar)" hatine bikaranîn. Li dû wan jî hejmarên ji sê reqeman pêkhatî hene, ku ew jî hejmara rêzê (rêzan) a di çapa Mem û Zîn a Ehmedê Xanî ya ji aliyê Rûdenko hatiye çêkirin de nîşana dide (Khanî 1962).

<sup>6</sup> Di folklorê kurdan de, baz nîşana (elameta) wêrankariya madî û manewî ye.

kurdan a demdirêj, çimkî wan dil lê nebû di bin ala padişahêki kurd de bibin yek.

Lewre kurd, "yêtim" ên "bê xwedan" bûn; tenê heke xwedanekî ew biparastana, yêtim dê bigihîştana (mezin bibûna) (cc.245-247). "Heke me jî heba Padişahêk, heke Xweda ew layiqî tacekê bidîta, heke textek ji bo wî bihata danîn, qedrê me dê bihata girtin" (cc. 201-203).

Ne Şeref Xan ne jî Xanî, der barê hêza politik de nebûne xwediyê helwesteke teorîk an jî felsefî. Her wiha, fikrên (ferzkirinên) Şeref Xanî yên li ser desthilatiyê, di tevahiya pirtûka wî de serdest in. Serdaran ji payeya rajortirîn heye, desthilatî ji bavî derbasî kurî dibe, ew divê baladestiyê bike li ser bendeyên xwe, bende (subject-tebaa) jî mecbûr in her gav guh bidin hiyerarşiya serdarî. (Vasil"eva 1976: 27-34, 349-50).

Analîza Xanî ya rewşa politik a Kurdistanê, di beşa seretayî ya romansa çirokî û helbestî, Mem û Zînê de hatiye nivîsîn. Em dikarin baş jê derêxin ka wî tekiliya navbera kurdan û padişahê wan ê xeyalî, çawa pêşkeş kiriye (depicted). Her çend Xanî, mîr û zimanê kurdî pesin kirine jî (wêrek, zîrek, merd hwd., cc. 226-227, 265-273), wî, kurd wek yêtim nîşan dane: ew, "bê berevani" bûn (*bê penah*, c. 270), "mehkûm," "mehrûm" "mexlûb(şikestî) û paşkoyî," "tawanbar (doomed) û bi tevahî hejar" bûn (c. 207), û ji ber hukmê Îranî û Osmaniyan û parçebûna Kurdistanê ji destê wan (îranî-osmanî), "xwîna kurdan cemidî" bû (cc. 224-225). Bi tenê padişahêki dikarî wê rewşê berovajî biket.

Padişahêki kurdan (padşah, cc. 196, 202) bi tesewwûrên monarşiyê yên pre-modern re hevaheng hatibû teswîrkirin, wek "siwaneka dinyayê" (*cihanpenah*, c. 196), serfirazek, sahibkeremek (c. 199). Li gorî tesewwûra Xanî, heke padişahêki kurdan "tacek bi dest bixistaya, teqez dê qedrê me jî bihata girtin; wî dê em -yêtim- xwedan bikirana, û dê em ji destên rezilan xelas bikirana; wan tirkan dê em mexlûb nekirana, em ê nebûna wêran di nûv destên baz(an) de" (cc. 203-206). Padişahêki dê piştê "*qelem*" û "*hunera*" me rast bikira, dê "birîna me derman bikira", û dê "ilmê me bi pêş bixista" (cc. 197-198). Li gorî Xanî, kurd ne tenê dê ji zilma dagirkeran azad bibûna, "heke me heba ittifaqek, me hemiyana guh bidaya yekî, tirk û ereb û faris hemî dê bibûna xulamên

me; me dê dîn û dewleta xwe rêk û pêk bikira (perfection), me dê ilm û zanatî (hikmet) bi dest bixista... (cc. 231-233). Xanî, ji bo bipêşxistina ziman û edebiyata kurdî, li ser girîngiya pêşengiya padişahêkî rawestayê (cc. 247-252, 270). **Qralek çawa dikare desthatiyê bi dest bixe?** Wî "mîr û rêveberên" kurdan hişyar kirin û daye zanîn ku berpirsên malwêraniya kurdan ew in û wiha pê de çûye "her kê biwêraya şûrî bigire nav destên xwe yên zîrek, dê hukimdariya wê dinyayê bi dest bixista" (cc. 210-211). Wî, piştê diyar kiriye ku دنیا, hem bi şûr, û hem jî bi ihsanê (xêrxaziyê) mimkîn e bête dagirkirin (c. 215).

Li dijî fikrên Şeref Xan û Xanî, dubendiya di nav mîrîtiyan de, bi karaktera kurdan an jî bi xwî û xisletên mîrên wan nayê ravekirin. Di destpêka feodalîzmê de, parçekirina hêza politik û bi wan hêzan dewletên bicûk avakirin, li her derê meyleke serdest bû. Dema ku pêkanîna sentralîzasyonê zehmet bû, di avakirina dewletan de (state formation) dewletên feodal, meyleke gelemperî bû. Xanî, bi xwe, daxwaza rakirina mîrîtiyan nedikir. Wisa diyar e ku sentralîzasyonê mitlêq a desthilatiyê ku bi hatina kapitalîzmê re pêkan bû, di civaka feodal a sedsala şanzdehan de nedihate tesewwûrkirin. Monarşiya kurdan a ku Xanî difikirî jî, dê desthilatî di navbera padişah û mîran de parve bikira.

Heke parçekirin, modaya "xwezayî" ya pergala politik a feodal be, sentralîzasyon jî tijî nerihetî, têkoşîn, têkçûn yan jî vekişîn e. Li Çîna feodal, mesela, mîrîti bi qasî heşt sedsalan hebûn, berî ku yekem dewleta merkezi di bin binemala Çîn de li 221ê B.Z. bête avakirin. Ev yekkirina ewil, zêdeyî bi şer pêk hat, û dû re jî car caran merhaleyên jêk cudabûn û yekgirtinê hatin. Dubendiya navbera parçekirin û sentralîzasyonê, du hezar salan zêdetir di qonaxên politik û entellektuelî yên Çînê de bi tesîr bû, û her wiha di Şoreşa Çandî de jî (Yi-liang 1974; Hsiao 1975; Finer 1997: 473).

Li Ewropayê jî, merhaleya sentralîzasyonê giro bû, bi kêşe û bi kêşmekêş bû.<sup>7</sup> Li Fransa û Îngilistanê, têkoşîna ji bo sentralîzasyonê ji sedsala sêzdehan heta dûmahîka sedsala

<sup>7</sup> Bnr. Mn., Cherepnin û Pashuto (1978) li ser sentralîzasyonê dewleta feodal a Rûsyayê û lêkolîneke hevrûyî (comparative) a pêşketinê bi wî rengî li dewletên din.

panzdehan dewam kir. Li Rûsyayê, merhale ji dûmahîka sedsala panzdehan heta serê sedsala şanzdehan dewam kir.

### **Kêşeya Desthilatiyê<sup>8</sup>**

Ji destpêka desthilatbûna xwe pê ve, mîrîtiyên kurd têdikoşîn da ku erdê wan ji aliyê binemalên Turkmen ên niştecî (Qara Qoyunlu û Aq Qoyunlu) ve neyên dagirkirin, û piştê jî, ji aliyê dewletên Osmanî û Safewî ve. Di encama wê hindê de, şerên navxweyî, ku di hemî pergalên mîrîtiyan de pêk tên, bi şerên derveyî ên bênavber ve hatin temam kirin (du qat zêdetir bûn). Ji bo ku otonomiya xwe biparêzin, mîrîtiyan wisa hereket dikir ku her du împaratoriyan jî ji xwe re bi kar binin û di heman demê de ji aliyê wan (du împaratorî) ve dihatin bikaranîn. Ji ber vê hindê, mîrîti, di şerên navbera wan du hêzan de bûn parçeyekî daîmî. Di vê rewşê de, taybetî ji dema ku binemalên Turkmenan hêz bi dest xist, heta ku di sedsala nozdehan de mîrîtiyên dawîn hatin hilweşandin, şerêkî wêranker li ser Kurdistanê hate meşandin. Şerên bêrawest, ji kurdan û welatê wan re wêraniyeke mezin li dû xwe hêla. Bi wan mercan, ecêb e ku wan çawa xwe ji komkujiyên çar sedsalan, bi destê zorê koçberkirinên hemî xelkê (girseyî), rûxandinên (wêrankirin) gund û navçeyan, wêrankirina ekonomiya gund û bajarî, xela, û nexweşiyên xelas kirine. Tesîra wê rewşê ya li ser bipêşketina civaka kurdan a di warê ekonomî û civakî de, hêj nehatiye vekolan, her wiha encamên politik baştir tên zanîn.

Nivîsîna Şerefnamê û xebata Ehemedê Xanî, qet nebe di navbera rewşenbîr û rêveberan de hişyarbûna politik nîşan dide, der heqê pozîsyona kurdan a di dîrok û politikaya wê demê de. Şeref Xan mîr(ek) bû, û wî, dîrok bi perspektîfa çîna

<sup>8</sup> Wek konseptêke hevrikî(contested), li gorî Falk (1993: 851), "Dema ku mijar desthilatî be, cihê nêtariyê(neutral) pir kêmbê". Jê wêdetir, di "rih û veguherînê" de, "desthelatî konseptêke Rojavayî ye, û heta vê sedsalê deverên din bi kar nedianî. (Her wiha hin cureyên ne-Rojavayî jî hene.)" Wek "netewee", desthilatî jî konseptêke nûjen e ku ji aliyê Hobbes, Locke, Rousseau, û yên din ve cuda cuda hatiye bikaranîn. Wekî ku di vê meqaleyê de hatiye bikaranîn, ev ne bi wateya nûjen, bi rêya hêzê li "netewee" an "gel"ekî hukimkirin e, lê belê, di çarçoveya pergala feodal de, dewletek çiqas dikare bac û xizmeta leşkeriyê di deverên bin kontrola xwe de wergire.

feodal a rêveber a Kurdistanê nivîsibû (Vasileva 1976: 27-34, 349-50). Her wiha (in contrast), Xanî, bi gotina xwe, ji feqîr û torevanan bû (c. 210), çerçî bû (*pilewer*) ne esilzadeyek (*gewherî*), yekî xudriste bû ne perwerî û, kûhî (çiyayî) û kenarî bû (cc. 355-356).

Her wiha, ji aliyê politik ideolojîk ve, em ji Krikavova bibêjin (1974: 103), ew "berdevkê xwendî û, çîna feodal a niştimanperweran" bû. Wextê ku li dijî desthilatiya Osmanî û Safewîyan têdikoşî, Xanî, azadiya kurdan, di bin hukmê padşahiyeke de yekbûna mîrîtiyan de, didît. Ji rewşa dîrokî ya serdema wî diyar e ku, wî nedikarî di nav çînen civakî yên din de li xwedanê desthilatiyê bigere, wek gundiyan gundên belavela û, kême-xelkê hunermend û bazirgan ên qezayên Kurdistanê.

Dewleta feodal, her çend gelek cureyên wê hem li Rojhelat û hem li Rojava hebin jî, di bikaranîna hêzê de aliyekî gerdûnî yê girîng heye. Lêkolînerên mijarê, bi piranî hemfîkr in ku "feodalîzm li ser hîmê parvekirina erd û zevîyan bû, bi hêza herêmî û kesî (personal), lê daxwaz û hêzên wê yên pir mezin (derveyî sînorên xwe) dibû sedema şer û lêkdanan. Qralên (Monarch) feodal *prîmus inter pares* (di nav wekhevan de yekem) bûn, ji mîrên xwe aliyê paye ve ne, lê belê aliyê cureyê ve cuda dibûn, û ji wan re bi mecburiyetên berdêlkî ve girêdayî bûn. Ji ber ku Qral, ji bo pêkinana ordî û berhevkirina bacan muhtacî mîrên herî bi quwet bûn, zehmet bû ku ew bibin desthelatên rastîn, lewre wek derebegên pir bi hêz bûn" (Mellor 1989: 44-45; bnr, Peirson 1996: 41- 43). "Lewre qralê feodal, tu caran nedibû "desthelatdar", gelek gelek dibû *derebegek*." (Hall 1984: 6).<sup>9</sup>

Şeref-name, gelek belgeyên girîng tedarîk dike, der barê qeyd û bendên li ber bikaranîna hêzê, hem aliyê mîrîtiyên kurdan û hem jî ji aliyê du dewletên serekmîr (overlord) Tirkîyeya Osmanî, û Safewîyan. Nava her mîrîtiyekê, hiyerarşiyeye tîkiliyên hêzê (power relations) hebû. Desthilata balatirîn di destê yek mirovî de bû, her gav mêr, ku bi baweriya hêza xwe

<sup>9</sup> Der barê universalîya taybetiyên dewleta feodal, ji nav yên din, bnr, Fîner (1997: 870).

ya leşkerî û ekonomîk hukim li ser "tebaaya" xwe dikir. Pîrî caran, her çend kêr jî be, hêzeke daîmî hebû ku bikare serûberiyê (rêzik) pêk bîne û, qet nebe textê rêveberiyê biparêze. Ji bo ku ji dagirkeran biparêzin an jî operasyonên êrişê pêk binin, ev ordî, diviya bi desteka leşkerî bihata bi hêztirkirin. Ev desteka leşkerî jî, ji mîrên feodal û serokeşîran dihate wergirtin, ku ji ber îmtiyazên xwe mecbûr bûn şervan, hesp, çek, û pêdiviyên din tedarîk bikin. Bi heman girîngiyê, di nav sînorên mîrîtiya xwe de, mîr dikarî bacê berhev bike û desteka otoriteyên dinî hilbijêre, oldar-keşe û dadger-qadî. Bikaranîna hêzê, despotîk û gelek caran keyfî bû. Hejar, gundî û hindikiyên etnîk û dinî yên herî lawaz bûn. Desthelatî mîrasî bû, û sînorên her mîrîtiyekê kêr-zêde diyar bûn (bnr. Bruinessen 1992: 133-204 ji bo lêkolîneke struktura mîrîtiyan).

Dema Şeref-name dihate nivîsin, qederê çil mîrîtiyên biçûk û mezin, li piraniya deverên ku wek Kurdistan dihat nasîn, bi rê ve dibirin. Her çend Osmanî û Safewîyan li Kurdistanê politikayeka aktif a sentralîzasyonê dimeşand jî, wan du hêzan hêj nekarîbû mîrîtiyan hilweşînin. Her çend dijîminiya her du dewletan, nexasim jî berî 1639'an, li ber sentralîzasyonê astengiyek bû; faktoreke sereke, limitasyonên hilberîna feodal bû, hêz û liberxwedanên mîrîtiyan bûn. Her wiha, wan du împaratoriyan nedikarî di seranserê deverê de hebûna xwe ya leşkerî bi rêz û bi tesîr pêk binin. Lewre, ew pîrî caran mecbûr bûn rêveberîya mîrasî ya mîr qebûl bikin, û xweşhal bûn ku bac dihatin berhevkirin û desteka leşkerî ji mîran dihate wergirtin. Pîr balkêş e ku, her çend Osmanî û Îraniyan, xebatên ji bo sentralîzasyona hêza dewletî li Kurdistanê zêdetir û xurttir kiribin jî, şeş mîrîtiyên sereke heta nivê sedsala nozdehan hebûna xwe îdame kir.

### **Dîroknivîsiya Dewletbûyîne (State Formation) li Kurdistanê**

Şeref-name, li ser nasnameya etnîk a kurdan û dijayetiya wan a li gel dewletên Tirk û Îranî hûr dibe. Ev bi rêzikî, *kurd* û ne-kurdan li dijî hev nişan dide, nexasim tirk û îraniyan. *Kurdistan*, heta wê demê, ji bilî yek nexşeyeka sala 1076'an ku

wek “erdê kurdan” (ard al-akrad) dinivîsî, hiç nehatibû nexşekirin.<sup>10</sup> Şeref Xanî, Kurdistan wek erdê binemalên kurdan, û wek welatê çar şaxên kurdan (Kurmanc, Lor, Kelhûr û Goran) nexşe kir. Di nebûna dewleteke navendî ya Kurdistanê de, tixûbên ku Şeref-nameyê diyar dikir, avakirineke sembolîk a dewlet/welatekî bi wî awayî bû. Tixûb, bi grafîkî ne lê belê bi zarkî (bi dev) hatibûn danîn:

...û serê wilayeta Kurdistanê ji perava Behra Hormuzê dest pê dike ku ew jî li qeraxên Behra Hindistanê ye û ji wê derê wek xetê rast dirêj dibe, heta ku li wilayetên Meletî û Meraşê bi dawî dibe û li bakurê vê xetê, wilayetên Faris, İraqa Ecem, û Azarbeycan û Ermenistana Mezin û Biçûk, û li başûrê vê, İraqa Ereb, Mûsil û Diyarbekir hene (Şeref Xan 1964: 24-25).

Haya Osmanî û İraniyan jî, li ser nasnameya etnîk a gel û erdê ku wan dixwest serweriyê lê bikin, hebû. Di qada kargêriya (rêveberî) her du dewletan de, pîrrianiya devera ku ji aliyê Şeref Xanî ve hatibû nexşekirin, wek Kurdistan dihate nişandan. Têgiha “kurd,” jî, ne ji bo hemî niştecihên Kurdistanê, ermenî, asûrî, û cihûyan, lê belê tenê ji bo kurdên etnîk dihate bikaranîn (bnr. mn., Di Seyahatnameya Evliya Çelebî de, rêbiwarê Osmanî yê sedsala hefdehan, bikaranîna “kurd” û “Kurdistan”ê; Dankoff 1990).

Her çend van her du hêzan nedişiya têkilî kompozîsyona etnîka kurdan bibin jî (mn: bi çespondina (imposing-bicihkirin) ziman û çanda xwe), wan hewl da ku têkûzîtiya etnîk a kurdan zeif bikin. Ji bo wê jî, li gel hin kirinên di, xelk bi girseyî rêkirine deverên dûr mîna Xorasanê, û eşîrên tirkên li erdê kurdan bi cî kirin. Mînskoy ku li ser tirkandina Kurdistanê Mukrî ya di dema Safewî û Qacaran de, nivîsibû (1957: 65), dibêje, “Ecêb e kurdan çawa kariye devera xwe ya taybet biparêzin” li herêmê.

Her çend lêkolînên li ser dewletbûyîna kurdan (dewlet avakirina kurdan) kêr bin jî, ew niha jî, bireke rêze metodolojî û

<sup>10</sup> Li gorî Pîrbal (1992; 1993), yekem car diyarbûna Kurdistanê li ser nexşeyekê, di sala 1076’an de di nexşeya Elî Kashgharî de pêk tê (li Challiand û Rageauyê dîsa hatiye çapkirin 1983: 62).

perspektîfên teorîk nişanî me didin. Cemal Nebez, ku bi perspektîfêke nasyonallîzma kurdan dinivîse, diangêje ku “hewlên ji bo avakirina dewleteke mezin a kurdan” hêj berî Şerefnameyê hene, çinku hem Şeref Xan, hem jî hemdemê wî Sadal-ddîn li ser wê mijarê hûr bûbûn (Nebez 1984: 34). Dîsa ew, bi qesta Ehmedê Xanî, niqaş dike ku “fikra avakirina dewleteke kurdî nasyonallîzma ku tevahiya neteweeya kurdan di bin banê Kurdistanê serbixwe de dicivîne û di serî de jî Padîşahê kurd heye” ji cihekî di nehatibû girtin, lê belê, li Kurdistanê derketibû (şîn bibû) ew fikr (rp. 34-35). Ew wisa difikire ku wê demê (sedsala şanzdehan), tirk, faris û ereb, ne wek kurdan li dû avakirina “dewletên deverî” bûn, ne li dû avakirina “dewletên neteweyî.”

Ew diangêje ku “du cure qedereyên dîrokî yên jêk cuda li civaka Kurdistanê ya rojhilatî û li civaka ewropî ya rojavayî pêk hat, ku ne mîna hev in; mn., Di civaka kurdan a rojhilatî de, hişmendiyêke neteweyî hebû ku ji bo avabûna dewleteke neteweyî dixebitî; lê di civaka Ewropayê ya Rojavayî de, dewleta neteweyî ji aliyê çîna birjuwazî (sermayedar) ve hatiye avakirin” (rp. 35-34).

Nebez, “navendî” yê û “neteweeyî”; etnisîte û neteweyê tevlihev dike. A yekem, çî têkiliyê di navbera diyardeya (phenomen) netewe û neteweperweriyê de nabîne, û ya duyem jî, dîsa çî têkiliyê di navbera çîna civakî û pêkhateya sosyo-ekonomîk de nabîne. Lewre, Nebez, wê angaştê marksîst qebûl nake ku dibêje neteweperwerî berhemeke qedemeya kapîtalîst a pêşketinê (development) ye. Çinku diangêje ku İraniyan hezar sal pêş, berî serdemê kapîtalîzmê, fikra “neteweperweriya rojhilatî” bi pêş xistibû (rp. 110-11). Bi wî awayî neteweperwerî, fikreke ne-dîrokî ye (a-historic) ku di mêtîyê rewşenbîr û rêveberan de, her çî gav be, mimkîn e ku peyda bibe. Ango ew, fikr an jî hesteke aîdiyeta dewleteke ku ji tevahiya hemî kom û deveran mezintir e ye; ev beşa mezintir “netewe” ye.

Li dijî tesbîten Nebez, her wiha, civaka pêş-kapîtalîzmê ji aliyê ekonomîk, politîk, civakî, çandî, lîngûîstîkî û deverî ve hatiye dabeşkirin. Sîstemeke wisa, xwe nade yekkirina pêkhateyên eşîrî, çandî, û bajariyên mezin û cuda; yekkirineke ku dê bibe “netewe”yeke bi zimaneke neteweyî, “çandêke neteweyî”,



“karaktereke neteweyî” û dewleteke neteweyî. Bê şik, hem Şeref Xan û hem jî Ehmedê Xanî der barê ku kurd kî bûn (geleke ne-Ereb, ne-Tirk, ne-Faris) û welatê wan, Kurdistan ku der bû, xwedanê fikrên təkûz bûn. Jê wêdetir, Xanî bi aşkerayî banga “di bin Padişahiya kurdekî de avakirina dewleteke kurdan” dikir. Lê belê dîsa tu ji wan, nabe fikreke “dewleta neteweyî” ya li gorî hişmendîya nûjen a “netewee-dewletê”. Fikrên netewe û neteweperweriyê li Rojava peyda bûn û gelek bi nêzik ve têkildarî “ji civak û dewleta feodal derbasbûna bo civak û dewleta kapitalîst” ne. Nebez neşiyaye alternatifekê, cureyeke “rojawayî”, ji bo netewee û neteweperweriyê pêşkeş bike.

Cihê ku Nebez etnîsîteyê, wek hîmê bingehîn ê dewletbûyîna (dewlet-avakirin) kurdan pêşkêş dike, boçûna (approach) nasyonalist a tirkan, hem etnîsîteyê hem jî dewletê ji dîroka kurdan reş dike (jê dibe). Lewma, di xebata xwe ya li ser “Di sedsala şanzdehan de di împaratoriya Osmaniyan de, eşîrparêziya kurdan û têkiliyên navbera dewlet û eşîran”, Ozoglu kurdan bê-etnîsîte dihêle(dike), û wisa dibêje:

“...di sedsala şanzdehan de têgiha “kurd” dibe ku ji bo devereke cografîk hatibe bikaranîn, ne ji bo komeke mirovên ku xwedanê heman fikr û dîtinan (vîzyon) bûn. Bikaranînen têgihên “kurd” û “Kurdistanê” di vê meqaleyê de jî bi heman awayî ne. Ji ber sedemên pragmatîk, ev meqale têgiha kurd, wisa bi kar tîne: birek komên sosyo-polîtîk ku bi zaravayên cuda cuda diaxaftin û xwedanê baweriyên jêk cuda bûn, lê heman deverên çiyayî û gever heta radeyekê heman qeder bi hev re par dikirin. Di vê meqaleyê de, tu wateyên (connotation) polîtîk ên têgiha “Kurdistanê” nîn e, lê, feqet bi wateya “di nav erdê Osmaniyan de devereke cografî, ku tê de zêdetir xelkê kurd heye” hatiye bikaranîn (1996: 9- 10).

Li vir dîroknas, wesa ferz dike ku têgiha “kurd”, tenê heke gel “xwedanê heman vîzyonê be” mimkîn dibe ku bi nişana “nasnameya girseyî(collective identity)” bête bikaranîn; wek ku mimkîn e di sedsala şanzdehan de, hetta salên dawiyên sedsala bîstan de, vîzyoneke wesa hevpar ji bo Tirk, Ereb an jî her çî gelekê dî, bête danîn. Ozoglu, wateya polîtîk a têgiha Kurdistanê

xalî dike, û nosyoneke cografîk didetê: kurd, “birreka komên sosyo-polîtîk in” bi zarava û dînen cuda, û feqet “deverên gever” û belkî “heman qeder”ê bi hev re par dikin.

Li gel wan stratejiyên konseptî re yekaheng, ew, kurdan wek birreka eşîrên ku hin taybetiyên ne-eşîrî jî hene dinirxîne. Lewma, emîritî an mîritîyan wek mîni-dewletan, an jî bi gotina Bruinessen “proto-dewlet”, nabîne. Li gor Ozoglu mîritî, “konfederasyonên(komal)” eşîrkî ne, ku ji eşîran hin bi hin taybetiyên ve cuda dibin, wek “mezintir e û çandeke têkeltir heye; rihên ferzkirî (presumed origins) hene, û civak çinkirî ye (çîn bi çîn); li gor mercan hevkarî dikin ya nakin; û bi dewletê re têkiliyên xurttir hene” (rp. 8). Herwiha, ji ber ku belgeyên li ser sazmaniya (structure) dewletî ya mîritîyan hene, “di sedsalên paşdetir de peydabûna mîritîyên wek-dewlet ên kurda” qebl dike. Lê belê, hêj jî, mîritîyên “wek-dewlet”, li gor wî, berhemên civaka kurda nebûn, lê, dewleta Osmaniyan ew ava kiribûn.<sup>11</sup> Bi gotina wî “Împaratoriya Osmaniyan, di prosesa avakirina mîritîyên kurdan de bi aktîv û berpîrs bû” (rp. 5).<sup>12</sup> Xelase, hişyarî dide li hemberî nirxandina kurdan a wek “di têkiliyên xwe yên li gel dewletan de bi tevahî pasîf,” û bi xwe wesa dinirxîne, “eşîrên ku li qeraxên împaratoriyan mezîni jiya ne...û di bazarkirina (qetandin-îdarekirina) bi dewletên derûdorê re, rêbazên xwe afirandine” (rp. 26; rp. 27 jî). Lewma, dîtina nivîskar a ne-pasîfîst a derbareyê kurdan de,

<sup>11</sup> Ozoglu nişê dide, “Bruinessen dibêje ku ihtimal heye, rêvebirina navxweyî ya wan mîritîyan şeweya dewleta Osmaniyan ji xwe re model bijartibe, her çend bi şekleke kêmîr. Mîritîyên kurdan ên bi hûr û kûrî çinkirî (çînî), berî sedsala şanzdehan hene; herwiha, nisbet bi serdemên berê, belgeyên heyî mirovî qanîh dikin ku polîtîkaya Osmaniyan a *sancakkirina* eşîrên kurda, prosesa çinkirinê vejand. Û ev jî, di sedsalên paşdetir de, bû sebebê peydabûna (pêkhatin) mîritîyên wek-dewlet ên kurdan” (rp. 24).

<sup>12</sup> Fikrên (ferzkirinên) bingehîn yên dîroknasên Tirk ên “dewletparêz (statist)-nasyonalist” ku difikirin ku dewleta Osmaniyan a bi qûdret (omnipotent), di “serdema zêrîn” a împaratoriyan, anku sedsala şanzdehan de, dikarî “plankirina ji navendê(central planning)” ji pêk bîne. Ev dîroknivîsîna “fetîşîstê-dewletê”, ji bo serdemên wek sedsalên hefdeh û hejdehan lec heye, ji ber ku dewletê sentralîtiya (navendîtî) xwe ji dest dida (Berktay 1992b: 251). Li gor Ozoglu; “wextê ku di sedsalên paş de dewleta Osmaniyan zef bû...Kurdistan bi mîrên di pratîkê de serbixwe ve tîji bibû, û wan, ji bo Stenbolê tenê xizmeta bi gotinê dikir (tenê bi sergîrêdan xizmet dikir)” (rp. 26).

tenê, hêza veafirandina tribalîzm (eşîrparêzî) û sazumanên eşîrkî dide kurdan. Tu navendiyekê (centrality) ji bo kurd û Kurdistanê qeşul nake, qe nebe navendiyekê ku kurdan bi xwe pêkanîye, û wan heta heta di qeraxên imparatoriye de sinor dike (bend dike).

Kevneşopiya dîroknîvîsiya Sovyetan, ku kurdan wek geleke bi dîrokeke xwe ya cuda dinirxîne, ji dîroknîvîsiya Tirk, Ereb û Eceman cuda ye (cuda tê nasîn). Her çend bi zanayî (sofistike) nebe û teorîkî ve li ser hûr nebe jî, ev lîteratur, dewletbûyîn û etnisîteyê diêxe nava pêşketina hilberîna feodalî (development of feudal mode of production). Lewma di xebata xwe ya li ser mîrîtiyên Baban û Erdelan, Vasileva (1991: 241-45), digihe wê encamê ku ew û mîrîtiyên di dewletên rastî ne, û her sazumana ku ji bo rêveçûna ev instituta hêza politik pêwîst be, di wan mîrîtiyan de heye. Her çend bi dewletên Osmanî û Îraniyan ve girêdayî jî bûn, mîrîti di encama veguherîna civaka kurdan de pêkhatin (peyda bûn), û xwedanên eslî yên erdê xwe bûn. Formasyonên (pêkhatinên) êl û eşîrî himên bingehîn ên mîrîtiyan bûn. Her çend haya wê (Vasileva), ji tesîra eşîrparêziyê (tribalism-hozîti) ya neyînî li ser tevgera hemdem a nasyonallîzm a kurd hebe jî, eşîran wek hebûnên (beş, entity) "etnososyal û sosyopolitik", ku li paşerojê di parastina nasnameya etnik a kurdan de pir bi tesîr bûye, dinirxîne (dibîne) (rp. 242). Bi bandora Marksîzmê, Vasileva, yekem car, beşeke tevav li ser lêkolîna "rewşa îdeolojîk" a mîrîtiyan dinivîse (rp. 211-40).

Li ciyekê di dibêje ku, her çend dîroka civakî û ekonomîk (socio-economic) a mîrîtiyan nehatiye lêkolîn jî, mirov nikare wan wek formasyonên (pêkhatinên) ji aliyê çand û ekonomiyê, wêran û kêmbinirxîne. Nişe dide ku Şeref-name, li ser çand û ekonomiya mîrîtiyan a şax vedida, gelek belgeyan pêşkeş dike (1967: 45-46).

Krikavova (1979), ku bi hişmendiya dîroknîvîsiya Sovyetan dinivîse, "hukim bîdestxistina du sê mîrîtiyên kurdan" bi pêşketina feodalîzmê ve têkildar dike (rp. 148). Her çend pêşketina "etnik" û "neteweyî" jêk hatibin cudakirin jî, hin çaran ew her du konsept, li cihê yek û du hatine bikaranîn. Dîsa jî, nivîskar balê dikişîne ser qeyd û bendên girîng, ku

têkiliyên pre-kapîtalîstî ew qeyd û bend li pêkhatina neteweya kurd bar kiribûn.

Xebatên li ser dewletbûyîna kurdan ne tenê bi lîteratûra di bin tesîra Marksîzmê de sinorkirî ne. Nikîtin, ku bi kevneşopiya oryentalîstan dinivîsî, du beşên pirtûka xwe ya navdar ji bo "kurd û dewlet" ê veqetandibû (1956: 177-190). Dema ku nivîskar çiroka du sê binemal û mîrîtiyan vedibêje, biserneketina kurdan a ji bo avakirina dewleteke temendirêj derdibire; û li gorî wî girîngtirîn sedema vê yekê hişmendiya kurdan a eşîrkî ye:

Me dît ku ew rihê (instinct) "eşîr"ê ye, bo nimûne, rihê xwe-parastinê, ku hereket û hişmendiya wî (kurd) wek endamê komekê (girse) diyar dike. Şikl û fikrên xwe di nav çarçoveya eşîrê de digire, ku hukmê eşîrê ji bo wî balatirîn radeya hiqûqê ye. Kurd, merifet (virtue), kesayeti, ziman, reftar û edetên xwe ji eşîra xwe digirin. Ev yek di heman demê de, hişmendiyeke teng pêk tîne ku bi qeyd û bendên eşîrî ve hatiye dorpêçkirin. Û ew hişmendiya teng e ku nahêle ew (kurd), dewleteke neteweyî ya temendirêj hizr bike (rp. 178).

Ramanên heyî, hê jî ji bo lîteratûra ku her mezin dibe bingeh e, lê belê, xebata Martin van Bruinessenî ya li ser civaka kurdan, bi awayekî radikallî jî dîroknîvîsiya oryentalîst cuda dibe. Her çend sernavê pirtûkê "axa, şêx û dewlet" be, ku "sazûmanên civakî û politikî" ên kurdan tîne rêza çînen serdest (ruling classes), xebata Bruinessenî ji piraniya lêkolînên rojavayî cuda dibe (tê nasîn), ji ber ku kurdan wek gelekî xwedanê rabirdûyeke dewletbûyînê (state formatin), dinirxîne. Her çend pêkan nebe ku hemû analîz û belgeyên di vê pirtûkê de hatine pêşkêşkirin binirxînin, em li vir kakilê encamên wî didin (quote).

Lewma civaka kurd, di domana pênc sedsalên dawî de, di qonaxên girîng ên veguherîna civakî (social evolution) re derbas bûye: eşîr, serokatî û (proto-) dewlet, lê belê bi rêzikên *nişîvbûnê*. Ev deverîbûna (devolution) sazîyên politik ên

kurdan, rasterast encama pêşketina (development) rêveberiya politik a dewletên ku kurd pê re yek bûn, bû (rp. 159).

Li vir, em tēkiliyeke kompleks, heta diyalektik, di navbera "veguberîn" û "deverîkirin", meylên guherînê yên "hilkişîn" û "daketinê" û tesîra faktorên "navxweyî" û "derveyîn" de dibînin. Bruinessen, sazûmaniya navxweyî ya mîrîtiyan û tēkiliyên wan ên bi du împaratoriyan re ku her diguherîn, pir baş ronî dike. Lê belê tengbîniya dîrokî ku ji hêla rewşa wî ya teorîk ve tē lawazikirin piştewaniyeke xurt ji belgeyên wî ji wernagirin. Li milekê, rolên ewqas pir bi qudret dide dewletên Osmanî û Îranî ku, ligel vê yekê jî dînamîkên navxweyî yên civakên navborî ku zêde pûte pê nehatiye dayîn dikarin li dijî vê hêzê xwe ragirin û konfederasyonên eşîrkî ava bikin.<sup>13</sup>

Li milê dî, di mîrîtiyan de desthelatdariyeke wisa dibîne ku wan (mîrîtiyan) rasterast tîne ser rêza feodalîzma Ewropayê. Her wiha, li gorî Bruinessen, ev cur desentralîzasyon, ne taybetiya pergala û dewleta sosyo-ekonomîk a feodal e, lê belê tēkildarî "demên zeif ên hikûmeta navendî" ye, wextê "ku pergale xwest ji rêzîkên xwe yên nivîskî bibore" (rp. 154). Ferzkirina di bingeha vê raveya legalîstîk de, ramanê feodalîzmê ye ku bi gotina Berktaî, wê tēxe rêza "bireke mecbûriyên tegez, berdêlvani û nivîskî (contractual-belênderî) di navbera derebeg û tebaa (de, ku hêmanên hiqûqî, politik, leşkerî û dîni dihewîne."<sup>14</sup>

<sup>13</sup> Bruinessen dibêje: "Fikra "eşîr, wek pêkhatina (avakirina) dewletê, lê belê, ne pêkhatina civakî û politikî ku berî pêkhatina dewletê tē dîtin," di pêvajoya *xebata warî (fieldwork)* ya min de hêdî hêdî kete nav ramanên min û gelek bi riktir ji dema ku min piştî çavkaniyên dîrokî xwendin" (1992: 134). Li cihê dî diyar dike: "Ji aliyekî ve, eşîr, wek ku di beşa berê de hatibû diyarkirin, bi ya min, dibe ku wek *avakirina dewletê* jî bêne nixandîn" (rp. 134, bal nişanêyn balkişandinê yên deqa resen in; bnr, rp 8'an ji). Tesewwûra kurdan a wek gelekî "eşîrkî", di akademyaya Rojavayî û hişmendîya nasyonalîst a ereb, faris, û tirkî de pir bi berfirehî hakim e. Bruinessen jî, ji bo Şeref-nameyê "dîroka eşîrên kurdan" dibêje ("Kurdistan", yekem rûpela bêhejmar di Meiselasê de 1997).

<sup>14</sup> Ev danasîn, ku ji Berktaî (1992a: 118) hatiye wergirtin, û nixandîn ji aidê wî ye, danasîna ku dîroknasên ne-Marksîst herî zêde hez jê dikin e. Mesela Ritter (1986: 164), danasîna feodalîzmê wisa pêşkeş dike, "Tēkiliyeke leşkerî û politik a serdemên navîn e ku li gorî vê tēkiliyê, vassalek rêzê ji lordekî digire û dilsoziya xwe dide wî (yan jî sadakat), û ji ber wî jî derebegîyê werdigire (mn., piştgirî) -pirrî caran wek erd- kû bi wî awayî

Bruinessen bawer dike ku pergala Osmaniyan ji feodalîzma Ewropayê, li gel hin tiştên dî, di wan waran de cuda dibe: Osmaniyan kontroleke qewî li ser rêveberiya hiqûqê hebû, xwedanê erdî ne derebeg, le belê dewlet bi xwe bû û di Osmaniyan de konseptê "ked"ê nebû (1992: 153-54). Ji ber ku mîrê Bedlîsê "otorîteya hiqûqî" (qadî) ya xwe, bi xwe hilbijart, û lewre ji Stenbolê azad bû, divê ev mîrîti wekî "awarte" bête qebûlkirin, ku "ji eyaletêka împaratoriye zêdetir, bi rengê dewleteke derebegî" bû (rp. 169).

Bruinessen, nikare pergala mîrîtiyan a kurdan di nav pergala feodalîzma Osmaniyan ku bi qanûnan hatiye diyarkirin de, cî bi cî bike, lewre dibêje, paytext, Stenbol, "rêzîkên xwe yên nivîskî berfireh dike." Konseptê "berfirehkirinê (transgression)", li vir, bi wateya bikaranîna hêzê ya yekalî ye, ji navendê ber bi qeraxê ve.<sup>15</sup> Her wiha, dîtinê determinîstîk a Bruinessenî ya der barê hêza rêzîkên nivîskî, ne di bin tesîra fetîşîzma-dewletê yan "fetîşîzma-dokumentan" a dîroknivîsiya kemalîst a împaratoriya Osmaniyan de ye.<sup>16</sup>

Ew, çavkaniyên xwe yên nivîskî an devkî (oral), bi rexnegirî kontrol dike (lêdikole), û gelek caran xwendevanî der barê "pêşdarazî" yên çavkaniyên xwe de hişyar dike. Bi rastî, wisa xuya ye ku pirtûka wî, yekane dîroka kurdan a ne-Marksîst e ku rabirdûyê di perspektîfa "mirovê sade" vedibêje, bi dîtinê "li jêr (binî)".<sup>17</sup> Jê wêdetir, wî yek avantajeke di jî heye (ku qet

xwe wek şêrvanekê piştrast bike; her wekî gelek beşên Rojavayê Ewropa...ji sedsala neha heta sedsala sêzdehan.

<sup>15</sup> Meyla dewleta navendî (state-centrist), ne tenê di çarçoveya navend-qerax (centre-margin) a Bruinessenî, lê belê di zimanê ku bi kar aniye de jî aşkera ye. Bo nimûne, "Azadiyeke pir zêde ji malbata rêveber a Bedlîs ê re *hatibû bexşkirin*; dema mimkûn dibû wan (malbata rêveber) hêj zêdetir ji *dixwest*" (rp. 169, cihê îtalîk di pirtûkê de ji wisa ne). Li gorî wê dîtinê, navend (her çend dagirker û êrîşker), bi rewayî hêz û imtiyazan bexş dike, lê belê qerax, wek ku tu caran çav jê tēr nabe, hêj zêdetir *dixwaze*. Li vir, rewayîya ku dîroknas ji du aliyên re bexş dike ne mîna hev e.

<sup>16</sup> Wekî ku Berktaî (1992b: 250-52) bal kişandiye, dîroknivîsiya statîst-nasyonalîst a tirkî di destê "fetîşîzma dokumentan" de ye. Bo nimûne, tomarên dewletê yên nivîskî û yên memûrên wê ku pirî caran "ji Qralî zêdetir piştgirê qralî" bûn, ji xwe re wek rastî digirin.

<sup>17</sup> Ji bo nixandîneke berfireh a pirtûka wî, bnr. Hassanpour (1996).

nebe ji bo lêkolînerê xebatên li ser kurdan, ew avantaj kêr tê dîtîn), ew dikare li ser dîrokê bi hizrên antropolojîstekê bixebite. Dîsa jî, ne ecêb e ku raveyên wî zêdetir nêzîkî çarçoveya dîroknivîsiya kemalîst a statîstîk in.<sup>18</sup> Dahûrandina teorîk, mn., cudakirina qanûn-dadweriyê ji ekonomiyê, an polîtîkayê ji ekonomiyê, dibe sebebê pozîzyonên (dîtinên) kêmkirinê û determinîstîk (reductionist and determinîstîk). Lê belê, dîsa jî divê baş bête zanîn ku bîngê wan her du dîroknivîsiyan jêk cuda ne. Cihê ku kevneşopîya kemalîst, ji aliyê îdeolojî û polîtîkaya xwe ve, bi ji nû ve avakirina dewleta Tirkî ve girêdayî ye,<sup>19</sup> tesbîtên Bruinessenî, di bin tesîra wan dîtinên teorîk de ne ku ew jî li dû polîtîkaya wî ya demokratîk tî.

Xebata Bruinessenî, hem bi serkeftin û hem jî bi kêmasiyên xwe ve, li ser dîroknivîsiya Kurdîstana serdema mîrîtiyan, li gel hin çareseriyên ku pêşniyar dike, pirsên pir girîng jî dipirse. Di nav sînorên ku nivîskarî ji bo qada lêkolîna xwe danî de jî (li ser dilsoziyên seretayî hûr dibe), tesbîtên dîrokî yên li ser mîrîtiyan, ne dîroka polîtîkî, lê belê, civakî û ekonomîk in. Dîmeneke pêkhatinên sosyo-ekonomîk, têkoşîn û sazûmaniyên çînan, şerên **nav-dewletî**, û her wiha pêkhatina mîrîtiyan di warê polîtîk, kargêrî (administratîf-rêveberî), dadwerî û serbaziye de pêşkeş dike. Agahiyên (çavkaniyên-data) berfireh bi kar tîne, wek, raportên fermî, çavkaniyên kurdan, seyahatname, folklor, û çavkaniyên duyemîn. Her wiha, di navbera metodolojiya wî ya hemûkî (holistic), û lêhûrbûna teorîk (gerdîleyîya teorîk) de, ferq heye. Lewma, dîmena wî ya xweşik a rabirdûyeke hindik hatiye tomarkirin, bi daxuyaniyên state-sentrîst û legalîstîk, ku encama (ji) nebûna teoriyeke çak a feodalîzm û dewleta feodal e, hatiye şêlikirin. Ji ber vê hindê, çarçoveya navend-qerax a xebata Bruinessenî, dîroka wî ya civakî dixure nav warê dîroka polîtîk. Xwe(even) dema konseptê "feodalîzm" ji bo ravekirina belgeyan tê bikaranîn (invoke) jî, wê (feodalîzm), bi desentralîzasyona heza polîtîk ve dikin yek.

<sup>18</sup> Ne tesadûf e ku tesbîtên nasyonalîst ên Ozoglyûyê (1996: 19, 25), di xebata Bruinessenî de cihêkî germ ji xwe re peyda dike

<sup>19</sup> Bnr. mn., rexneya (critique) Berktaş (1992a) a "dewlet mîna xweda di dîroknivîsiya nasyonalîst a tirkî de."

Bêyî agahiyên li ser pergala feodalîzmê, hêsan nîn e ku mirov civak û dîroka kurdan baş fêr bike. Bi nezer a min, teoriya civakî ya marksîst, nexasî jî angaşten der heqê feodalîzmê de, ji bo lêkolîna dîroka kurdan çarçoveyeke çaktir pêşkêş dike. Materyalîzma dîrokî, feodalîzmê wek pergaleke civakî-ekonomîk (sosyo ekonomîk) dinirxîne; di vê teoriyê de divê dîroknas, cureyên hilberînê (production) li gel têkilî û hêzên wan ên hilberînê, têkoşîn û sazûmaniyên çînan, şer û pêkhatinên (formation) îdeolojîk, sazûmaniyên polîtîk, dad, dîn, perwerdehî, zîman, mîmarî jî tê de çandên "materyal û giyanî, edebiyat, huner, muzîk, folklor û hwd. ji binî jî nû ve bike (reconstruct) û wan rave bike. Di vê çarçoveyê de, hemû parçeyên civakê, di hevjin û şerên bêdawî de *serbixwe* ne. Her çend têkildarî bi feraseta dîroknasî ya der barê teoriyê de jî be, materyalîzma dîrokî, analîzkirina civakê wek parçeyên serbixwe û cuda, mîna dad, polîtîka, çîn, ekonomî, zayend, navend, qerax hwd. qebûl nake.

Teorî, xwe ji ramanên şovenîzma netewe û nêr dîr dixê, ku ew raman tevahiya dîroknivîsiya nasyonalîst dadigirin; dîroknasî wêrek dike (encourage) da ku dema niha û rabirdûyê bi perspektîfa bêxwedanan de bibîne.<sup>20</sup>

Wek sazûmanên civakî, gelemperî zanistî, û taybetî jî dîroknivîsî, bi tu awayî partîzan nabe. Her liv û bizava dîroknivîsiyê, veafirandina rabirdûyê ye. Mînak, dîroknivîsiya nasyonalîst a tirkî, rabirdûyê bi rêbazeke wisa ava dike ku dewleta kapîtalîst a Tirkî vejîne (reconstruct). Bi heman rengî, dîroknivîsiyên nasyonalîst ên kurdan jî, xizmetê ji armanca gelekî bê dewlet, ku li gera dewletekê de ye, dikin. Di her du rewşan de jî, armancên polîtîk û îdeolojîk serdest in. Her çend dewaya objektîfîyê bikin jî, dîroknivîsên di ji aliyan digirin. Fikra "objektîfîyê" (neutrality), li ser ferzkirina "mîmkûn e ku benîadem "objektîf" û "bê pêşbiryar" bin", ava bûye, hêj aşkartî (dirûvgirtî-substantiated) nîn e. Dibe ku yek beje mesele (problematîk) hîlbijartina dîroknasî ya di navbera "objektîfî" û "pêşbiryarî" yê de nîn e, lê belê di şeweya *binbariya (commitment)* wî de ye.

<sup>20</sup> Ji bo lêkolînen Marksîst ên derbarê feodalîzm û dewleta feodal a di serdema Osmanîyan de bnr. Mn. Berktaş and Faroqî (1992) and Haldon (1993)

Çiroka jiyana Şeref-nameyê hêj nehatiye vegotin. Dîroka vê dîrokê, hem modela rêveberiya (governance) kapîtalîst û hem jî modela feodal, ronî dike. Di serdema feodal, berî çapê de, li seranserê Împaratoriya Osmanîyan, Îran û Hindistanê hate weşandin (bi 35 destnivîsên ku tînan zanîn, bnr. Soltanî 1997). Pirtûk, sedsala hefdehan de hate wergerandin bo tirkîya Osmanî. Her wiha, çapa yekem wergera wê ya di tirkîya nûjen de, li Komara Tirkîyan, di 1997'an de, demildest (derhal) bertekên sansûrê girtin. Di çapa a pirtûkê ya 1990'î de, dokûmentên der heqê dadgehkirin û dû re azabûna pirtûkê li dadgeheke Stenbolê de jî, di pirtûkê de cih girtin. (Şeref Xan 1990: 533-44). Komara tirkîyan xwest ku bizane ka mimkîn e Şeref-name, tînkûzîtiya erdê dewletê tehdît bike.

Di serdemên pre-modern de, Şerefnameyê, di nav rêveberên mîritîyan de hisa aîtbûna Kurdistanê belav kir. Wisa xuya ye ku gelek rêveberan ev pirtûk ne tenê bi awayekî sade xwend. Wan, Şeref-name kire dîrokeke zindî, berdewam a desthilatiya dewletê (mîritiyê). Hinek jî binemalên rêveberan, mn. Mukrî, Erdelan, Êgil, Palû, û Bana, jî bo beş an beşokan *zayls* an "paşko-supplement" nivîsîn, ku dîroka minî-dewletên wan bi kurtî vedigot. Di serdema nasyonîzma modern a kurdan de jî, Şerefname hêj şêkl û şêwe dide nasnameyên (identity-kesayeti) etnîk û neteweyî. Çapkirina pirtûkê ya sala 1971'ê de, jî bo nîfşa nû ya rewşenbîrên li Tirkîyê îsbat kir ku "kurdan jî dîrokek, cografyayeke (erdnîgarî) baş binavkirî, şîyan û dezgeha xwe-rêvebirinê... heye." Ev "wek kifşkirina serzemîn an planeteka nû bû. Piştî Şerefnameyê, xwendekarên kurd ên zanîngehan dest bi xebitîna dîroka mîritiyên kurdan û sazîyên politîk kirin" (Elturan 1998 6-7).

Şerefname yekem, û hê jî, berfirehtirîn dîroka kurdan e ku jî aliyê kurdan bi xwe hatiye nivîsîn. Wê, ku yek jî girîngtirîn berhema pergala feodal a kurdan e, pergala mîritiyê meşrû kir (meşrûyî da pergala mîritiyê). Pirtûk, dokûmentareka dîroka dirêj a tîkoşîna kurdan a jî bo dewletbûyîne ye. Wekî dîrokeka çînen rêveber ên kurdan, ku nûnerekê navdarê wan nivîsiye, pirtûkê, mirovên kedkar, gundî, jin, gelên ne-kurd wek ermenî, asûrî û cihû, û hindîkiyên kurdan wek êzîdî, pê çî nîn e. Hişmendîya (pozîsyon) îdeolojîk a pirtûkê her çî dibe bila bibe, aşkera ye ku nîqaşên me yê li ser Şeref-nameyê bi

tesîra hişmendiyên xwe yê îdeolojîk, politîk û teorîk pêk tînan. Lewma, înteraksiyonên tîkel ên navbera nivîskar, deq, xwendevan û konteksta wan a dîrokî, gelek cur şîroveyan pêkan dike, hem azadker û hem jî bipaşveber (retrogressive).

## Çavkanî

Berktaş, Halil

1992a "The search for the peasant in Western and Turkish history/historiography," li Berktaş û Faroqî (1992), rp. 109-184.

1992b "Three empires and the societies they governed: Iran, India and the Ottoman empire," li Berktaş û Faroqî (1992), rp. 242-63. Berktaş, Halil û Faroqî, Suraiya (eds.)

1992 *New Approaches to State and Peasant in Ottoman History*. London, Frank Cass.

Bruinessen, Martin van

1992 *Agha, Shaikh and State: The Social and Political Structures of Kurdistan*, London, Zed Book Ltd. (paperback edition).

Challand, Gerard û Rageau, Jean-Pierre

1984 *Atlas de la découverte du monde*. Paris, Boreal Express.

Cherepnin, L.V. û Pashuto, V.T.

1978 "Образование Русского централизованного государства в сравнительно-историческом аспекте (xvi-xvii vv.)," *Voprosy Istorii*, No. 2, rp. 41-53; "The formation of the centralized Russian state in the comparative historical aspect (16th-17th centuries)" [abstract in English], rp. 222.

Dankoff, Robert

1990 *Evlîya Çelebi in Bitlis*. Leiden, E. J. Brill.

Elturan, Burhan

- 1998 "Amidst the left, the right and the assimilated: The resurgence of Kurdish identity, the case of the DDKO," unpublished paper.
- Falk, Richard
- 1993 "Sovereignty," *The Oxford Companion to Politics of the World*. New York: Weşanên Oxford University, rp. 851-54.
- Finer, S. E.
- 1997 *The History of Government from the Earliest Times. Vol. II. The Intermediate Ages*. Oxford, Weşanên Oxford University.
- Haldon, John
- 1993 *The State and the Tributary Mode of Production*. London, Verso.
- Hall, Stuart
- 1984 "The state in question," li G. McLennan, D. Held û Stuart Hall (eds.), *The Idea of the Modern State*, Milton Keynes, Weşanên Open University, rp. 1-28.
- Hassanpour, Amir
- 1996 Nirxandina Martin van Bruinessen, *Agha, Shaikh and State: The Social and Political Structures of Kurdistan* ( London, Zed Book Ltd.) di *Iranian Studies* de, Vol. 29, Nos. 1-2, rp. 200-204.
- Hsiao, Liang
- 1975 "Reflections on the 'Discourses on the State Control of Salt and Iron'," in *Selected Articles Criticizing Lin Piao and Confucius*, Vol. 2, Peking, Weşanên Foreign Languages, rp. 116-41.
- Inalcik, Halil
- 1980 "The question of the emergence of the Ottoman state," *International Journal of Turkish Studies*, No. 2, rp. 71-79.
- Jwaideh, Wadie

- 1960 *The Kurdish Nationalist Movement: Its Origins and Development*, Unpublished Ph.D. dissertation, Syracuse University. Du volume.
- Khani, Ahmed
- 1962 *Mem û Zîn*. Teksta kurdî ji aliyê M.B. Rudenko ve hatiye wergerandin û amadekirin, Moskova, Adademiia Nauk SSSR, Izdatel'stvo Vostochnoi Literatury.
- Křikavová, Adéla
- 1974 "Khani, Ahmade," *Dictionary of Oriental Literatures. Volume III. West Asia and North Africa*. London, George Allen & Unwin Ltd., rp. 103-104.
- 1979 "A contribution to the question of the formation of the Kurdish nation," *Archív Orientalní*, Vol. 47, rp. 145-60.
- Meiselas, Susan
- 1997 *Kurdistan: In the Shadow of History*. New York: Random House.
- Mellor, Roy E. H.
- 1989 *Nation, State, and Territory: A Political Geography*. London, Routledge.
- Minorsky, Vladimir
- 1927 "Kurds," *The Encyclopaedia of Islam*, Vol. II, rp. 1132-1155.
- 1957 "Mongol place-names in Mukri Kurdistan," *Bulletin of the School of African and Asian Studies*, Vol. XIX, Part I, rp. 59-81.
- Mustafa Ali
- 1979 *Counsel for Sultans of 1581 a Mustafa Ali*. Ji aliyê Andreas Tietze ve hatiye wergerandin û amadekirin, Wien, Verlag der Österreichischen Aakademie der Wissenschaften.
- Nikitine, Basile
- 1956 *Les Kurdes: Etudes sociologique et historique*. Paris, Imprimerie nationale.

## Özoğlu, Hakan

- 1996 "State-tribe relations: Kurdish tribalism in the 16th- and 17th-century Ottoman empire," *British Journal of Middle Eastern Studies*, Vol. 23, No. 1, pp. 5-27.

## Cemiyeta Neteweyan, Komîsyona Mandayên Timî

- 1930 *Minutes of the Nineteenth Session Held at Geneva from November 4th to 19th, 1930...* Geneva, Series of League of Nations Publications, VI.A. MANDATES, December 29, 1930.

## Lewinstein, Keith

- 1995 "Hukumah," *The Oxford Encyclopedia of the Modern Islamic World*. Vol. 2, pp. 139-43.

## Pierson, Chrisopher

- 1996 *The Modern State*. London, Routledge.

## Pîrbal, Ferhad

- 1992 "Kartografî Ewropîyekan û yekemîn nexşey cugrafî ke nawî Kurdistanî têda hatuwe" *Berbang*, Vol. 11, No. 4 (No. 81), pp. 51-55.
- 1993 "Xöndineweyekî kartografiyaney koloniyalizm le Kurdistan da", *Rabûn*, No. 6, pp. 61-81.

## Ritter, Harry

- 1986 *Dictionary of Concepts in History*. New York, Greenwood Press.

## Şeref Han

- 1990 *Şerefname: Kürt Tarihi*. Ji aliyê M. Emin Bozarşlan ve ji erebî bo tirkîyê hatiye wergerandin. Istanbul: Weşanên Hasat.

## Sharaf Khan Bidlisi

- 1964 *Sharafnameh: Tarikh-e Mofassal-e Kordestan*. Amadekirin ji Mohammd 'Abbasi, Tehran, Weşanên 'Elmi . (Reprinta çapa Kahireyê).

## Soltani, Anwar

- 1997 *35 Destnûsî Şerefnamey Betlîsî le Kitابخanekani Cihan*. Jönköping, Sweden: Kitab-i Arzan.

## Southall, Aidan

- 1968 "Stateless society," *International Encyclopedia of Social Sciences*. Vol. 15, pp. 157-168.
- 1996 "Tribe," *Encyclopedia of Cultural Anthropology*, Vol. 4, pp. 1329-1336.

## Vasil'eva, E. I.

- 1967 "Predislovie," Sharaf-Khan ibn Shamsaddin Bidlisi, *Sharaf-Name*, Tom I, Moskova, Nauka, cc. 13-68; Summary, pp. 613-19.
- 1976 "Predislovie," Sharaf-Khan ibn Shamsaddin Bidlisi, *Sharaf-Name*, Tom II, Moskva, Nauka, cc. 12-36; Summary, pp. 347-50.
- 1991 *IUgo-Vostochnya Kurdistan v XVII - nachale XIX vv.: Ocherki Istorii Emiratov Ardelan i Baban*. Moskva, Nauka.

## Yi-liang, Chou

- 1974 "Liu Tsung-yuan's 'A Dissertation on the System of Principalities,'" ji nav meqaleyên bijarte yên ku *Lin Piao û Confucius rexne dikin*, Vol. 1, Peking, Weşanên Foreign Languages, pp. 159-84.

## Xebatên Li Ser Ehmedê Xanî û Berhemên Wî

*Berhevkar: Burcu Yankın  
Özden Şengül*

Ehmedê Xanî li Bazîdê hatiye dinyayê (1651). Bavê wî Şêx Îlyas, li gundê Qizildizê qaditî kiriye. Xanî di xortaniya xwe de, di meclîsa Mîrê Botan de xebitiye û eşîretên di re jî têkiliyên germ danîne. Li Bazîdê, mizgefta Mûradiyahê de melatî kiriye.

Xanî cara yekemîn Nûbara Biçûkan (1683) û piştî çar salan Aqîdeya Îmanê (1687) xelas kiriye. Di sala 1695'an de berhema xwe ya herî navdar Mem û Zîn nivîsandîye.

"Her çi şairê dawîn û herî mezin ê ekola Cizîra-Botan e, ew Ehmedê Xanî ye. Bê şik û bê munaqaşe, Ehmedê Xanî mîna şair, zana û nivîskarê herî mezin ê Kurdan tê zanîn ku li ser destana nemir û neteweyî Memê Alan, esera herî mezin a klasîk a kurdan ava kiriye."<sup>1</sup>

Di vê xebata xwe de me hewl da ku em berhemên wekî kitap, meqale hwd. ên li ser an jî bi eleqedarî Ehmedê Xanî berhev bikin. Me nekarî hemî berhemên navborî peyda bikin. Lew re taybetî di agahiyên bi zimanên biyanî hatine nivîsîn de dibe ku xeletî an jî kêmasî hebin. Dîsa jî em bawer dikin ku ev yêkem xebata me ya bibliyografyayê dê valahiyeke berfireh dagire û dê hemî xebatên di yên li ser Ehmedê Xanî hêsantir bike.

<sup>1</sup> Shakely, Ferhad; Kurdish Nationalism in Mem û Zîn of Ehmedî Xanî, Swêden, r.17. Neqil ji Uzun, Mehmet; Destpêka Edebiyata Kurdî, weşanên Beybûnê, Ankara 1992, r.12.



Beysanoğlu, Şevket; *Diyarbakırlı Fikir ve Sanat Adamları*, C: 2, Stenbol 1959, r.326. Neqil ji Malmisanlı, Mehmet; "Osmanlı Döneminde Yazılan Kürtçe Eserler", *Tarih ve Toplum* (kovara mehane ya ansiklopedik), hejmar: 54, Stenbol Hezîran 1988, r.59-63.

Alakom, Rohat; "Kürt Ulusal Manifestosu 300 Yaşında", *Özgür Politika* (rojnameya rojane ku li Almanyayê derdiket), hejmarên navbera 11-17'ê Îlona 1995'an.

Jaba, Auguste - Justi, Ferdinand; *Dictionnaire Kurde-Français*, Eggers et Cie,

St.-PÈtersbourg 1979, xviii, 463 p. Neqil ji Chyet, Michael L.; "And a thornbush sprang up between them": *Studies on "Mem û Zîn"*, a *Kurdish romance*, C: 1, UMI Dissertation Service 1991, r.3.

Bozarslan, M. Emîn; *Rojname Kurdî ya Pêşîn 1898-1902*, C: 1, Uppsala 1991, r.126-127.

Le Coq, A. Von; *Kurdisce Texte*, 1903, r.40-47. Ji bilî Nûbarê ev her çend eser jî di vê xebatê de hatine weşandin.

Beysanoğlu, Şevket; *Diyarbakırlı Fikir ve Sanat Adamları*, C: 2, Stenbol 1960, r.332-334.

Bedîrxan, M. Salih; "Berî Şîrî Qelem", *Rojî Kurd*, hejmar: 3, Stenbol 1913, r.24-29.

Medenî, Xelîl; "Bextreşî û Mehrûmiya Kurdan", *Rojî Kurd*, hejmar: 3, Stenbol 1913, r.29-31.

Bozarslan, M. Emîn; "Rojnameya ku di tarîtiyê de hilat: Ehmedê Xanî", pêşgotina *Mem û Zîn* ya Ehmedê Xanî (wergêrê tîpên Latîni û Kurdiya xwerû: M. Emîn Bozarslan), *Jîn* (kovara Kurdî), Uppsala 1995, r.91-96.

Seccadî, Alaeddîn; *Mejûyî Edebî Kurdî*, 1952, r.190-192, 213.

Alan, Ramazan; "Mem û Zîn Edebiyatımızdaki Yeri", *War* (kovara lêkolîn û lêgerîn), hejmar: 1, Havîn 1997, r.15.

Çelik, Müslüm; "Ehmedê Xanî", *Altuni Ihlamur* (kovara du mehî çandeyî hunerî), hejmar: 2, Gulan-Hezîran 2003, r.30.

Durre, Abdurrahman; *Şerha Diwana Ehmedê Xanî, Felsefe û Jiyana Wî*, Avesta Yayınları, Stenbol 2002.

M. Varlı, Ebdullah; *Diwan û Jînewarî ya Ahmedê Xanî I-II*, Sîpan Yayınları, Stenbol 2004.

Mem, H.; *Tesewira Xaniyê Filozof*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Rezber 2004.

Mem, H.; *Mamosteyê Sêyemîn Xanî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Rezber 2004.

Uzun, Mehmed; *Antolojiya Edebiyata Kurdî*, Weşanên Aram, Stenbol Kewçêr 2003, r.18-22.

Bedîrxan, Celadet Alî; *Kürt Sorunu Üzerine*, Avesta Yayınları, Stenbol 1997, r.10-14.

Uzun, Mehmed; "Katiller Çağında Roman; İnsan Serüveninin Senfonisi", *Bir Dil Yaratmak*, Gendaş Yayınları, Stenbol 2001, r.208-213. Neqil ji kovara *Ronahî*, Tirmeh 9-15/16-22.

Lescot, Roger; "Introduction", *Textes Kurdes Vol.2: Memê Alan*, Institut Français de Damas, Beyrûd 1942. Neqil ji Chyet, Michael L.; "And a thornbush sprang up between them": *Studies on "Mem û Zîn"* a *Kurdish romance*, C: 1, UMI Dissertation Service, 1991, r.53.

Bedîrxan, Celadet Alî; "Klasikên Me", *Hawar*, hejmar: 33, Şam 1'ê Çiriya Pêşîn a 1941'ê. Neqil ji *Hawar* (kovara Kurdî) a ku hejmarên wê yên navbera 24-57'an bi hev re cara duduyan bi pêşgotina Nûreddîn Zaza li Berlinê di 1976'an de hatine weşandin.

Seccadî, Alaeddîn; *Edebî Kurdî w Lêkolînewe le Edebî Kurdî da*, Çapxaneyî Mearif, Bexdad 1968, r.245-256.

"Çapekanî Mem û Zînî Xanî", *Rojî Kurdistan/Şemsi Kurdistan* (kovar), hejmar: 5-6, Îlon 1971, r.42.

Shakely, Ferhad; *Kurdish Nationalism i Mem û Zîn av Ehmed-i Xanî* (wergera ji Îngilîzî bo Swêdi: Brigitta Mekander), Stockholm 1985, r.4.

Mem û Zîn, Ehmedê Xanî, amadekirdin û perawêznûsinî Hejar, Kurdish Institute Press, Paris 1989.

Rudenko, M. B.; "Edebî Kurdîyî Sedeyî Hevdeyem", *Ronakbirî* (kovara çandî), hejmar: 1, Stockholm Adar 1992, r.73-89.

Rahşan (Musa Anter); "Şêx Ehmedê Xanê", *Dicle-Fırat* (rojnameya mehane ya ramani), hejmar: 2, Stenbol Sermawez 1962. Neqil ji Malmisanij- Lewendî, Mahmûd; *Li Kurdistana Bakur û li Tirkîyê Rojnamegeriya Kurdî (1908-1981)*, Weşanên Jîna Nû, Uppsala 1989, r.135-150.

Eyyubîyan, Ubeydullah; *Çirikey Mem û Zîn: Kurdî-Farîsî, Çapxane-i Şafaq*, Tebrîz 1962, r.20-35. Neqil ji Chyet, Michael L.; "And a

thornbush sprang up between them": *Studies on "Mem û Zîn" a Kurdish romance*, C: 1, UMI Dissertation Service, 1991, r.16.

Huseyni, Abd el Hamid; "Ahmad-i Khanî va Manzûmah-yî Mam o Zîn", *Nashriyah-yî Danishkaadah-yî Adabiyat va 'Ulûmî Însanî-yai Tebrîz*, 1963, r.74-88. Neqil ji Chyet, Michael L.; "And a thornbush sprang up between them": *Studies on "Mem û Zîn" a Kurdish romance*, C: 1, UMI Dissertation Service, 1991, r.28.

Yûsuf, Abdulreqîb; *Şairên Klasîk ên Kurd* (wergêrê ji tipên Erebi: Ali Şêr), Weşanên Jîna Nû, Uppsala 1988.

Kurdo, Qanatê; "Derheqa Şovêd Mem û Zîn a Ehmedê Xanî", *Govari Korri Zanyariy Kurdî*, C: 6, Bexda 1978, r.78-110. Neqil ji Chyet, Michael L.; "And a thornbush sprang up between them": *Studies on "Mem û Zîn" a Kurdish romance*, C: 1, UMI Dissertation Service, 1991, r.16.

Qazî, Hafîz Mustafa; "Ehmedê Xanî", *Rojî Kurdistan/Şemsî Kurdistan*, hejmar: 5-6, Bexda Hezîran 1971, r.52.

Elî, Mehemed Enwer; Ahmed el Xanî Felsefetu'l-Tesewwuf bi Diwanîhî "Mem û Zîn", *Camîatu'l-Qedis Yûsif, Maahad al Şarqîyya* 1972.

Zaza, Nûreddîn; *Destana Memê Alan*, Weşanên Riya Azadî, Köln 1990.

Amedî, Sadiq Bahaeddîn; "Ehmedê Xanî", *Hozanvanêt Kurd*, Çapxaneyî Korri Zanyariy, Bexda 1980, r.310.

Kurdo, Prof. Qanatê; "Nûbara Ehmedê Xanî", 22.4.1980 (neçapkirî, di Arşîva Mahmûd Lewendî de).

Sevgen, Nazmî; *Doğu'da Kürt Meselesi*, Harp Akademisi Basımevi, 1970. Neqil ji Bulut, Faik; *Devletin Gözüyle Türkiye'de Kürt İsyanları*, Yön, 1991, r.305.

Kurdo, Prof. Qanatê; *Tarîxa Edebiyata Kurdî*, Weşanên Roja Nû, C: 1, Stockholm 1983, r.107, 113.

"Şeyh Ahmet Hani", *Yurt Ansiklopedisi*, C: 5, Anadolu Yayıncılık, Stenbol 1982, r.3360.

Umer, Feryad Fazil; *Edebî Kurdî, Le Bilawkirawekani Xwendîni Kurdî*, Berlin 1986, r.74-91.

Cihanî, Perwîz; *Mem û Zîn*, Navenda Weşanên Ferheng û Edeba Kurdî (Întîşarati'l Selahaddîn Eyyûbî), Urmiye 1988.

Cihanî, Perwîz; *Ferhenga Nûbar*, Navenda Weşanên Ferheng û Edeba Kurdî (Întîşarati'l Selahaddîn Eyyûbî), Urmiye 1988.

Hassanpour-Aghdam, Amir; *The Language Factor in National Development: The Standardization of the Kurdish Language 1918-1985* (sawa doktorayê li Zanîngeha Illionisê), 1989. Neqil ji Chyet, Michael L.; "And a thornbush sprang up between them": *Studies on "Mem û Zîn" a Kurdish romance*, C: 1, UMI Dissertation Service, 1991, r.33.

Hesenpûr, Dr. Emîr; "Gelî Kurd û Destelati Siyasî le Mem û Zînî Xanî da", *Gizîng* (kovara werzaneyî ferhengî-edebî ye), hejmar: 12, Havîn 1996, r.15-20.

Açıkgöz, Yard. Doç. Dr. Namık; "Ahmed-i Hani'nin Mem u Zin Adlı Mesnevisi ve Klasik Edebiyattaki Yeri", *Türk Dünyası Araştırmaları*, hejmar: 67, Gelawêj 1990, r.127-138.

Rûhanî, Baba Merdûxê; *Tarîxê Meşahirê Kord, 'Urefa, 'Ulema, Udeba, Şu'era*, C: 1, Çapxaneyî Siruş, Tehran 1364, r.212-214.

Kaya, Zeynelabidîn; "Pêşgotin", *Nûbar*, Weşanên Roja Nû, Stockholm 1986 ("Kaya" gotinekê bi Tirkî ye û bi mana "zinar" tê, ku Zeynelabidîn Zinar herdu jî wekî paşnav ji bo xwe bikar anîne. ).

Zinar, Zeynelabidîn; "Eqîdeya Îslamê ya Ehmedê Xanî", Çira (kovara çandî, kovara komeleya nivîskarên Kurd li Swêdê), hejmar: 3, Stockholm Îlon 1995, r.18-21.

Zinar, Zeynelabidîn; *Xwendina Medresê, Pencînar*, Stockholm 1993, r.79-86.

Şakelî, Ferhad; "Ehmedê Xanî: Çar Şiir", *Mamostay Kurd*, hejmar: 11-12, Stockholm 1991, r.6.

Kaya, Şefîk; "Çend Şiirên Ehmedê Xanî", *Armanç*, hejmar: 4, Çiriya Pêşîn 1995, r.5.

Wehbî, Tewfîq; "Yek Dû Wêne le Şiir û Felsefeyî Berzî Ahmedî Xanî", *Dengi Giti Taze* (kovar), hejmar: 2, Bexda 1943, r.28. Neqil ji *Mamostay Kurd*, Hejmar: 11-12, Stockholm 1991, r.4.

Welî, Dr. Abbas; "Hevpeyivîn", *Gizîng* (kovara werzaneyî ferhengî-edebî ye), hejmar: 2, Hudiksvall, r.7-12.

Lewendî, Mahmûd; "Ehmedê Xanî", *Didar* (kovara Yekitiya Ciwanên Kurd li Swêd), hejmar: 3, Stockholm Îlon 1992.

Hêcibî, N.; "Di Mem û Zina Ehmedê Xanî de Astronomî", *Nûdem*, hejmar: 8, Jirilla 1993.

Darî, Hejarê; "Niştimanperweriya Xanî", *Aso*, hejmar: 2-3, Beyrûd 1993, r.2, 96.

Vali, Abbas; *Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri*, Avesta Yayınları, Stenbol 2005, r. 26-9, 30, 48, 58, 63-9, 70-72, 74-8, 80-7, 105-8, 117-121, 147-159, 190-1, 196, 204, 215.

Shakely, Ferhad; *Modern Kürt Öykü Sanatı*, Avesta yayınları, Stenbol 1998, r.51.

Bulut, Faik; *Ehmedê Xanê'nin kaleminden Kürtlerin bilinmeyen dünyası*, tümzamanlar yayıncılık, Haziran 1995.

Amedi, Sadık Behaddin; "Ahmedi Xanî", *Kürt Bilim Kurulu Dergisi*, C:2, I. Bölüm, 1974, r.170. Neqil ji Ahmed, Dr. Kemal Mahzar; *Kürtlerde Tarih, Tarihte Kadın*, Pêri Yayınları, Werger: Abdulah Babek Pışderi, İstanbul 1997, r.170.

Resul, Dr. İzzeddin Mustafa; *Ehmedê Xanî (1650-1707): Şair, Düşünür ve Filozof*, Bexde 1979. Neqil ji Ahmed, Dr. Kemal Mahzar; *Kürtlerde Tarih, Tarihte Kadın*, Pêri Yayınları, Werger: Abdulah Babek Pışderi, İstanbul 1997, r.209.

Resul, Dr. İzzeddin Mustafa; "Ehmedê Xanî ve Yaşamı", *Rojî Kurdistan*, hejmar: 15, Ocak 1974, r.9-14. Neqil ji Ahmed, Dr. Kemal Mahzar; *Kürtlerde Tarih, Tarihte Kadın*, Pêri Yayınları, Werger: Abdulah Babek Pışderi, İstanbul 1997, r.209.

Kızılkaya, Muhsin - Nebiler, Halil; *Dünden Yarına Kürtler*, Yurt Kitap-Yayın, İstanbul 1991, r.98.

Burkay, Kemal; *Geçmişten Bugüne Kürtler ve Kürdistan*, Deng Yayınları, C:1, İstanbul 1997, r.206-207.

Bayrak, Mehmet; *Kürtler ve Ulusal-Demokratik Mücadeleleri Üstüne*, Öz-Ge Yayınları, Ankara 1993, r.79-81.

Bruinessen, Martin van; "Kürt Toplumunu, Etnisite, Ulusçuluk ve Mülteci Sorunları". Neqil ji Kreyenbroek-Sperl; *Kürtler*, (werger: Yavuz Alogan), Cep Kitapları, İstanbul 1992, r.53-55.

Amedi, Botan; *Kürtler ve Kürdistan Tarihi I*, Fırat-Dicle Yayınları, İstanbul 1991, r.157-159.

Yıldız, Hasan; *Aşiretten Ulusallığa Doğru Kürtler*, Fırat-Dicle Yayınları, İstanbul 1991, r.124-129.

Mem, H.; *Xanî'den Platona İki Demet Çiçek*, Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 1998.

Uzun, Mehmed; *Destpêka Edebiyata Kurdî*, Weşanên Beybûnê, Ankara 1992, r.7, 12-15.

*Antolojîya Helbestvanên Kurd* (berhevkar: A. Bali), Pelê Sor Yayınları, İstanbul 1992, r.49-59.

Canpolat, Mikail; "Hacı Qadirî Koyî", *War* (kovara lêkolin û legerîne), hejmar: 4, Bihar 1998, r.135-150.

Polat, Lokman; "Di edebiyatê de kanon û fonksiyona edebiyatê", *Gulistan* (kovara çandî û edebî ya mehane), hejmar: 2, Adar 2002, r.48-50.

Sağınç, F. Huseyn; "Wêje û Ehmedê Xanî", *Jiyana Rewşen* (kovara edebî, çandî û hunerî), hejmar: 5, Reşemî 1997, r.9-11.

Umer, Heyder; *Ehmedê Xanî Fî'l-Melheme'l-Şî'riye Mem û Zin. Cî û tarîxa çapê ne diyar e, lê binê pêşgotina nivîsê Heleb fi 25.06.1991* heye.

Bazîdî, Vazgal; "Çend Qesîdeyên Ehmedê Xanî di Destnivîsarên Mele İbrahîmê Zivingî da", *Roja Nû* (kovara hunerî, çandî û edebî), hejmar: 42-43, Stoickholm 1995.

Rudenko, M.B.; "Heizvectnike Ctixi Axmede Xani (Şiîrên Nenaskirî yên Ehmedê Xanî)", hejmar: 3, Narodî Azî Afrîkî 1961. Neqil ji Üsiv, Zera; *Helbestên Xanî, Roja Nû* (kovara hunerî, çandî û edebî), hejmar: 44-45, Stockholm 1995.

Rudenko, M.B.; "Şiîrezezanrawekani Ahmedî Xanî", *Gzîng*, hejmar: 9, Swêden, Rêbendan 1995. Yê ku ev lêkolîn kiriye Soranî û hin jêrenot jê re nivîsîne Qareman Çalak e, r.36.

Hesempür, Dr. Emîr; "Pêdaçûneweyî Kitêbî Ferhad Şakelî. Nasyonalmî Kurdî le 'Mem 3u Zin'î Ehmedî Xanî da", *Enstitûyî Kurdîyî Bruksêl* 1991. Neqil ji Gzîng, hejmar: 9, Swêden, Rêbendan 1995, r.3-11.

Blau, Joyce; "Ehmedî Xanî: Jiyan û Behrem", (Wergêr: Hêriş, pêdaçûnewe: Haşim), *Gzîng*, hejmar: 9, Swêden, Rêbendan 1995, r.12-16.

Mîrawdêlî, Dr. Kemal; "Axawtinek le gel 'Xanî' da", *Gzîng*, hejmar: 9, Swêden, Rêbendan 1995, r.17-22.

Teyfur; "Dêmenî Jin le 'Mem û Zin'î 'Xanî' da", *Gzîng*, hejmar: 9, Swêden, Rêbendan 1995, r.23-27.

Miho, Şakirê; "Xanî Behreke Bêbini", *Gzîng*, hejmar: 9, Swêden, Rêbendan 1995, r.28.

Husamî, Kerimî; "Boçûnêkî Serpêyî", *Gzîng*, hejmar: 9, Swêden, Rêbendan 1995, r.29.

Sofî, Rehmanî; "Ehmedê Xanî kê bûwe û çî kirdûwe?", Gzîng, hejmar: 9, Swêden, Rêbendan 1995, r.30.

Hêdî; "Nasandinî Namilkeyek le ser Xanî", Gzîng, hejmar: 9, Swêden, Rêbendan 1995, r.31.

Seccadî, Alaeddîn; "Ehmedê Xanî (1650-1706)", Gzîng, hejmar: 9, Swêden, Rêbendan 1995, r.31.

Bruinessen, Martin van; "Mem û Zîna Ehmedê Xanî û Rola wî ya di netewerperweriya Kurdî de", Çira kovara kulturî-Kovara Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê, hejmar: 4, Stockholm, Kanûna Pêşîn 1995, r.3.

Bruinessen, Martin van; "Martin van Bruinessen Hollinsk kurdolog och sociantropolog", Svensk-Kurdisk Journal, hejmar: 4, sverige 1985.

Bruinessen, Martin van; Ağa, Şeyh ve Devlet, Kürdistan'ın Sosyal ve Politik Örgütlenmesi, (Wergêr: Remziye Aslan), Özge Yayınları, r.331, 449.

Dara, Dilbixwîn, Felsefeya Ehmedê Xanî, Înstîtuya Kurdî-Berlîn, Tebax 1995.

Rezo; "Xwedîkirin û guhdana zarokan di civaka Kurdîye kevnar de", Pirs, hejmar: 7-8, Zivistan 1995-Bihar 1996, r.64.

Dilovan; "Çend helbestên ên nehatine çapkirin", Pirs, hejmar: 7-8, Zivistan 1995-Bihar 1996, r.86.

Ayhan, Medenî; Kürdistanlı Filozof Ehmedê Xanî, Ankara 1996, r.388, 298-299.

Şakelî, Ferhad; "Sêsed Saleyî Mem û Zînî Xanî", Mamostayî Kurd, hejmar: 29, Stockholm, Bihar 1996.

Cûlemêrgî, Î; "Xanê û Xanî", Nû Roj, Stenbol, 11-17 Çileyê Pêşîn.

Bozarslan, M. Emîn; "Mem û Zîn xezîneyek e", Armanc, hejmar: 4(162), Çiriya Pêşîn 1995, r.6.

Yalsızuçanlar, Sadîk; Mem ile Zîn gözyaşlarının aydınlığında, Timaş Yayıncılık, Stenbol, Tebax 2001.

Mem, H.; "Mem û Zîn İdeal Memê Alan Destan Masal", Weşanên Enstîtuya Kurdî Li Stenbolê, Stenbol, Avrêl 2005.

Mem, H.; "Üçüncü Öğretmen Xanî", Weşanên Enstîtuya Kurdî Li Stenbolê, Stenbol, Rêbendan 2002.

Mem, H.; "Tesewira Xaniyê Filozof", Weşanên Enstîtuya Kurdî, Stenbol, Avrêl 2003.

Dilsöz, Ömer; "Memê Alan", Vesta, Weşanên Aram, hejmar: 1, Stenbol, Payîz 2003, r.165-182.

Farqînî, Zana; "Xanî'nin Sıradışı Şifreleri", Özgür Politika, Stenbol, Gulan 2005.

Nazê, Bavê; "Nîzar Agrî Çi Dixwaze?", kovara Nivîsê, hejmar: 19, Elmaniya, Pûşper 2002.

Agri, Nîzar; "Ahmedê Xanî zimanê kurdî xera kiriye!", kovara Nivîsê, hejmar: 18, Tirmeh 2002.

Alpaslan, İsmet; *Her Yönüyle Agrî*, Ankara 1995, r.186-187.

Boyik, Ekserê; "Rohilatzanayê Urisetê û Ehmedê Xanî", *Azadî*, Stenbol, 17-23'yê İlon 1995.

Dilgeş, Felat; "Ehmedê Xanî û Ramana Dewletî", *Nûdem* (kovara hunerî, edebî û çandî), hejmar: 15, Stockholm 1995, r.33.

Pakdemir, Mahmud; "Berhemên Ehmedê Xanî", *Armanc*, hejmar: 4 (162), Çiriya Pêşîn 1995, r.2.

Narozî, Emîn; "Ehmedê Xanî û Mem û Zîn di Berhemên Biyanî de", *Armanc*, hejmar: 4 (162), Çiriya Pêşîn 1995, r.3-4.

Blau, Prof. Joyce; "Jiyan û Berhemên Ehmedê Xanî" (ji Fransîzî wergerandiyê Kurdî: Malmisaniyê). Ev nivîsar, gotara Blau e ku roja 27'ê Gulana 1995'an li Stockholmê di "Konferansa Ehmedê Xanî" de hatibû pêşkêşkirin. Îngilîziya wê hate wergerandin di kovara *Gizîngê* de derket, Fransîziya wê jî hat wergerandin ser Kurmancî, pêşiyê di hejmara 3'yan a çirayê de, pişt re jî di *Armancê* de hat weşandin.

Elî, Nihad; "300 serreya nuştûşê Mem û Zîn û hewnê Ehmedê Xanî", *Armanc*, hejmar: 4 (162), Çiriya Pêşîn 1995, r.27. Ev maqaleyeke Zazakî ye ku bi munasebeta sê sed saliya ronahîdîtina Mem û Zînê hatiye nivîsîn.

Ciwan, Mûrad; "Bîr û baweriyên Ehmedê Xanî yên felsefî û tesewwûfî", *Armanc*, hejmar: 4 (162), Çiriya Pêşîn 1995, r.14 û "Mem û Zîn kengî jiyan e?", eynî hejmar, r.26.

Bozarslan, M. Emîn; "Mem û Zîn xezîneyek e", *Armanc*, hejmar: 4 (162), Çiriya Pêşîn 1995, r.6. ev gotûbêjek e ku ji *Armancê* emîn Narozî, Hesen Mizgîn û Remzî Kerîm bi munasebeta sê sed saliya Mem û Zînê bi Bozarslan re kirine.

Resûl, Prof. İzzeddin Mustefa; "Dewra Xanî dewra zêrîn e", Armanç, hejmar: 4 (162), Çiriya Pêşîn 1995, r.21. Ev nivîs gotarek e ku di 8'ê Oktobera 1995'an de di semînera Stockholmê de hatibû pêşkêşkirin. Ev semîner ji alî Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê hatibû li derxistin.

Blau, Prof. Joyce; Memoire du Kurdistan, Weşanên Findikly, Paris 1984.

Qeredaxî, Mehemed Ali; "Xiştiyekem le saxtemanî binaxeyî /Dîwanî Xanî/ da be bûneyî sêedsaleyî Xaniye we", Rengîn, hejmar: 80, 15 Hezîran 1995, r.10, 11, 27.

Dêrsim, Memo; "Ehmedê Xanî şoreşger û têkoşerê çerxa xwe bû", Pirs, hejmar: 7-8, Zivistan 1995-Bihar 1996, r.5.

Kohî, Hişyarê; "Ramana E. Xanî", Pirs, hejmar: 7-8, Zivistan 1995-Bihar 1996, r.8.

Marîni, Tengezarê; "Nav û nişanên (Mem û Zîn) a M. E. Xanî", Pirs, hejmar: 7-8, Zivistan 1995-Bihar 1996, r.27.

Berzo; "Xanî û Zimanê Kurdî", Pirs, hejmar: 7-8, Zivistan 1995-Bihar 1996, r.33.

Gundî, Hewarê; "Durvê Hunerî yê Çiroka Mem û Zînê", Pirs, hejmar: 7-8, Zivistan 1995-Bihar 1996, r.4.

Bedirxan, Celadet Ali; Kürt Sorunu Üzerine, Avesta yayınları, Stenbol 1997, r.10-14.

Uzun, Mehmed; Bir Dil Yaratmak, "Katiller Çağında Roman, İnsan Serüveninin Senfonisi", gendaş yayınları, Stenbol 2001, r.208-213. Neqil ji kovara Ronahî, Temmuz 9-15/16-22.

## Edebiyat Dosyası

### Dosyeya Wêjeyê

Hebên Kaxezî - *Sherwood Anderson*

Gula Rojhilatim - *Cigerxwin*

Mezar Taşı - *Sidar Jir*

Tewekkula Bo Xwedê - *William Saroyan*

Ruh Portresi - *Mihemed Şerif Derince*

Hin Peyv Li Ser Dilê Min

Berf - *Ewdîla Pêşew*

Şoreşger - *Ernest Hemingway*

Şefeq - *Arif Husên*

Şoreş - *Bedel Stenbolî*

Cihêreng - *Can Yücel*

Ditirsim

Carna - *William Shakespeare*

## Hebên Kaxezi

*Sherwood Anderson*

*Wergêr Ji Îngilîzî: Ergîn Öpengîn*

Mirovekî kal bû, simbêlên wî spî, û poz û destên wî pir mezin bûn. Zehf pêş wextê kû emê wî binasin, dixtor bû. Li nav kûçe û kolanên Winesburg ê, bi hespê xwe yê pîr î bêkêr, der bi der digeri. Dû re bi keçekî dewlemend re zewicî. Heynê bavê wê mir, jê re zewiyên bi qîmet û bi ber hiştibûn. Keçekî bédeng, dirêj û reşeke bû, û bi ya gelean pir bedew jî bû. Li Winesburgê her kes ecêbgirtî mabû ku çawa bi dixtor re zewicibû. Di bihara heman salê de mir.

Girêçkên destên dixtor zêde zêde pahn û mezin bûn. Dema destê xwe dikir mist (kulm), girêçk, mina topikên darî î bêreng kû bi qasî gûzan mezin û bi tirên pola ve lêk (lev) girêdayî, xuya dikirin. Qelûnekî jî xişt dikêşa. Piştî mirina jina xwe, tevahiya rojê, di ofisa xwe ya betal de, li ber pencereya bi tewnan ve dorpêçkirî dirûnişt. Tu caran pencere venedikir. Carekê di meha tebaxê, rojeke germ de pencere vekir, lê bi xweşiya wî nehat û qet careke di neceriband.

Winesburgiyên kalo jî bîr kiribû, lê di hêla Dr. Reef tovên tişteki pîr baş dihatin reşandin. Tenê riha xwe, li ofisa genî ya li Heffner Blockê, li ser Şirketa Tiştên Hişk a Parîs ê, bênavber dixebitî. Tişteki ku wî bi xwe xelasî lê dianî ava dikir. Pîramidokên rastiye avadikirin û piştî avakirinê ser êk datanîn. Bi wî awayî dibû kû rastiye di bi dest bixista da ku pîramidokên di ava bike.

Dr. Reef mirovekî dirêjeke bû kû deh salan kateki cilan (dîlq) li xwe kiribû. Hiçkên katê peritî, û çok û anîşk jî kun kun bibûn. Li ofisê, berdilkekê qumaş (caw) î bi berikên fireh li xwe dikir. Her gav kerên (parçeyên) kaxezan diavêtin nav berikan. Piştî du sê hefteyan, kerên kaxeza dibûn topikên req u girovir, û

dema berik tiji dibûn, ew guş dikirine ser êrd. Deh salan, tenê yek hevalê wî hebû. Piremêrek, bi nave John Spaniard, xwedanê karxaneyeka zireetê. Carina bi madekî şen, Dr Reef ê kal çengekî topikên kaxezan derdixist û diavête navçavên hevalê xwe. "Ha ji te re, da ku te bibizdîne, sentîmentalîstê kevn ê bêxem." diqêrî û ji kenan dixeriqî.

Çiroka Dr Reef û hevaltiya wî ya bi keça dirêj î reşeke re, kû bû jina wî û perê xwe jê re hişt, serpêhatiyeke ecêb bû. Mîna sêvên kurmî yên baxçeyên Winnesburgê, tamxweş. Dema payîze mirov nav baxçeyên sêvan digere, erd bi xunavê ve req û hişk e. Sêv ji daran hatine çinîn. Piştî bicihkirina nav qaseyan, hatine şandin bo şehran kû dê li wir, di apartmanên tiji pirtûk, kovar, mobilya û mirov de, bêne xwarin. Li ser daran, tenê hin sêvên pês kû sêvçinan hiştine mane. Ew wek girêçkên destên Dr Reef dihar dikin. Mirovek, yek ji wan sêvan leq dide (gez dike), pêdihese kû pir tamxweş in. Hemû şirînî li rexekê sêvê, nava cihekî bicûk de kom bûye. Miroveke, li ser erdê xunavgirtî ji wê darê dipere bo darê dî û berikên xwe bi wan ve tiji dike. Tenê hinek kesan xweşikîya sêvên kurmî pê dizanî.

Hevaltiya Dr Reef û keçikê, piştî nivroyekê hawînê dest pê kir. Wê çaxê, Dr, çil û pênc salî bû. Hêj pir berî hingî dest bi emela xwe kiribû kû berikên xwe bi kerên kaxezan ve tiji dikir û ew kaxez dibûn topikên req. Paşî, ew fire didan. Ev edeta xwe, dema kû bi faytona xwe ya pişt hespê spî î pîr de, li rêyên gundan hêdî hêdî digeri girtibû. Li ser kaxezan fikr, dûmahikên fikran, destpêkên fikran hatibûn nivisîn.

Ket ket (yek bi yek) hemû ji mêjiyê Dr Reef paş ketibûn. Wî ji nav komeke wan fikran, di serê xwe de rastîyeke mezin pêk dianî. Wê rastîyê dinya tarî dikir. Dibû qebehet û diçilmisî, piştî fikrên bicûk dîsa dest pê dikirin.

Keça dirêj î reşeke hatibû kû Dr reef bibîne, ji ber kû li rêya zewacê de bû û tirsek ketibû nava dilê wê. Ji ber rêzeke sedemên ecêb, di wî halî de bû.

Mirina dayik û bav, û zewiyên bi qîmet kû bo wê mabûn, qiyametêk xwazginî li ber demanên wê ciwandibûn. Du salan, hema bêje her şev xwazginî diditin. Ji bilî duyan, hemû wekhev bûn. Qala viyanê jê re dikirin, û dema li wê dinihêrîn, nejdiliyek nav deng û çawên wan der diçû. Li navbeyna wan

her du yên (her dukên) awarte, gelek ferq hebûn. Yek ji wan, bi destên spî ve ciwanekî zirav, kurê zêringirekî li Winesburgê, her gav ji derhekê qizaniyê diaxivî. Dema bi wê re bû, tu car bê behs nedima. Yê dî, yekî guhbel û porreş, tu caran tiştê nedigot, lê dikarî wê bikêşe nav taritiyê û li wir wê maçî ke.

Keça dirêj î reşeke, qederekê digo ku wê bi kurê zeringir re bizewice. Saetan dirûnişt û guhdarî wî dikir, lê paşî tirsekê şax veda nav fikrên wê. Wer difikirî kû pişt gotinên wî yên li ser qizaniyê, şehweteke ji yên dî mezintir hebû. Digot qey dema ew diaxive, bedena wê jî nav lepên xwe de digire. Xeyal dikir kû bi destên xwe yên spî, hêdîka wê dizivirîne û wê dimeyzîne. Şewê dî xewnên xwe de didit kû bedenê wê leq daye û erzinka wî diniquete. Sê caran ew xewn dît (hatê). Dû re niyeta xwe vegerande ser yê kû tu tişt nedigot, lê carina bi rastî milê wê gez dikir kû şûna diranên wî sê rojan jê nedîçû.

Heynê keça dirêj î reşeke Dr. Reef nasî, hez nekir tu caran wî berde (ji wî dîr keve). Sibêdeyekê çû ofisa wî û, bêtî kû tiştêkî bêje, Doktorî fam kir kû çî lê qewimibû

Li ofisa Dr. de jinek hebû, jina pirtûkfiroşê Winesburgê. Wek hemû pratîsyenên gundan, Dr Reef diran lê kêşa û jinikê pinîyek li ber diranên xwe girt û nalî. Mêrê wê li gel wê bû û heynê diran hat kêşan, her du bi hev re (pêkre) qêriyan û xwîn li ser cilên jinê yên spî de herikî. Keça dirêj î reş, qet bala xwe nedayê. Heynê jin û mêr derketin, Doktor bişirî. "Ez dê te bibim gerîyanê li gund û gundewaran." got.

Sê hefteyan, hema her roj Dr. û keça dirêj î reşeke bi hev re bûn. Keç li rewşeke nexweşiyê de hatibû nik Dr., lê wek kû şirîniya sêvên kurmî kifş kiribe, nedikarî hişên xwe vegerîne ser mêwiyên normal kû di apartmanên bajaran de tên xwarin.

Payîze, piştî hevnasîna dixtor, bi wî re zewicî û di bihara dihat de jî mir. Li wê zivistanê, doktorî hemî ecêbî û dawiyên fikrên kû li ser kerên kaxeza nivisibûn, jê re xwendibûn. Piştî kû tevahiya wan xwend, kenîya û pestîne (dewisandin) nav berikên xwe, da kû bibin topikên req û girovir.

## Gula Rojhilatim

Gula baxê bihišta rojhilatim.  
 Di tariya şevê rojim hilatim.  
 Ji nav singa demê pişkîme îro,  
 Di tarîxê fireh hatim, Feratim.  
 Hemî jîn im, dixwazim xweş vejînim,  
 Hezar û nehse di şîn bûme katim.  
 Birûsk im, pir çirûsk û hewr û tavan  
 Bi himhim têm, ji ezmanê welatim,  
 Lehî me ez di ser hev re diborim.  
 Dixwazim nû bikim rêz û civatim.  
 Birûsk û pêt û ar kevne sojim,  
 Ji pût û lat û lahût re şewatim.  
 Disojim lê dikim ronî şeva reş  
 Çira kora ye ev kar û xebatin,  
 Di vê rê de ez dicim lê seg diqorin.  
 Fidakar im li ser rêça felatim.  
 Dixwazim ez di ser hev re bifûrim,  
 Xebatim, şorişim, xweş kêferatim.  
 Cihan tev de wekî pingav û derya  
 Tenê jê re wekî cok û qenatim.  
 Bi daxwazim ko serbestî dixwazim serbilindî.  
 Ji millet re di vê şabatê hatim.

**Cigerxwîn** (1903-1984)

## Mezar Taşı

**Sîdar Jîr**

*Kürtçe'den çeviri: Ergin Öpengin*

O boğuk ikindi vaktinde, güneş ışınları bir aydır yerde duran karın üzerine sarı bir perde çekmişti. Buza dönmüş karlar koyun toynaklarının altında kart kurt ediyordu. Rüzgar köylülerin suratlarını ustura gibi keserken, bıyıkları ağızlarına giren başları önlerine eğilmiş delikanlılar cami önünde toplanmış bekliyorlardı. Kimseden çıkmıyordu. Kar birikintileri altından görünen taşlara benzeyen gözleriyle etrafı seyrediyorlardı.

Yine yas mevsimiydi. Artık köylülere kış yoktu; onlar için ilkbahar, yaz, sonbahar ve mezarlık vardı. Kış mevsiminin yerini mezarlık almıştı. *Ben mezarlık mevsiminde başka bir yere gideceğim, mezarlık bu yıl çok şiddetli gözüküyor, yazı iyi geçti de acaba mezarlık nasıl olacak...* Kısacası kışın adı değişmişti bu köyde. Her hafta olmasa da ayda iki üç defa mezarlıkta olurlardı. Kış geldi mi her seferinde başka bir evin feryadları çınlatırdı ortalığı. Sanırdınız ki Azrail kışın bu köye çadır kurar, ne zaman ki canı sıkılır birinin canına kast eder, sorgusuz sualsiz bir çok evin direğini yıkardı.

Karın göz çukurlarına saldırdığı bir günde, Azrail yine bir evin kapısını mühürlemişti. Köylüler sinirli; intikam kammının kokusu beyinlerinden burun deliklerine akıyordu. Kapıyı çalmadan cesurca içeriye dalan ve 'Emir aldım, seni kendimle götüreceğim. Bu dünya üzerinde yeteri kadar mücadele ettin; biraz da diğer tarafta mücadele et.' diyecek Azraili yakalamak için herkes fişek ve tüfeklerini bellerine çapraz gelecek bir şekilde sarmıştı. Bir Allah biliyordu ne yapacaklarını. Ağzından o söz çıktı mı bir kere, kimin ne haddineydi ona "Hayır, daha erken" demek. Uğraştıkları iş ne olursa olsun, bırakıp kuzular gibi



onun peşinden giderlerdi. Kaçıp kurtulanlar, daha o konuşmadan tüfeği göğsüne dayayacaktı. Bu da çok zayıf bir ihtimaldi. Çok zordu işleri. Yanıbaşlarında bitmeyene kadar kimse sezemiyordu onun varlığını; ancak daha sonradan farkedebiliyorlardı. Kimseye gözükmüyordu. Daha doğrusu kendisini gizlememesine rağmen kimse göremiyordu onu. Sadece, bir seferinde köyün ağası Xêro Ağa'nın babasının onu gördüğü söyleniyordu. Azrail, yirmi dokuz yıl önce onun da ruhunu almıştı.

Köylüler kendi kendilerine şaşıyorlardı. Pusu kuruyorlardı olmuyordu, tuzak kuruyorlardı olmuyordu. Ağanın isteği üzerine köyde bulunan şeyh dua etti, o da sonuç vermedi.

Ayakları altındaki kardan çıkan kart kurt sesleri üzerlerindeki sessizliği biraz dağıtıyordu. Oysa köylüler bu sestten bile korkar olmuşlardı. Bir sonraki gelişinde acaba sıra kimdeydi? Bu soru, o soğuğa rağmen ecel terlerini kollarından bacaklarına doğru akıtıyordu. Ayakları altından yükselen her bir sesle Azrail'e bir adım daha yaklaşıyorlardı. Korkudan titreyen kalplerle birlikte kollarının üzerinde tabutla, canlarını isteyen Azrail'e doğru yavaş yavaş sürükleniyorlardı. Mezarlığa doğru yol alan cenaze alayındakiler bir yandan da birbirilerinden ayrılmaya korkuyorlardı. Hepsi tabutun etrafında toplanmış, Azrail'in kendilerini tanımaması için birer kaçakçı poşusu (kefiye) ile yüzlerini sarmışlardı. Sadece göz çukurları görünüyordu. Herkes gözlerini açmış Azraili arıyordu fakat henüz ortalıkta buna dair hiç bir iz görünmüyordu. Tabutun altındakiler hariç tüm parmaklar tetiklere sabitlenmişti. Kim sezerse sezsin kurşunlarını Azrailin göğsüne yağdırmaya hazırdı.

Köy her ne kadar müslüman köyü olsa de, köylüler Allah'ın bu meleğinden hiç mi hiç hoşlanmıyorlardı. Belki üç ay ara verip sonra köylere gelse kimse bu kadar incinmezdi. Oysa işin tadı kaçmıştı. İki üç ayda herkesi perişan ediyordu. Tek bir aksakallı kalmamıştı köyde. En yaşlılar ağızlarını danalara kurban ediliyordu (-köylüler böyle diyordu-). Ağızlarından çıkan buhar, henüz bir sonraki sefere yerini bırakmadan, Azrail ağızlarının önündeki poşuları kurumuş hayvan derisine çevirmeye yetişiyordu. Köylüler bu korku yüzünden soğuktan bahsedemiyorlardı bile. Bir an önce kurbanı gömmek, evlerine dönüp yorganlarının altına, eşlerinin eteklerinin altına, Azra-

il'in ulaşamayacağı tek yere, saklanabilme telaşındaydılar. Allah buna izin vermiyordu, bu kadarına da razı olamazdı. Tüm köylüler, ecel terleriyle donuyorlardı o soğukta. Bir delikanlı gibi çıkıp "benim, buradayım" dese, kendini onlara gösterse belki o zaman bir yolunu bulup anlaşabilirlerdi. Fakat nafi! Gizlice, kimse farketmeden gelip sadece bir kişinin başına musallat olur, köylüler de elleri göbüklerinde, zavallı durumlarını seyrediyorlardı. Köyün ağası Xêro Ağa her şeyi çözebilirdi, ama bu acı durum onun da elini ayağını bağlamış, iki ayağını dar bir pabuca sokmuştu. Derdiniz ki yedi ipe bağlanmışlar, her ipe yedi düğüm vurmuşlar ve ardından da ağız bağlanmış bir torbaya koymuşlar. Xêro Ağa yerinden kımıldayamıyor köylülerin de artık ondan hiçbir şey bekleme-melerine üzülüyordu içten içe.

Köyün bir kaç delikanlısı boş bir mezara girmiş, zemini düzeltiyor, mezarın içindeki duvarı örüyorlardı sırayla. Derman kalmamıştı dizlerde. En sonunda mezar bin bir zorlukla hazır hale getirilebilmişti. Rahmetliyi dikkatli bir şekilde tabuttan alıp, mezara doğru indirdiler. Mezarın baş tarafına konulmak üzere getirilen siyah, geniş taş mezarın üstüne konulduktan sonra, köylüler duvardaki boşlukları ufak taşlarla kapatıp mezarı toprakla örtmeye başladılar. Bir yandan da dualar okunmaya başlamıştı. Köylülere göre Azrail de bir casus gibi tabutla birlikte mezarbaşına geliyordu ve bu yüzden de gereken önlemleri elden bırakmıyordu köylüler. Parmaklar sürekli tetikte hazır tutuluyordu. O an yabancı biri kazara oradan geçecek olsa, ya da ölüye dua okumak için mezarbaşına gelecek olsa, köylüler tarafından taranır, karnı delik deşik edilirdi.

Mezara toprak atma eylemi bittikten sonra, okunan dualar da son buldu ve köylüler birbirlerini kollaya kollaya köye doğru gitmek için bir sürü gibi dizildiler sıraya. Eller sürekli olarak göğüslerinin üzerinde duruyordu. Karanlık, sarıya çalan karı yavaş yavaş mavi bir renge çevirirken Xêro Ağa, hala yerinde bedeni donmuş bir şekilde oturuyordu. Yerinde uyuşmuş kalmışken birden bire gözleri yabancı ve korku dolu bakışları birine takıldı. O, yani Azrail, olduğunu anlamıştı. Ne yaparsa yapsın bir türlü bağırıyor, sadece kendisinin duyabildiği sesi, yine kendi içinde yankılanıyordu ancak. Tüfeğini aradı eli

bir an; o da yoktu. Etrafını yokladı şöyle, bir taşa uzandı eli, oysa eline gelen beyaz bir bezdi. Yerinden kalkıp kaçmak için çabaladı önce, sonra kafası siyah ve geniş bir taşa denk geldi. İşte ancak o an sesi dışarıya çıkabildi. Bağırıldı... Azrail!

## Tewekkula Bo Xwedê

**William Saroyan**

*Wergêr ji Farisî: Ergîn Öpengîn*

Ji bo ku bidete zanîn ka tewekkula bo Xwedê çend tiştê baş e, dapîra min çirokekê neql dike ku çend sed salên pêş qewimiye. Çirok wiha dest pê dike:

Rojek ji rojan, berêvariyeke, xeratek vedigerî mala xwe ku dostekê xwe li ser cadeyê (şeqam) dît. Dostê wî pirsî: `Dostê ezîz çima ewqas xemgîn û perîşan î?` Xeratî cevab dayê: `Heke tu li ciyê min bayî, hal û rewşa te ji baştir nedibû.`

Dostî, ji xerat xwast ku maceraya perîşanhaliya xwe ji bo wî vebêje. Xeratî, bi xem û azareke mezin got: `Divêt heta sibe sibê, pênc hezar û pênc sed û pence û pênc darbestên çûbi (darî) ji hakim re hazir bikim; Heke min nekarî, cellad dê stüyê (garden) min jê ket.`

Dostî, destê xwe danî ser şaneyê xerat û dildariya xwe nişan da: `Bo Xwedê tewekkulê bike û yeqîn be ku Xweda dê harîkariya te bike.`

Xeratî xatir ji dostê xwe xwast û çû xaniyê xwe. Hemser û zarokên xerê ku xeber bi meseleyê hebûn, pir xemgîn bûn û digiriyan. Girî û zariyên wan bi duayan digihîştine dergehên Xweda. Piştî duayan, dil li wan şad bûn û îştah li wan vegehiya û şiyar xwarinê bixwin. Paşî, çirokên xweş ji yek û dû re gotin û dengê qehqehyên wan gihiştine heft xaniyên li wî rexî. Careke di `sibe` ket bîra hemsera xerat, û bi helkê helk ji mêrê xwe re got: `Sibe sibê dê stüyê te jê kin, lê em şad in û sibe di fikra me de nîn e.`

Xeratî ew tesellî kir û got: `Înşallah her tişt dê durust be.`

Ew şev heta sibê, xerat û malbata wî dua li Xweda kirin û harîkarî ji wî xwastin. Dema ku sibê hat, bédengîyeke mirinbar kevtibû nav mala xerat. Nişki ve, zerba li derê xanî, Xerat lerizand. Wî bi xwe bi xwe got: `Be bi Xweda êdî wextê min tevaw bû.` û derî vekir. Memûrên hakimî bûn; yekî ji wan got: `Xerat, hakim mir, ji bo wî darbestekê (sindirûk) çêke.`

**Ruh Portresi**

saatler saydıkça geçiyor  
 ve şimşekler çakıyor uzaktan uzağa  
 usul usul hareketleniyordu hava  
 ben sanki fare kapanında  
 çıplak kalmış bu akşam  
 köşeye sinen hoyrat ağaçlar  
 kulağında nağmeleri antika bir türkünün  
 yüreğinde bir tablo yankılanıyor  
 diri bir insan mezarlığında  
 rüzgar önünde sürüklenen bir yaprak gibiyim  
 önümde sonsuz ecel ayazı  
 gökyüzünde yıldız derlemeleri  
 ve denizde yakamoz...

sanki yolunu kaybetmiş bu sokaklarda  
 amerikan markalı ayakkabı izleri  
 bütün bilinen isimler  
 yabancı gelmeye başlıyor  
 kafam arı kovana gibi  
 düşünemiyorum hiçbir şey  
 bir yandan vakit ilerliyor  
 bir yandan ben  
 yılların alışkanlığı  
 aynı taş kaldırım sokaklardan süzülüyorum  
 ağlamaktan kurumuş gözlerim  
 hafif serin bir rüzgar  
 okşuyor büzüşmüş suratımı  
 daha da kararırken hava  
 feryad ediyorum  
 hapsederek içime tüm çığlıklarımı  
 sonra kayboluyorum  
 kılık değiştirmiş kadim yalnız sokaklarda

**mihemed şerif derince**

**Hin Peyv Li Ser Dilê Min**

Dilê min weke vagoneke trêne ye  
 Hezar û yek stasyonên wê hene  
 Her cara li stasyonek ji wan disekine  
 Rêwiyek wê dihêle  
 Rêwiyek xwe davî nav  
 Lê ji gava dilê min bûye vagon  
 Rêwiyekî xembar tim lê siware  
 Peya nabe  
 Peya nabe  
 Li tu kuncê vê dinyayê

Ev rêwî li rêça nave xwe digere  
 Ev rêwî li rêça çavê xwe digere  
 Ev rêwî birîna min e  
 Ev rêwî ken û girîna min e  
 Ev rêwî *Gulistan* e  
 Hêlîna yêkemin evîna min e.

**Ewdila Pêşew**

**Berf**

Wek `Xweşika Bênav` a Goran  
 Wek rojên salên bi ber  
 Wek salên temenê terr  
 Wek pûrta teyr  
 Wek rondikên zarokê sêlek  
 Wek gavên rêwiyekê berbangê  
 Kulî kulî hêdî hêdî  
 Berfên zîvîn tene xwarê

**Ewdila Pêşew**

Veger, Weşanên Avesta, 1996, Werger: Rûken Bagdu Keskin, Bedran  
 Hebib

## Şoreşger

**Ernest Hemingway**

Wergêr Ji Îngilîzî: Ergin Öpengin

Di sala 1919 an de, di dest de kaxezek ku ji aliyê biryargeha partiye bi pênuseke kopiyê `vi hevalê tê ba we ji destê zor û zextên spiyên li bajarê Budapeşteyê gelek eziyet ditiye, divê hûn bi her awayî alikariyê lê bikin` hatibû nivîsandin, bi rêya rêhesinan li Îtalyayê digeriya. Wî ew di dewsa pisoleyekê de bi kar dianî. Şermok û xortekî nûgihîştî bû; xebatkarên trêne ew ji yek muretebatekê dişande yêke dîtir. Perê wî tune bû, zikê xwe li pişt dezgehên di xwaringehên rêhesinan de têr dikir.

Keyfa wî gelek bi Îtalyayê dihat. Digot ku welatekî gelek xweş e. Mirov hemî dilpak û dilnazik in. Li gelek bajarokan mabû, gelek geriyabû û gelek keval ditibûn. Bo xwe reproduksiyonên Giotto, Massaccio û Pierro della Francescayî kiribûn, bi kopiyêke *Avantîyê* pêçabûn û ligel xwe digerandin. Hez ji Mantegnê nedikir.

Ji Bolognayê peyam hinart, min ew bi xwe re bire Romagnayê ku diviyabû ji bo ditina yekî biçûma wê derê. Me bi hev re gereke xweş derbas kir. Serê meha Rezberê bû û gundewar pir xweş bû. Macarek bû ew, zilamekî pir ciwan û pir şermok. Xelkê Horthyê tiştên xerab lê kiribûn. Kêm caran behsa wan dikir. Tevî Macarîstanê, baweriya wî bi şoreşa tevahî ya cihanê hebû.

‘Lê tevger li Îtalyayê çawa ye?’ wî pirsî.

‘Zor xerab` min got.

‘Lê dê baştir bibe` got, ‘li vira hûn xwedanê her tiştî ne. Tenê ev welat e ku herkes lê kanih e. Ewê bibe ciyê destpêka her tiştî.’

Min tişteke negot.

Li Bolognayê, berî ku siwarî trêna Milanoyê û paşî jî ya Aostayê bibe da ku ji wir jî bi peyatî derbasî Swîsreyê bibe, xatirê xwe ji me xwast. Min qala Mantegnayên li bajarê Milaonêyê bo wî kir. ‘Na` got bi awayeke şermînî, hez ji Mantegnayê nedikir. Min navên ciyên ku ew li Milanoyê xwarinê lê bixwe û navnişanên hogiran bo wî nivîsandin. Gelek spas kir, lê mêjiyê wî hêj ji wê demê de li ser derbasbûna Swîsreyê bû. Gelekî dilgerm bû ku di hewayeke xweş de ji tixûb derbas dibû. Payîzê, gelek hez ji çiyayan dikir. Tiştê dawîn ku min derheqê wî de bihist, nêzikî Sionê, Swîsreyê ew girtibû û heps kiribû.

## Şefeq

Husên Arîf

Hêştâ şefeq î nedabû. Tarîkî û xamoşiyekî êkcar kip, şepolî kizabayekî sard, bê şînê, deyda be rûxsarîda û têdeperî. Em ewsate taze xebery bibûewe û çawî kirdibowe. Hestî be serma dekird. Betaniyekey be ser xoy da rakêşa û emla û ewlay xoy axîni. Teqelay da binwêtewe, bêşûd bû. Betaniyekey le ser xoy ladayewe. Rûy be lay rast da wergêra. Tase bû be arezû.

(Çiwar şewe le yektir dabirawin. Emeş serbarî mandûbûnî çîwar roj rêgabirîn be naw şax û kêw û dol û deşt da, Eweyan wa...ey emeyan le pay çi?!...Dinya hêştâ tarîk a. Kes îş bexeber niye. Heste biço xot biaxina jêr lêfekey...)

Helsa û anîşkî dadaye ser serînekey. Kemek bemla û bewleda helirwanî. Bo mawey çend satêk gwêy habdst. Ewsa serinci daye şîwên cêgey jineke. Le cem her du mindalekey le ser tenîşt xewtibû. Lê xoy dûdil bû. Çend sateke lê birî kirdewe. Dawîn cartîni daye ber xoy û kişa. Be tenîştewewe şanî dada. Demî xiste bingawêy û be çirpe witi:

-Xawer!...

Ewla serî berz kirdewe bikşêtewe ser cêgakey xoy, balam her xêra xoy axîneyewe pal Xawer. Gulçîn î dît daniştibû, korpekey nabûwe ko şiyewe leweda bû memkî bidatê. Be çirpe be Xawer witi:

-Ewe çi ye? Xo şefeqî dawel! Wa diyar exewman lê kewtî bûewe.

Xawer witi:

-Xetay to bû. Ewsa pêw wêti `Helse biçorewe ser cêgakey xot` neçuyt.

-Êsta çi bikeyn?

-Xot mat ke! Çawî le man niye. Çawa rê bike ta denwêtewe!

Gulçîn korpekey jir kirdewe palketewe binwêt. Xawer serekî berz kirdewe û helirwanî witi:

-Nustewe...Helse dey...!

Ewla nebizwa. Baweşî pê da kird û nûsandî be xoyewe.

Xawer dubare witi:

-De helse... Wa xerîke dinya rûnak debêtewe.

Ewla maçî kird, witi.

-Hezim lê te!

Roj le kêwekey bermaberianewe wederkewt. Rûnakiyekî geşî da be naw doleke. Ewsa teniya korpe û sawakan nebin, sercem koçerekanî din le xew helsabûn. Wekû saremêrûle be yek da dehatin. Serleifwê kol û bariyan de pêçayewe û le wilaxe kaniyan bazdekirdin.

Hacî Mehmûdî Mamî Ewla, be ser û rişe sêpyekeyewe, be seryanewe desûrayewe û`deywit:

-Dey qurbantan bim... Dey aza ken! Her emroman mawe.

Êvare legel bangî şewan da degeyne cê û rizgar man dibêt.

Ewla le zûwele legel Xawer kol û barî xoyan pêçabowe û le ker û bargîrekey xoyan bar kirdibûn. Bigre yarîdey malî xezûrî xoy şî dabû. Em bû ke çû Qale jinbray xeberkirdewe. Pêkewe kel û pelakanî ewanîşîyan pêçayewe baryan kirdin.

Roj hêştâ rimêk serûy demkêw nekewtibû, ke Hacî Mehmûd fermanî da:

-Dey bikewne rê!

Karwanî koçerekan kewte rê. Zor dûr kewtinewe. Gulçîn xoy geyande Xawer, çirpandibe gurêyda û witi:

-Be xîlît pê debem!

Xawer wîstî xoy lê gêl bika, lêy pirsî:

-Bo çi?

Gulçîn witi:

-Xotim lê gêl meke...Dîmin...Kak Ewla le Tale azatire...

Xawer pêken. Lay kkdewe be lay çepî da. Ewlay dît. Ew îş pê dekenî.

**Şoreş**

Ez li kurdekî rast hatim  
 Got: Ji nav dicle û ferat im  
 Şoreşgerê jêhat im  
 Rewşenbîrê welat im

Şev û rojan ranazim  
 Heqê gelan dixwazim

Şervanekî bilez im  
 Li nav welêt dibezim

Min gotê:  
 Ew ên wekî te westiyane  
 Şoreşgerî ne hêsan e  
 Bicîanîn û rastiyan e  
 Ne bi gotin û hestan e

Bingeha xwe ava ke  
 Xwe ji kevnîya vala ke

Dîroka xwe bizane  
 Wêjeya xwe binase

Bingeha te ji kû ye?  
 Feqiyê Teyran kî ye?  
 Armanca Xanî çi ye?  
 Cîgerxwîn çi xwestiye?

Piştî famkirina vana  
 Tu qet nemîne vala

Her bixwîne û bixwîne  
 Zanînên xwe bi cî bîne

Min xwe ji rastî neşeart  
 Armançekî baş bijart  
 Bi hêvî û hem bê şert  
 Jiyana xwe min guhert

**Bedel STENBOLÎ**

**Cihêreng**

Tiştêkî cihê ye ê ku ez dixwazim  
 Ne dişihîbi dara û ne jî ewra  
 Welatê ku ez ê herim ne weke vir e  
 Behra wê behra cûda, hewa wê hewa cûda  
 Li ku ne ên min dîtîn, li ku ne ew keçîka ez li bendê  
 Rengê wê cihê, tama wê cihê

**Can YÜCEL**

*Werger Ji Tirkî: Hekim Kılıç*

**Carna**

Tu stêrka dimali, bêhemdî xwe,  
 Roj di himêza te de yî, tu nizani.  
 Zarokê li çavên te dînerî, dawîya te pêveyî,  
 Damezirandiyî di cîgerê te de orkestra, deng nayê te.  
 Evînek mezin e ya ku tu dijê, tu fam naki.  
 Difire derî, ger tu birevî jî tu nikarî bigirî...

**William SHAKESPEARE**


*Werger Ji Tirkî: Hekim Kılıç*

**Ditirsim**

Tu dibêji ez ji baranê hez dikim,  
 Wextê baran dibare tu şemsiya xwe vediki...  
 Tu dibêji ez ji rojê hez dikim,  
 Wextê roj derdikeve tu direvî ber siyê...  
 Tu dibêji ez ji ba hez dikim,  
 Wextê ba tê tu taqa xwe digri...  
 Ha, ji ber vî hawî ditirsim;  
 Tu dibêji ez ji te jî hez dikim!

**William SHAKESPEARE**

*Werger Ji Tirkî: Hekim Kılıç*



### ÇÎROKÊN GEL

Di nav civaka kurd de, vegotina çîrokên gel ên bêjeyî kevneşopiyek e. Ev çîrok ji nîfşekê derbasî nîfşek din dibin. Lê di serdema me de roj bi roje yek bi yek wînda dibin. Ev derheneriya ji hêla Mele Beşîr ve hatiye kirin, qedek nivîsandina ve pêvajoyekê pêk tîne. Bi rastî jî zêde ji me ne dûr in, ew çîrokên me di zarokatiya xwe de ji mezinên xwe bihistine.




HAKİKAT VE UZLAŞMA  
KOMİSYONU  
GÜNEY AFRIKA  
DENEYİMİ  
ALEX BORAINÉ

TOPLUM

### HAKİKAT VE UZLAŞMA KOMİSYONU

Hakikat ve Uzlaşma Komisyonu, Güney Afrika'da ırkçı rejimden demokrasiye geçişi kolaylaştırmak için kuruldu. Amacı hem Beyaz yönetimin hem de ona karşı savaşan muhalefet güçlerinin insan hakları ihlallerini araştırmaktı.



### SAVAŞ GANİMETLERİ

AMERİKAN  
SILAH TİCARETİNİN  
İNSANİ BEDELİ  
JOHN TIRMAN



TOPLUM

### SAVAŞ GANİMETLERİ:

90'lı yıllarda Türkiye'de yaşayan Kürtlerin pek çoğu İngilizce'de ilk önce iki kelime öğrendi: Sikorsky ve Cobra. Bu gelişmiş helikopterler köylerinin boşaltılmasında, insanların kaçırılmasında ve hayvanlarının öldürülmesinde kullanılıyordu.





### Welatê Bejî û Deh Koroyên "The Rock"ê T. S. Eliot- Weşanxaneya Bajar

Di pêşgotina ev guldesteya helbestan a T. S. Eliot ê helbestkarê îmajîst ê inglîs-amerîkî de, wergêr Kawa Nemir, pêwistiya wergerê wiha derdibire: *Di vê rîya me ya dirêj a durîstkirin û avakirina derbirrîneke balûpal û bêsînor de, pêdiviya me bi pencereyên gerdûnî heye. Pêwîst e ev pencere bi ser bax û gulistanên rabirduya me de vebin.* Wergêr û weşanxaneya ku bi van bir û baweriyên tevdigerin bi vê berhema malê cîhanê ve kurdiyê gavekê di ji bi pêş ve dibin. Û herwiha diçespînin ku zimanê kurdî çi carî ji çiyayên xwe dagêr nabe, wê tim û tim rabe ser zîn...

### Ji Çîn û Maçînê Ezra Pound- Weşanxaneya Bajar


*Ey stranên min,  
Hûn çima wisa bi dilovanî, wisa ecêb  
awîran dikutin rûyên mirovan,  
Qey hûn ê miriyê xwe yê wînda di nava  
wan de bibînin?*

Helbestkar, wergêr, rexnegir û zimanzanê Emerîkî bi boçûnên xwe yê derbarê gelek qadan de û bi bîrdoziya xwe ku kir piştevaniya faşîzma Mussolinî bike ve bûye yek ji balkêştirîn hunermendên sedsala 20an. Weşanxaneya Bajar, di sa bi wergera Kawa Nemir, dike ku xwendevanê kurd xwe bigihîne hunermendeke din ê cîhanî û herwiha berhemeke din a hêja li helbesta kurdî zêde dike. Di pirtûkê de, ji bilî 58 helbestên Pound, hemî helbestên T.E.Hulme jî ci digirin ku ew tenê bi çend helbestên xwe yê kurt tevî dîroka Helbesta cîhanê bûye.



### Walt Whitman

Bi vê hêjaxebara xwe, pêşengê wergera kurdî Kawa Nemir, bi gotina xwe *zimanê kurdî li zimanên cîhanê diceribîne*. Pêşengê helbesta Emerîkî Walt Whitman, ku teşe û naveroka helbesta emerîkan de qalib û klîşeyên heyna xwe şikandin, bi vê xebatê ve li ber e ku heman pêvajoya guherînê bi helbesta kurdî jî bide jiyandin. Herwiha, wergêr, bi pêşgotina dirêj a pirtûkê ve jî, mimkîn dike ku xwendevanê kurd hin agahiyên derbarê qonaxên helbestkariya cîhanê de bi destbixe, û bikare ji xwendinê zêdetir sûtê wergire. Pirtûk jî 101 helbestan pêktê, û em dikarin ew l'a li ser 100 jî wek çilçaviya wergêr a di warê wêjeyê de bibînin.



### Edgar Allan Poe

Bi vê pirtûka bijarteyek ji helbestên çiroknivîs û helbestvanê gewre yê Emerîkî, Edgar Allan Poe, weşanxaneya Bajar mîcîdîtiya xwe ya qada wergerê de îspat dike û me têxe nav gereka *bedewiyê*. Perspektîfa Poe ya *helbestkarî bo helbestkariyê* bi vê wergera rewan a Samî Hêzil ve di zimanê kurdî de jî qadekê ji xwe re peyda dike ku bêşik dê tesîreke xurt li ser helbesta nûjen a kurdî bike. Poe, ku di helbestên xwe de tenê bi *bedewiya diyar* re namîne lê bi hewleke hovane dikeve dû *bedewiya bilind/jorîn* êdî bo we jî bi zimanê we berdest e. Xwe bêpişk nehêlin...



Kovara Wêjeyê Cendîl Hûnêrê

Saf. 2, Çarmar. 4  
Jinanîyeyê Bêrhanîyê  
Şif. 3, XED.000, T. 311 5 (TL)

**W.**

M. Kerem Soylu  
Zeynelabidin Zinar  
M. Celaleddin Yöyler  
Ayhan Meretowar


Şano Jiyan e  
Hevpeyvîn bi Şanoger Selama re

DOSYE:  
Di Şîra Kurdî  
Ya Klasîk de  
Eşq û Evin



# Ji Weşanên belkî


(Qerf)



SEVA DELALÎ  
Cendîl Denîl

belkî

(Çirok)



HEZKIRIYA XWEDÊ

Ibrahim Seydo Aydoğan

belkî

Weşanên Belkî

Belkî Basın Yayın Dağıtım  
Kooperatîfler mah. Tren Yolu sk. Bağran Apt.  
No: 1 Yenîşehir/ Diyarbakır  
e-mail: weshanenbelkiye@mynet.com